# پێشەنگ

گۆڤارێکی ڕامیاری وڕۆشنبیریە ڕاگەیاندنی ناوەندی پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان دەری دەکات

زمـــارە (١٠)　　سـنـــاڵی: ٤　　تشرینی دووەم/١٩٨٥










خستنە سەر نێت:- چالاک
chalakmuhamad@gmail.com

# بەیادی کۆچی دوایی هەڤاڵی نەمر
# نوری شاوەیس



قەبری هەڤاڵ نوری شاویس لە گردی سەیوان لە سولەیمانی

لە ١٥ی تشرینی دووهەمی رابردوو ،دوو ساڵ تێپەربوو بەسەر کۆچیدوایی هەڤاڵی نەمرمان نوری شاوەیس .

لەو رۆژەدا هەڤاڵ نوری بەجێی هێشتین و گەشتەکەی دەستپێکرد بەرەو نێو چرو وئەرخەوانەکانی گردی سەیوان ٠٠ گردی شەهیدان٠٠٠

ئێستا گیانە پیرۆزەکەی هەڤاڵ نوری بەسەر شاری سولەیمانی ٠٠ شاری هەڵمەت وقوربانی دەڕوانێت ،هەروەک چون دڵە گەورەی بەسەر خەباتی پیرۆزی گەلەکەمان دەیڕوانی ٠٠٠

هەڤاڵ نوری ئێستا لە سەیوانە٠٠ بەڵام بیری لە دڵمانە ٠٠ لە خوێنمانە ٠٠ خەوەکانی مەبەست وئامانجمانە ٠٠٠

خەوەکانی یەکگرتنی هێزەکانی شۆرشمان بوو ٠٠ یەکگرتنی پارچەکانی وولاتمان بوو ٠٠ سەربەخۆیی وسۆشیالیستی کوردستان بوو

لەیادی دووهەمینی کۆچی دواییت ٠٠ ئەی هەڤاڵی خۆشەویستمان ٠٠ بەڵێنی وەفا ودڵسۆزیت بو نوێ دەکەینەوە هەرگیز لە رێگا وبیرت لا نەدەین ٠٠ گشت خەوەکانت بێنینە دی ٠٠ژیانمان تەرخان بکەین هەروەک چون ژیانت تەرخان کرد بۆ پاراستنی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد ٠٠ بۆ نیشتمان ٠٠٠

بەڵێن بێت وهەزار بەڵێن کە ژوانمان لە بن ئاڵای شەکاوەی کوردستان بێت ٠٠ لە خزمەتتا لە سەیوان بێت ٠٠٠


پێشەنگ

# پێشـەنگ

گۆڤا رێکی ڕا میا ری و ڕۆشنبیرییە ڕا گەیا ندنی نا وەندی پا رتی دێموکرا تی گەلی کوردستا ن دەری دەکا ت .




دەستکەوتەکانی شەری ئێران وعیراق .




SERHİLDANA GEL Lİ BAJÊRÊN KURDİSTANÊ .

نرخی (٥٠٠) فلسە

## لەم ژمارەیەدا


٤- شەری ئێران وعێراق پێ دەنێتە سالی شەشەمی .

٨- قۆناخمان هەرچوار پارچەی کوردستان بوو .

١٢- کوردەکانی پاکستان .

١٧- نەتەوەی کورد ومافی چارەنووس .

١٨- شۆرشی نیکاراگوا ٥٥باشترین بەلگەیە بۆ سەرکەوتنی هیزی گەل .

٢٤- سەرچاوەی هونەری میللی کوردی .

٢٧- بەبۆنەی تێپەربوونی سالێک بەسەر کۆچی دوایی یەلماز گونای نەمر .

٢٩- بەبۆنەی یادی چل سالەی کۆماری دیموکراتی کوردستانەوە (مەهاباد).

٣٤- بەیادی کۆچی دوایی ماموستا علاءالدین سجادی یەوە .

٣٨- هۆنراوە .

HELBEST ............................(42)

NAMEK Jİ ŞİVAN PERWER BO ZAROYÊN ŞEHÎDÊN PARTÎYA ME...............(43)

MÊRÊ QENC,ZANYARÊ HÊJA Û NİŞTÎMAN PERWERÊ DİLSOZ......................(45)

JİN Û ZİMANÊ MAKÎ........................(47)

ÇAVPÊKETİNEK Lİ GEL RÊVEBERÊ ŞANO YA KURDÎ Lİ BAJÊRÊ TİBLÎS........(49)

Jİ RAPORTA POLÊTİKÎ YA P.D.G.K...(50)

SİLAV Lİ GORÊ YULMAZ GUNAY.......(51)

DÎROKZAN Û FOLKLORÎSTÊ KURDÊ SOVÊTİSTANÊ Dr. CELÎLÊ CELÎL Jİ GOVARA PÊŞENG RA DİPEYİVE.....................(55)

ŞERÊ ÎRANÊ Û İRAQÊ KETE SALA XWE YA ŞEŞÊ...........................(58)

# شەڕی ئێران و عیراق پێ دەنێتە ساڵی شەشەمی

لە ٢٢ی ئەیلولی ڕابردوو، جەنگی دوژمنانە وشێتانەکەی سەدام پێ ی نایە ساڵی شەشەمینی. ئەو جەنگەی کە درێژەی زیاتر خایاند لەجەنگی جیهانی یەکەم ولەجەنگی نێوان ئەڵمانیای نازی ویەکێتی سۆڤیەت لەکاتی جەنگی جیهانی دووهەم هەموو بەڵگەکانیش ئەوە پیشان دەدەن کە لە جەنگی جیهانی دووهەم زیاتر درێژە دەخایەنێت

شتێکی ئاشکراشە کە ڕژێمی فاشی سەدام لە ناو کێشەیەکی قووڵدا دەژی لەسەر هەموو ئاستەکانی نیشتمانی وگەلی ونەتەوایەتی کە لەگەڵ بەرپابوونی جەنگ تەقیەوە، ئەوەش شان بەشانی ئەو مەینەتیەی کە گەلی عیراق بە کورد و عەرەب وکەمایەتیەکانی تیای دا دەژی.

ئەگەر خاکی عیراق بگرین دەبینین هیچ کاتێک وەکو ئیمڕو هەڕەشەی هێرش وبزربوونی لێ نەکراوە، بەدەستکاری کردنی سنوری عیراق ـ سعودیە، عیراق ـ ئەردەن بەو شێوەیەی کە پاشاکان ئارەزووی دەکەن. بەم دواییەش ملکەچ بوون بۆ ئارەزووی تورکیا بۆ دەستکاری سنور بەبیانووی ئەوەی بە ووردی دیاری نەکراوە. ئەوەش لەکاتێکدا کە زۆر بە ووردی دیاری کراوە، ئێمەش ئەم ڕاستیە چاک دەزانین، بەوەی بەپێ بۆچەند جارێک بەدرێژایی ئەم سنورە هاتۆچومان کردووە. هەروەها بەری عیراقی ئەم سنورانە بەدەستی هێزەکانی (جود) (کە بەشێوەیەکی عەمەلی پاسەوانی سنور دەکات)، و قووتدانی بەشێک لە خاکی عیراق وەک نرخێک بۆ ئەو هێرشە.

چەند جەنگیش بەردەوام بێت، ئەوا خاکی عیراق مەترسی هێرشی لەسەرە وجێگای هەڕەشە و تەماحەکانی تورکیایە.

لەڕووی زیانەکانی جەنگیشەوە ڕاپۆرتەکان دایدەنێن بە (٧٠٠) هەزار کوژراو لە هەردوو گەلی هاوسێ، واتە زیاتر لە کوژراوە بەریتانی وئەمریکیەکان بەدرێژایی جەنگی جیهانی دووهەم ئەوەش بەتەنها بەسە بۆ دەرخستنی ترسناکی و کارەساتی ئەم جەنگە، خۆ ئەگەر ژمارەی دیل و سەقەتەکان بخەینە سەر ئەو ژمارەیە ئەوا خۆی دەدات لە ملیۆنێک مرۆڤ. هەوروەها ملیۆنێک عیراقی تریش بە زۆرملێ خراونەتە ناو هێزە چەکدارەکان وسوپای ناملی (جەیشی ناشەعبی) و (فەوجە سوکەکان)، کەئەمەش ناوی نوێی جاشەکانە.

ژمارەی کارکەرە بیانیەکانیش لە عیراقدا لە ملیون ونیوێک زیاترە بەپێی ڕۆژنامەکانی ڕژێم خۆی. ئاشکراشە کە دۆخێکی وەها چپاڵەپەستۆیەکی کۆمەڵایەتی و ڕۆشنبیری وشارستانی لە دوای خۆی دا جێ دەهێڵێت. لە ئەنجامە کۆمەڵایەتیەکانی جەنگیش داچوونی نەریتە کۆمەڵایەتیەکان وکزبوونی پەیوەندی ناوخێزان و زۆربوونی ژمارەی بێوەژن وهەتیوەکان.

خۆ ئەگەر ڕژێمیش لەسەرەتای جەنگەوە هەوڵی دەدا ئەو جەنگە وەکو سەیران پیشان بدات لە ڕێگای پاڵەپەستۆ نەخستنە سەر خەڵکی لە ڕووی ئابوری و پڕکردنی بازاڕ بە شمەکی بیانی، بەڵام ئەو ڕۆژانە بەبای جەنگەبەردەوامەکە چوون وئێستا تەنگانەیەکی ئابوری ڕاستەقینە دەستی خستۆتە بینی جەماوەرانەوە و هەڵاوسان (التضخم) بەپێی ژمێرکاری یە ڕەسمیەکان پتر لە دووئەوەندەی جارانی لێ هاتووە لەم سێ ساڵەی دواییدا، بەبێ ئەوەی هیچزیادەیەک بخرێتەسەر کرێیەکان. ئەوەش لەکاتێکدا کەباجەکانی جەنگ وئابوونەوەی زۆرەملێی جۆراوجۆر ونەمانی شمەکی پێویست لەبازاڕەکان ودیاردەی بازاڕی ڕەش بوون بە دیاردەی ئاسایی.

لەبواری دۆخی ئابوریشەوە، جەنگ هەموو گەنجینەی دارایی عیراقی قووتداوە کە بەر لە دەست پێکردنی جەنگ گەیشتبووە (٣٥) ملیار دۆلار بێجگە لەو یەکتا دوو ملیار دۆلارەی کە نرخی ئەوشمەکانەیە کە ناگوێزرێنەوە.

قەرزە بیانیەکانیش گەیشتە (٥٥) ملیار دۆلار بەپێی ووردترین سەرچاوەکان کە هەندێکی تر بە (٨٠) ملیاری دادەنێت. چاوەڕێش دەکرێت کە

ئەو قەرزانە ساڵی (٥)ملیار دۆلار زیاد بکات بێجگە لە سوودی سەرقەرزە کۆنەکان. جا ئەگەر تیشک بخرێتە سەر ئەم ئەنجامانە وئەو وێرانیە گەورەیەی بەسەر دەزگا ئابوریەکاندا هاتووەو داواکاری تەعویزی جەنگ ، ئەوا بەڕوونی بۆمان دەردەکەوێت کە نەک هەر ئێستای عیراق لە مەترسی دایە ،بەڵکو دواڕۆژیشی ، ئەوەش بە هۆی قادسیە شوومەکەی سەدام .

ئەو پڕۆپاگەندەیەش کە ڕژێم ولایەنەکانی ڕاگەیاندنی ئیمپریالی وکۆنەپەرست دەیکەن بۆ ئەو بڕیە نەوتەی ڕادەکێشرێت بۆ سعودیە و توانای ئەو بڕیە بۆ چارەسەرکردنی گیروگرفتە ئابوریەکانی عیراق هەرای راگەیاندنیە زیاتر لەوەی چارەسەری واقیعی بێت ، چونکە سعودیە و کوێت ڕۆژی(٣٧٠ ) هەزار بەرمیل دەفرۆشن لە حیسابی بەشی عیراق کە لەلایەن ئۆپیک دیاری کراوە .بەدەست پێکردنی دەرچوونی نەوت لەوبوریانەوە دەبوایە ئەو دەوڵەتانە فرۆشتنی نەوت بەناوی عیراقەوە ڕابگرن .ئاشکراشە کە ئۆپیک لەدوایی کۆبونەوەیدا بڕیاری دا بەرهەمهێنانی نەوت بۆ هیچ دەوڵەتێک زیادنەکات لەلایەکی تریشەوە بازاڕی جیهانی لەنەوتدا نوقم بووە .لەڕاستیدا وا چاوەری دەکرێت کە بەرهەمهێنانی نەوت بۆ دەرەوەی عیراق تا ڕادەیەکی کەم زیاد بکات ، بەڵام چارەسەرکردنی گیروگرفتە دارایی وئابوریەکان لە پێش هەموو شتێکدا بەستراوە بە ڕاوەستانی جەنگ .لەگەڵ ئەوەشدا وا چاوەری دەکرێت کە جەنگ ڕاوەستان بەخۆیەوە نەبینێت هەتا دەست پێکردنی نەوەتەکان .

لەبواری نەتەوەی عەرەبیشەوە ڕژێم هەر تەنها بەوە ڕازی نەبوو کە عیراق بە توانا مەزنەکانیەوە دووربخاتەوە لە سەنگەرەی ڕووبەڕووبوونەوەی دوژمنی زایۆنی وپاڵپشتە ئیمپریالیستەکانی ، بەتایبەتی کە عیراق لەو وولاتانەیە کە تەرازووی هێزەکان دەگۆڕێت لە ناوچەکەدا ،بەڵکو تواناکانی ئێرانیش لە کار خست لەدوای شۆڕش کە ئامادەیی ودڵگەرمی خۆی ئاشکرا کرد بۆ ڕووبەڕووبوونەوەی زایۆنیزم و ئیمپڕیالیزمی ئەمریکا .

سەرکردەکانی ڕژێمیش کەوتنە مەرایی کردنی ئیسرائیل بە مەبەستی ڕازیکردنی ئەمریکا ،ئەوەبوو سەدام هەڵویستی خۆی پیشاندا دەربارەی پێویستی ئامادەکردنی ئاسایش بۆ ئیسرائیل ، یەکێکیشیان ئاشکرای کرد کە عیراق لەمەودوا دانانرێت بەدەوڵەتێکی ڕووبەڕووبوونەوە ،واتە عیراقی سەدام ڕووبەڕووبوونەوەی ئیسرائیل نابێتەوە .

هاریکاری ڕژێمیش لەگەڵ دەوڵەتە ئیمپریالیەکان ڕۆژ دوای روژ زیاد دەکات لە گەلێک بواردا وبە شێوەیەکی بەردەوام ،وەک هاریکاری دەزگای سیخوڕی ڕژێم لەگەڵ سیخوڕی ئیمپریالی وئەو دەورە گرنگەی کە ڕژێم دەبینێ لە دژایەتی کردنی ڕژێم وپارتەکانی ناو بزووتنەوەی ئازادیخوازی نیشتمانی عەرەبی وبزووتنەوەی ئازادیخوازی نیشتمانی جیهانی لە ڕێگای ڕاگەیاندن وپارە وچەک ودروست کردنی ڕێکخراوی کۆنەپەرست ودژ بە شۆڕش . بەڵام لە هەمان کاتدا بەشێوەیەکی بەردەوام هەوڵ دەدات ئەم کردارانەی بە پەردەیەکی ئەستوور لە پڕۆپاگەندە دیماگۆگی ومیکاڤیلیە داپۆشێت کە پێی ناسراوە . چەند جەنگیش بەردەوام بێت وپێویستیە جەنگیەکانی ڕژێم لە ئیمپریالیزم وکۆنەپەرستیەوە زیاد بکات ئەوا ئەوەندەی تر مل کەچ دەبێت بۆیان .

لەلایەکی تریشەوە ،ناتوانرێت ڕژێمی فاشی و پارتیە عەفلەقیەکەی لە هیچ کاتێکدا جیابکرێتەوە لەو زەبرۆزەنگە و کوشتن وبرینەی عیراق بەخۆیەوە بینی .. نازم گزار بە بەکر وسەدامی گوت لەدوای هەوڵی کودەتایەکەی(من ٢٠٠٦ نیشتمانپەروەرم کوشت بۆ ئەوەی ئێوە حوکم بکەن ) .

بەڵام لەگەڵ بەردەوام بوونی جەنگدا ونائومێدبوون لە سەرکەوتن ، کوشتن وبڕین پەرەی سەند ودووقات بوو ومەسەلەی گوللەباران لە گۆڕەپانەکانی جەنگ وناردنەوەی ئەو تەرمانەی کە لەسەریان نووسراوە"ترسنۆک" وبەکارهێنانی ژەهر لە دژی بەرهەڵستەکانی وتەنانەت لە دژی ئەندامە ناسراوەکانی ڕژێم خۆی وەکو غێدان و عەماش وکەمالی وگەلێکی تر ،بوون بە شتێکی

زۆر ئاسایی لە عیراق دا .هەروەها ئەو ئازاردانە ترسناکەی کە بەکاردەهێنرێ لە لای هەندێک لە سێدارەدان بە داخوازیەکی دیموکراسی دەزانێت لەچاویا .هەروەها دیاردە کۆن ونوێیەکەی گرتنی کەس وکاری خەباتگێڕان کە لەگەڵ هەر خەباتگێڕێک وهەر ڕاکردوویەک لە دۆزەخی قادسیە نوێ دەبێتەوە .ژمارەی کەس وکاریش دەشێ یەک بێت ودەشێ سەد ودەشێ هەزار بێت و هەموومان کارەساتەکەی مالی ئەلحەکیم دەزانین وهەروەها ئەو هەشت هەزار کوردەی پێش سی ساڵ گیران ، ئەوەی کە جێگای سەرسوڕهێنانە ئەوەیە کە کەس نەیتوانی وتەنانەت ئەو دەوڵەت وئەو دامودەزگا جیهانیانەی هەوڵ وکوششیان دا بە دوای ئەم مەسەلەیە نەیانتوانی شوێنەواریان بدۆزنەوە ..هەشت هەزار کەس دیارنەمینیت وکەس هیچ نەزانێت دەربارەی چارەنووسیان ئەوەش لە وڵاتێکی بچووکی وەکو عیراق.. ئایا ڕژێمی پینۆشێی فاشیست کۆمارێکی ئەفلاتونی نیە لە چاو ڕژێمی (سەدام)...؟.

بۆ چەند ساڵێک وا بیردەکرایەوە کە فاشیزم لە وڵاتە تازەپێگەیشتووەکان نیە ،بەوەی کە فاشیزم بریتیە لە دەسەڵاتداری ئۆلیگارکی دارایە لە هەندێک لە وڵاتە سەرمایەداریە پێشکەوتووەکان وەکو ڕژێمی هتلر ومۆسۆلینی و فرانکۆ، بەڵام زۆربوونی دیاردە فاشیەکان و شێوەکانی سەرکوت کردن لە ساڵەکانی دواییدا وپشتگیری کردنیان لەلایەن ئمپریالیزمەوە وەکو ڕژێمی سەدام وئەفرین وپینۆشێ ،بوو بە هۆی دەرکەوتنی فاشیزم لە وڵاتانی جیهانی سێهەم، هەرچەندە ئەم فاشیزمە رواڵەتی تایبەتی خۆی هەیە ولە هەمووی گرنگتر ئەوەیە کە فاشیزمێکی کلک ودواکەوتووە ..

دەتوانین بڵێین کە ڕژێمی سەدام کە لەناو فاشیزمدا نوقم بووە، هیچکاتێک هاوتای نەبووە لەعیراقدا بەوەی کورد بە ڕژێمێکی شۆفێنی کۆنەپەرستی دادەنێت وشیعە بە ڕژێمێکی تایفە پەرستی ڕاستەقینەی دەزانن وسننە بە ڕژێمێکی ئیقلیمی تکریتی ، وخوا لەپەنای کەمایەتیە نەتەوەیی .وئاینیەکاندا بێتە تەنانەت لە تکریتیش خێزانی ناسراو نەما لەدەست زەبروزەنگی ڕزگاری بێت . کوا حەردان وبەکر و کوڕەکەی وزاواکەی وگەلێکی تر .ئاشکراشە کە ژمارەی ئەو سەرکردانەی لەناو ئەم پارتیە عەفلەقیە لەناوبران لە هەموو ئەو ژمارانە زیاترە کە لەناو پارتی تردا لەناوبراون،هۆی ئەوەش ئەوەیە کە ئەو سەرکردانە متمانەی تەواویان پێکرد بەڵام خەڵکی تر متمانەیان پێ نەدەکرد .

لەبواری کوردستانیشەوە ،ئەو مەینەتیانەی تووشی دەبن هەموو کاتێک دوو ئەوەندەن،لەناو هەرسێ یان چوار کورد یەکێکیان لە شوێنی خۆی کۆچ پێکراوە ،لەناوچەکانی سنوور وناوچە نەوتیەکان ودەشتەکان لەگەڵ کۆچ پیکردنی چارەکە ملیۆنێک کەس بو دەرەوەی عیراق بەبیانوی ئەوەی ئەوانە لە ڕەچەڵدا ئێرانین ،لەگەڵ هەموو ئەو شێوانەی کوشتن وبڕین کە باسمان کرد وبە دووقات لە کوردستاندا بەڕێوە دەچێتە .ئەوەی شایانی باسیشە کە وا بۆ چارەکە سەدەیەک دەچێت کە جەنگێکی ڕەگەزپەرستانەی شۆفێنستانەی بەردەوام لەئارا دایە لەدژی کوردستان ، جەنگێکی سەربازی وئابوری وڕامیاری وڕاگەیاندنی .هەروەها لەڕووی جەنگی عیراق وئێرانەوە ئەوا ویرانیەکانی دەبارنە سەر کوردستانی عیراق وئێران .ئەوەش کە دەبێتە جێگای گریان وپێکەنین لە یەککاتدا ئەوەیە کە دەبیستین هەندێک لایەنی کوردی جەنگ بەرپاردەکەن سەر یەکتری هەروەک کارەساتی ئەو دوو جەنگەی لە سەرەوە باسمان کردن بەس نەبن بۆ گەلەکەمان.

ڕژێمی فاشی ڕەگەزپەرستیش گەلێک هونەری نوێی هێناوەتە کایەوە بۆ بەرەنگاربوونەوەی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد ،هەرچەند ئەو بزووتنەوەیە گەلێکی بەزاندووە وخۆی نەبەزیوە کەوتە زیادکردنی گرتنی کەس وکاری خەباتگێڕان وتوند کردنی ئابلۆقەی ئابوریی ئەو گوندانەی دەکەوتنە ناوچە ڕزگارکراوەکان بۆ ناچارکردنی دانیشتوانەکانیان ڕووبکەنە سەربازگە زۆرەملێیەکان کە ڕژێم لەشێوەی ئۆردوگا بۆی کردوون ،لەوێشەوە لێیانخوڕن بۆ قادسیەکەی

سەدام،یان بۆ هەڵگرتنی چەک لەدژی رۆڵەکانی گەلەکەیان لەژێر ناوی تازەیان "بەتالیۆنە سوکەکان" هەرچەندە ئەو ناوەی کە بەردەوام پێوەیان لکاوە جاشە.لەلایەکی تریشەوە هەرچەندە ژمارەی جاشەکان کە بەم شێوە سەدامیە کۆ دەکرێنەوە زۆر زۆرتر لەجاران وئەوانەی کە دەبنە جاش لەناچاریەوەیە،دەبینین کارێکی ئەوتۆ ناکەنە سەر خەباتی چەکدارانە،ئەو خەباتەی کە گەلەکەمان دەیکات بۆ پاراستنی مانی وبەدیهێنانی مافەکانی .

بەنیسبەت ئیمپریالیزم وزایۆنیزم وکۆنەپەرستیەوە ئەم جەنگە بە جەنگێکی شێتانە دانانرێت، نا بەڵکو جەنگێکی ژیرانەیە و بە ووردی حیسابی بۆ کراوە وگەلێک ئامانجی بۆ بەدیهێناون وبەدی دەهێنێت بەوەی کە هەردوو وولاتیان بێ هێز کرد ودەخیلەکانی وولاتە پیشەسازیەکان پڕبوون لەئەنجامی فرۆشتنی چەک وتفاقی جەنگی ،هەروەها ئەمریکا وبەریتانیا وفەرەنسا بوون بە خاوەنی بوونێکی سەربازی بەردەوام لەدەوروبەری کەنداوی عەرەبی.ئێستاش لەوە دەچێت نیاز هەبێت بازنەی جەنگ فراوانتر بکرێت و وولاتی تر بگرێتەوە بێجگە لە عیراق وئێران وتەنانەت داخستنی نۆکەندی هرمز وخۆهەڵقورتاندنی وولاتی تر بەتایبەتی ئەمریکا کە بەردەوام ئەم مەبەستە بەرگوێ دەخات .

جا چۆن گەلی عیراق وهێزەنیشتمانیەکانی دەتوانن رووبەرووی جەنگی سەدام وئەنجامە ویرانکاریەکانی و کوشتن وبرینی فاشیانەی خوێناوی ببێتەوە؟ ،هەروەها رووبەرووی جەنگی رەگەزپەرستی شۆڤێنی ببێتەوە کە بەرپای کردووە بۆ سەر گەلی کورد ...؟،

خاڵی دەستپێکردن،بەرای ئێمە ورەنگە ئەوە رای هەموو لایەک بێت ،یەکێتی خەباتە بۆهەموو هێزە نیشتمانی ودیموکراتیەکان(کوردوعەرەب)و نەتەوەیی وئیسلامیەکان .

روخاندنی رژێمی فاشی رەگەزپەرستی خوێناوی بەرای ئێمە لەناو پارتی دیموکراتی گەلی کوردستان بەشێوەیەکی ئۆرگانی وچارەنووسی بە خەباتکردن لەپێناوی راگرتنی جەنگ .بەڵێ

ئێمە بڕوامان بەراگرتنی جەنگ هەیە لەسەر بنچینەی ئاشتیەکی دیموکراسی دادپەروەرانە بەبێ دابڕین و دەستگرتن بەسەر هیچ خاکێک ، لەگەڵ مافی گەلی عیراق بۆ هەڵبژاردنی ئەو رژێمەی خۆی دەیەوێت ، بەڵام بەرای ئێمە ئەوە نایەتەدی بەبێ رووخاندنی رژێمی فاشی سەدام . بۆیە خەباتکردن لەپێناوی کۆتایی هێنان بە جەنگ شان بەشانی خەبات دەڕوات لە پێناوی رووخاندنی رژێم وبەدیهێنانی مافە نەتەوەییە رەواکانی گەلی کورد مسۆگەر دەکات .

## دوا هەواڵ

لەم کاتەدا کەوا پێشەنگ بەرەو چاپخانە دەروات ،هەواڵمان پێ گەیشت کەوا جەماوەری قارەمانی شاری سلیمانی،دەستیان کردوە بە خۆپیشاندان وناڕەزایی دەربڕین لەدژی ئەو هێرشە درندانەی کە رژێمی فاشیستی صەدام دەستی پێ کردووە لەم شارەدا .بەتایبەتی دوای کوشتنی دوو فڕۆکەوانی هێزی ئاسمانی عیراق .

جەماوەری قارەمانی شاری سولەیمانیە لە خۆپیشاندنێکی گەورەدا هاواریان کرد :"بژی پەم" ، "بمری رژێمی فاشیست"،"شەڕ راگرن" .وبەرەنگاری هێزەکانی میری بوون ،کە دەستیان کردبە تەقەکردن ، وزیاتر لە ٢٠ هاوولاتی شەهید کران. ومیری فاشیست بە بلدوزەر گەرەکی سەرکاریزەی ویران کرد،وەهەروەها زیاتر لە ٢٠ هاوولاتیی بیتاوانی کوکرد وبەشێوەیەکی درندانە لەپشتی حەمامی نالی تیرباران کرد .


جەماوەری قارەمانی شاری هەولێریش بو پشتەوانی کردنی راپەرینی سولەیمانیە دەستیان کردە خۆپیشاندان،کە هێزەکانی پولیس وسوپا و ئەمن نەیانتوانی وەزعەکە کونترول بکەن، سی فروکەی هیلیکوپتەریان بەکار هینا .ولەم خۆپیشاندانەدا زیاتر لە ٨٠ هاوولاتی شەهید وبریندار کران .

هەروەها جەماوەری قارەمانی شارەکانی کەرکوک ،دهوک و ئامیدی بە خۆپیشاندان ومانگرتن پشتەوانی راپەرینی سولەیمانی وهەولێریان کردووە

# قۆناخمان هەرچوار پارچەی کوردستان بوو

## - پێشڕەو -

هەڤاڵ پێشڕەو پێشمەرگەیەکی لێهاتووی پارتی دیموکراتی گەلی کوردستانە، دوای ئەوەی لەگەڵ چەند هەڤاڵێکی تردا ، گەشتێکی دوورودرێژیان بە هەرچوارپارچەکەی نیشتمانی دابەشکراومان دا کرد،ئەم چەند لاپەڕەیەی نووسیوە بۆ "پێشەنگ" پێشمەرگەدلێرەکانی کوردستان بێ گوێ دانە سەرماو کرێوەو تۆف و زریان،سەرەڕای شەونخوونی ماندوویی و هەزاران مەترسی و سەرەڕای هەزاران گەلەگورگی برسی دوژمن ، چەکی کوردایەتییان کردۆتە شان و دەستیان کردۆتە ملی لوتکە سەرکەشەکان، شۆڕش بۆ ئازادی و پێشکەوتنی کوردستان و میللەتی کوردی چەوساوەیە ، شۆڕش بۆ لەناوبردنی زوڵم و زۆری بۆرژوا و کۆنە پەرستانە، بۆ بەدیهێنانی مافی چارەنووسی کوردستان و دابین کردنی حوکمێکی دیموکراتی شۆڕشگێڕە لە عیراق دا .



پایزێکی درەنگ بوو ،ئەوکاتانەبوو کە کوردستان وەک فریشتە بەرگی سپی ئاودامان دەپۆشێ ، لەسەرداواکاری پارتیمان،ڕێگامان گرتە بەر ، بۆ ئەنجامدانی ئەوئەرکانەی پێمان سپێردرابوو.

ڕۆژی ١٩٨٣/١١/٢٧ سەرەتای گەشتێکی دوورودرێژی سەخت و گران بوو، نیوە شەوێکی تاریک لەسنووری ئاگراوی تەلبەندکراو پەڕینەوە، پێمان نایە سەر کوردستانی ژووروو، کوردستانی شێخ سەعیدو دکتۆر فوئادو ئیحسان نوری ،ئەوکوردستانەی ئێستا سەربازگەیەکی (ناتۆ) و ئەمریکایە ، ئەوکوردستانەی جل و بەرگ و وشەی کوردی تیا یاساغ کراوە ... توانیمان لە ماوەی شانزە ڕۆژدا ئەم ناوچانە ببڕین " دەشتی سلۆپیا - بەناڤ - ژێرکی - مام خۆرا - ئالا - گەودا - دەشتی گەڤەر - زوربەی کات ڕۆژی پانزە تا شانزە سەعات بەڕێگاوە دەبووین . وەرزێکی سەخت بوو، ئەو کوێستانانە ڕەشایی پێوە دیار نەبوو، تەنانەت لەهەندێ شوێن ، وەک چیای فەراشین دوو مەترو نیو بەفر کەوتبوو .. خەڵکی گوندەکان (کەڵە)یان لەپێی خۆیان دەبەست تا بتوانن هاتووچۆ بکەن ، (کەڵە ) لەتەختەدار دروست دەکرێ شێوەیەکی بازنەیی هەیە و دووهێندەی پێڵاوی ئاسایی دەبێت و تایبەتە بۆ ناو بەفر . لەگوندەکان بۆ گواستنەوەی

ئالفی مەڕوماڵات لەچیاکانەوە بۆ ناو گوندەکان دوودار دەهێنن وەک بەلەمی لێدەکەن ئالفەکەی دەخەنە سەرو بەرەوخوار بەرەڵای دەکەن بەسەربەفرەکەدا دەخلیسکێ تادەگاتە ناو گوند. خەڵکی گوندەکان ژیانێکی کولەمەرگی و پڕ لەکوێرەوەری دەژین ، نزیکەی پێنج مانگ بەناچاری لەماڵ نایەنە دەرەوە، چونکە بەفر هەموو ڕێگاکان دەگرێ .

ژیانی گوندییەکان سەدی نەوەتی لەسەر بەخێو کردنی مەڕوماڵاتە و نزیکەی سەدی شەش لەسەر کشتوکاڵە ، کشتوکاڵیش زوربەی تەرخان دەکرێ بۆ چاندنی وێنجە تا وەک ئالفی ئاژەڵەکانیان سوودی لێوەربگرن ، بەشێوەیەکی کەمیش گەنمە شامی و گەنم و جۆ دەچێنن و زۆر بەکەمیش ڕەزیان هەیە و لەهەندێ شوێنیشدا بەڕێژەیەکی زۆر کەم تەماتەو باینجان و سەوزە دەچێنن .

ژن و کچی کورد شان بەشانی براو باوکیان ، کار دەکەن سەرەڕای ئیش وکاری ناوماڵ و پەروەردەکردنی مناڵ ، بەشداری دەکەن لە بەخێو کردنی مەڕوماڵات ودروست کردنی خانووبەرەو کشتوکاڵ و هەمووجۆرە کارێکی پێویست .. گوندییەکان زۆر ڕێز لە میوان دەگرن و بەگیان پارێزگاری میوانی خۆیان دەکەن، میواندارێتی بووە بەکارێکی ڕۆژانە ، بەتایبەتی گەر میوانەکە (پ.م) بێت ئەوا تەواو ڕێزی لێ دەگرن و هەموو ئاوایی دەوریان لێ دەدەن و لەگەڵیاندا دەکەونە گفتوگۆ وباسی شۆڕش وبزووتنەوە .

ژمارەیەکی زۆری گوندییەکان چەکدارن ، لەوکاتانەدا کە جەندرمەی ڕژێمی فاشیستی تورکیا هێرشیان دەباتە سەر، هەندێ لە چەکدارەکان ڕوودەکەنە چیابەرزەکان و هەندێکی تریان چەکەکانیان دەشارنەوە. پەیوەندی خەڵک لێرە لەگەڵ یەکتر پەیوەندی خێڵەکییە خزم و کەس و کاردەورێکی گرنگی هەیە بۆکارکردن لەیەکتر. ئاغاکانی ئەم ناوچانە تا ڕادەیەک دەسەڵاتیان ماوە ، هەرئاغایەک دیوەخانی تایبەتی هەیە، خەڵکەکە دەوری لێ دەدەن، ئەویش باسی خانەدانی خۆی و خراپی ئاغاو خێڵەکانی دەوروبەریان بۆ دەکات و ئاگری ناکۆکی لەنێوان ڕەش و ڕووتەکانی خێڵە جۆربەجۆرەکاندا هەڵدەگیرسێنێ .زۆر ئاغاش هەیە کە دەستیان تێکەڵاوە لەگەڵ ڕژێم و بەهەرجۆرێک بووە هەوڵ دەدەن تا خێڵەکوردییەکان بکەن بەگژ یەکتردا ،ئاگری ناکۆکی و شەڕ خۆش دەکەن ، لەسەر ئەم دژایەتییە دەژین کە هەرجارەی چەندەها کوردی بێچارەی بێدەسەڵاتیایدا دەبنە قوربانی و ئاغاش پاداشتی خۆی لە ڕژێم وەردەگرێ و زیاتریش دەست بەسەر گوندەکاندا دەگرێ .


ئەو ناوچانەی ئێمە پیایدا تێپەڕبووین سەدی هەشتای قوتابخانەی تیادا نیە ڕێگای ئۆتۆمۆبیل نیە، زوربەی گوندەکان هەشت نۆ سەعات پێ لەڕێگاوە دوورە، سەدی نەوەت و پێنجی گوندەکان کارەبایان بۆ ڕانەکیشراوە ، نەخۆشخانە هەر نیە ، هەرساڵ ڕێژەیەکی بەرزی مناڵان - لەتەمەنی (۲-۱۲) ساڵی - لەبەرنەخۆشی سورێژە دەمرن هەروەها زۆر لە ژن و پیاو وکچ و کوڕ بەنەخۆشی ئاسانی وەک ریخۆڵەکوێرەدەمرن لەبەر نەبوونی نەخۆشخانەو پزیشک لەناوچەکەدا .

کە کۆماندۆی ڕژێمی تورکیا هێرش دەبەنە سەرگوندییەکان ، دانیشتوان کودەکەنەوەو بە دەم لێدان و ئازاردانیانەوە جل و بەرگیان لەبەردا دەدرن، بەئارەزوی خۆیان هەندێکیان لەگەڵ خۆیان دەبەن بۆ بێگار وەک وڵاخ باریان لێ دەنێن و کەل و پەلی خۆیانیان پێ دەگوێزنەوە ، هەندێکی تریشیان زیندان دەکەن و زۆرجاریش لەبەر هیچ تاوانێک دەیانخەنە بەردادگا قەرەقوشیەکان و حوکمی لەسێدارەدانیان دەدرێ بەتاوانی یارمەتی دانی (پ.م) یان بەتاوانی ئەوەی لایەنگری پارتێکی کوردستانین.

لەو گەشتەمان دا گەلێ ناخۆشی و دەردەسەریمان هاتە ڕێ ، بەڵام ناخۆشترین ڕۆژمان ئەم ڕۆژانە بوو :

ڕۆژی ١٩٨٣/١١/٢٩ — لە چیای جودی یەوە بەرەو ناوچەی بەناڤی چووین، ڕۆژێکی زۆر ساردو بەفرو باراناوی بوو، لە بەرەبەیانەوە تا سەعات حەوتی ئێوارە هەر بەڕێگاوە بووین ، گەیشینە جێی تایبەتی خۆمان ، کەس لەوێ نەبوو، ناچار لەدەرەوە ماینەوە، باران و ڕەشەبایەکی توند بوو ، تا سەعات هەشتی بەیانی لەبەر با و باران ئاگرمان بۆ نەکرایەوە .

ڕۆژی ١٩٨٣/١٢/٢ — لەناوچەی ژێرکی بەرەو ناوچەی مام خۆرە بەڕێکەوتین بە(٩ ) کاتژمێر ڕێگەکەمان بڕی تا گەیشتینە سەر کەناری ڕووباری ماسی ڕۆ ، لەوێ نزیکەی دوومەترو نیو بەفر کەوتبوو ، لەپەڕینەوەدا هەموو جل و بەرگ و سەرتاپامان تەڕبوو، بەدەم ڕەشەباوە بەفر دەباری بۆ ماوەی دەکاتژمێر ڕێگامان هەڵە کرد، لە ماندوویی‌دا دوو هاوڕێمان توانای ڕۆیشتنیان نەماو لەپێ کەوتن .


خستنە سەر نێت:- چالاک
chalakmuhamad@gmail.com

ڕۆژی ١٩٨٣/١٢/٥ — لەناوچەی ئالا بەرەو کوێستانەکانی فەرەشین کەوتینە ڕێ بەدەم باو بەفر و کڕێوەوە پانزە کاتژمێر بەڕێگاوە بووین ، دیسان لەبەر زریان ڕێگامان لێ هەڵە بوو ، دوو هاوڕێمان بەیەکجاری پەکیان کەوت ، هێزی بزووتن لەلەشیاندا نەما ئەوەی کەمی هێزو گوڕمان تیابوو ڕوومان کردە گردێکی بەرز لەوێ چەند فیشەکێکمان بەسەر یەکێ لە گوندەکاندا تەقان، زۆر بە خێرایی حەرت پیاوی ئەو گوندە هاتن بە دەنگمانەوە. بردیانین بۆ ناو ئاوایی .

ڕۆژی ١٩٨٣/١٢/٩ لەناوچەی (گەودا ) بەرەو کوێستانی ( فەرەشین کەوتینە ڕێ،بەفر لە دوومەتر زیاتر لە ئەرزا بوو پاش پانزە کاتژمێر رویشتن بەدەم بەفربارینەوە گەیشتینە گوندێک لەماڵێک لامان دا و پشوویەکمان دا و پاش یەک کاتژمێر ماڵئاواییمان لەو گوندەش کردوو ، ڕوومان کردە ناوچەی (گەفەر ) گەیشتینە ڕووبارێک ، ئاوەکەی زۆر هەستابوو، دووهاوڕێمان کەوتنە ناو ڕوبارەکە، گشت گیانیان بوو بەئاو، لەنیوە شەودا ڕەشەبایەکی زۆر بەهێز هەڵی کرد، زۆرجار نەماندەتوانی لەشوێنی خۆمان جوڵە بکەین ، هەرئەو شەوە هاورێیەکمان لە پەل و پۆ کەوت ،یەکێکان چەک و جانتاکەی بۆ هەڵگرت و دووی ترمان خستمانە سەرشانمان و کەوتینەڕێ ، پاش سەعات و نیوێک گەیشتین بەگوندێک، لەوێ کەزانیان ئێمە پێشمەرگەین زۆر زۆر بەگەرمی ڕێزیان لێ گرتین.

* * *

له حەڤدەهەم ڕۆژی گەشتەکەمان دا ، لەخوارووی قەزای گەفەر ەوە خۆمان کرد بەناو کوردستانی ئێران دا ، گەیشتینە ناوچەی شوکاک، چوینە گوندێک لە ڕۆژئاوای گوندەکەی ئیسماعیل خانی سمکۆ ، چاومان بە پیرەمێردێک کەوت کە تەمەنی لە هەشتاو پێنج ساڵی تێپەری دەکرد ،باسی بەشداری خۆی بۆ دەکردین لە گەورەترین شەڕی ( سمکۆ) دژی ئەرتەشی ڕەزا شا . دەیگووت هێزێکی هەشت هەزار کەسی ڕەزا شا هێرشیان هێنا یە سەر شوکاک، ئێمە سێسەدو پەنجا پێشمەرگە بووین لەگەڵ سمکۆ ، شەڕ شانزە سەعات بەردەوام بوو ، توانیمان بە قولایی شەست و پێنج کیلومەتر لە ناوچەکەمان ڕزگار بکەین و سێسەدوچل سەرباز بەدیل بگرین و سێسەدو شەستیان لێ بکوژین و بریندار بکەین ، دەستکەوتمان لە شەڕەکەدا پێنجسەدو چل پارچە چەک بوو، ناوچەی شوکاکمان کردە گۆڕستان بۆ هێزە هێرش هێنەرەکانی ڕەزا شا ئەیگووت هەرچەندە ئەرتەش چەک و جبەخانەیەکی زۆری پێبوو بەڵام هێزی باوەڕی میللەت وسمکۆ وەک شێر بوو بوئیمە ، گووتی سمایل خانی سمکۆ مرۆڤێکی ئازاو بەجەرگ و لێهاتووبوولەکاتی هێرش کردن و بەرگری کردندا سمکۆ لە پێش پیشمەرگەکانەوە دژی دوژمن ڕادەوەستا و دەجەنگی. لەوشەڕەدا ، هێشتا بیرم ماوەکە (١٥٠) ئافرەتی کورد بەشدارییان کردلەگەڵ (٢٥٠) منداڵ کەتەمەنیان لە نێوان(٩-١٢ ) ساڵان بوو، خواردن و ئاویان دەهێنا بۆ پێشمەرگەکان،زیانمان لەو شەڕەدا (٣٢)شەهید بوو ، کەزوربەیان ژن و کچ و منداڵان بوون، بەخوێنی خۆیان کوردستانیان ئاودا .

× × ×

ناوچەی شوکاکمان جێهیشت و ڕوومان کردە ناوچەی سوما کە دەکەوێتە ڕۆژ ئاوای شاری ورمێ،لەوێشەوە ڕوومان کردە ناوچەی مەرگەوەڕ و شنۆ تاگەیشتینە نەغدەدە، بە (١١) کاتژمێر توانیمان دەشتی ڕۆژهەڵاتی نەغدەدە ببڕین و بگەینە ناوچەی مەهاباد و لەوێشەوە بەرەو سەردەشت بڕۆین و ڕووبکەینە چیای قەندیل . ماوەی نێوان ناوچەی ئارارات لەسەر سنوری کوردستانی تورکیا تا سەردەشت و دۆڵەتوو (پانزە ڕۆژمان پێ چوو کە هەر ڕۆژ دوانزە یا چواردە کاتژمێر بەڕێگاوە دەبوین . ئەو گوندانەی پیاتێ پەڕدەبووین قوتابخانەیان تیاکرا بۆوەو تا پۆلی سێ سەرەتایی بە کوردی دەخوێنن .

لە کوردستانی ئێران هەواڵی دڵتەزێنی کۆچی دوایی هەڤاڵ نوری شاوەیس گەیشت کە یەکێکە لە سەرکردە بەزنەکانی بزووتنەوەی ئازادیخوازی میللەتەکەمان و دامەزرێنەرو ئەندامی مەکتەبی سیاسی پارتیمانە . زوربەی دانیشتوانی گوندەکانی کوردستانیئێران و عیراق زۆر دڵگران بوون بەم هەواڵە ناخۆشە . هەروەها زوربەی جەماوەری کوردو لایەنە سیاسییەکان باسی خەباتی هەڤاڵی تێکۆشەر (سامی عبدالرحمن ) ئەمینداری گشتی پارتیمانیان دەکرد کە دەورێکی باڵای هەبووە لە هەڵگیرساندنی شۆڕش دژی ڕژێمی عیراق پاشکارەساتەکەی ١٩٧٥ .

لەناوچەی پشدەرەوە چوینە ناو کوردستانی عیراق ڕوومان کردە دۆڵی سەفرەو زەروون بە پانزە کاتژمێر گەیشتینە گوندی گەڵالی لەپارێزگای سلیمانی لەوێشەوە چووین بۆ سەرگەلو پاشان-بۆ سورداش و لەوێشەوە بەرەو دوکان و چوارقورنەو بێتواتەوخەلیفان چەند هاوڕێیەکمان لە ناوچەی سلێمانی مانەوە، ئەوانی تر هاتن بۆ ناوچەی بالیسان سەر بە پارێزگای هەولێر ، من لەوێوە بەتەنیا چووم بۆ ناوچەی دهۆک و بۆ ماوەی (٥) مانگ لەوێ مامەوەو پاش بەجێهینانی تەواوی ئەوئەرکانەی پێم سپێردرابوو گەڕامەوە بنکەی خۆمان ■

# کوردەکانی پاکستان

نووسینی: میرعەبدولرەحمان کورد
سکرتێری گشتی پارتی نیشتمانی دیموکراتی بەلوجستان
وەرگێڕانی لە ئینگلیزیەوە: م . ک . باپیر



میر عبدالرحمن کورد

( پێشەکییەکی کورت )

کوردێکی پاکستانیم بۆ یەکەمجار لەشاری کەراچی دی.. قوتابی کۆلیژی ئەندازیاری بوو.. وێنەیەکی قاسملۆو لافیتەیەکی سوری گەورەی ( بژی کوردستان ) ی بەژوورەکەیدا هەڵواسیبوو دوای ماوەیەک چورمە ناوچەکەیان ( خوزدار )دە رۆژ لەناویاندا مامەوە ... ئەوەی جێگەی داخ بوو کەسم دەستنەکەوت تۆزقاڵێک لە مێژووی ئەم کوردانەم بۆ باسبکات. جارێکی تر توانیم ( میرعبدالرحمن کورد ) بناسم سکرتێری گشتی پارتی دیموکراتی بەلوجستان، هەرچەندە چاوپێکەوتنی میر عبدالرحمن کورد ئەوەندە ئاسان نەبوو چونکە شەو ورۆژ لەژێرپشکنین و دوربینی پۆلیسەکاندا بوو .. بەهەر حاڵ گەیشتین بەیەک و زۆر بەگەرمییەوە بەخێر هاتنی کردم و داوای لێکردم لە شاری (کوێتا) ببم بە میوانی و باسی مێژوو بارو زرووفی کوردەکانی پاکستانیشم بۆ بکات .. میر عبدالرحمن کورد زیاتر بەپەرۆشەوە هەواڵی کوردستانی ئەپرسی و حەزی ئەکرد پەیوەندی لەگەڵ پارتەکانی کوردستاندا ببەستێت و نەتەوەکەی لە نزیکەوە بناسێت .

میر عبدالرحمن کورد کە بە (باوکی کورد) ناسراوەو نوسەری ئەم بەرهەمەیە زۆربەی ژیانی لە زینداندا گوزەرانوە .(ئەسلمکورد)ی کوڕی قوتابی کۆلیژی پزیشکی بوو بۆماوەی چەند ساڵێک لە ساڵەکانی هەفتادا سەرۆکی رێکخراوی خوێندکارانی بەلوجستان بوو ، لە شۆڕشی (١٩٧٥) ی بەلوجستاندا دەوری دیوەوەکو باوکی زۆر خراوەتە زیندانە تاریکەکانی پاکستانەوەو تاکو ئەمرۆ لەزینداندایەوکەس ناتوانی چاوی پێی بکەوێت .

لەکەراچی یەوە کەوتمە رێ بەشەمەندەفەر بۆ (کوێتا ) شاری سەرەکی بەلوجستان، تاکو میر عبدالرحمن کورد ببینمەوەو کوردەکان بناسم. گەشتەکەم لەکەراچی یەوە بۆ کوێتا بە شەمەندەفەر بیست و چوار سەعاتی خایاند.کە گەیشتمە شاری ( مەچ لوتکەی شاخەکاندەرکەوتن و بونیکی خۆشی گلەتەرەکەی شارەزور هات بە کاسەی سەرما ... خێرا ئەندێشەم فلیمێکی ژێر دارتووەکانی دێی ئاوەکەڵە و شاخی قەرەداخی هێنایەوە پێش چاوم، دوای ئەوەی کەبیستم ناوچەی کوردەکان لەشاری مەچەوە دەست پێ ئەکات خۆم بەپەنجەرەکەوە نوساندو ساتێک چاوم لەدیمەنی دەشتی بۆلان و چیا بەرزەکانی چواردەوری وەرنەگێڕا .. تەماشای هەموو لادێیەک و هەموو درەختێکم ئەکرد تەنانەت سەگی شوانەکانیشم لێ دەرنەکرد . شەمەندەفەر زۆر بە هێواشی ئەڕۆیشت .. چۆنم ئەویست وا بوو .. لەهەموو شارێکی بچکۆلەدا ڕاوەستا .. تێر تەماشای خەڵکەکەم ئەکرد .. زۆر بە ئاسانی سیماو ڕواڵەتی کوردەکانم ئەناسیەوە .. لەخەڵکەکانی ترم جیائەکردنەوە . کە گەیشتینە شاری ( ئاوی گوم) منداڵێک بە کوردی هاواری ئەکرد ( خورمای تازە ) ، منیش

بانگم کردو هەندێ خورمام لێکڕی و ووتم: تۆ کوردی ؟ ووتی: من کوردم .. ئەنجا منیش: ووتم من کوردم لە کوردستانەوە هاتووم. مندالەکە چاوەکانی بریبە ناو چاوم و بۆ ساتێ لە ناو خەیاڵدا نوقم بووو. نەم زانی بیر لەچی ئەکاتەوە .. هەرتەماشای ئەکردم، پاش نەختێ بیر کردنەوە زەردەخەنەیەکی لەسەردەم وچاوی ڕواند و پارەکەی بۆ گەڕاندمەوە ... زۆرم لێ کرد .. پارەکەی وەرنەگرت .. ئەوەی سەیر بوو من بە کوردی قسەم ئەکرد ئەویش تێئەگەیشت و بەزمانێکی تر وەڵامی ئەدامەوە .. منیش لە وەڵامەکەی تێئەگەیشتم ... منداڵێکی پێ خاوس و ڕەنگ زەردو کراسەکەی لە سێ لاوە درابوو... ئەم ڕووداوە ئەوەندە کاری تێکردم بەپێویستم زانی لێرەدا باسی بکەم. شەمەندەفەرەکە دەستی کردەوە بە جولان .. سەرم لە پەنجەرە-کەوە دەرهێنابوو هەرتەماشای منداڵەکەم ئەکرد ئەویش لەجێی خۆی چەقیبوو .. چاوی لەمن نەئەتروکاند تا لەیەکتری وون بووین.

لە(کوێتا) توانیم زۆر لە ڕۆشنبیرو خوێندکارە شۆڕشگێڕە کوردەکان ببینم ..تینوی هەواڵی کوردستان بوون .. ئەوەی زۆر ئازاری ئەدان و حەزیان نەئەکرد گوێیان لێبێت ناکۆکی ناو پارتە ڕامیارییەکانی کوردستان و شەڕی براکوژییەکە بوو.

میر عبدالرحمن کوردیش هەرچەند کاتی بۆ نوسین زۆر کەم بوو هەوڵی دا ئەم نووسراوە بە ئینگلیزی بنووسێ و منیش گۆڕیومەتە سەرزمانی کوردی تا خوێنەدواری کورد زیاتر لەبارەی گەلەکەیەوە بزانێ.

م. ک. باپیر

لەبەلوجستانی پاکستاندا ،چەند خێلێک هەن لە کۆنەوە بەکۆمەلێکی نەبەردو جەنگاوەر ناسراون. ئەم خێلانە خۆیان بە کورد دائەنین لە دەشتەکانی بۆلان دائەژین کە ئەکەوێتە ڕۆژئاوای پاکستان. (بولان) ناوچەیەکی جوگرافی گرنگەو ڕێگای بازرگانی یە لە ڕۆژ هەڵاتی ناوەڕاستەوە بۆ وڵاتی هیند هەروەها ناوچەیەکی بەرین و بەپیت و بەزنجیرەیەک شاخ دەورە دراوە. ئەو شارانەی زۆربەیدا نیشتوانی کوردن شاری(خوزدار)و (چالەوان)و (سارەوان)و (خاران)ە. هەروەها زۆر کوردی تریش لە بەشەکانی تری پاکستاندا بلاو بونەتەوە. لە (سند) لەشاری دێریغازیخان، لە(پەنجاب) لە شاری مەرازی روجان دائەنیشن.

مێژوونووسەکانی ڕۆژهەلات سەرەتایەکی تەواو دیاریکراویان بۆ کۆچ کردنی کوردەکان بۆئەم ناوچانە دەستنیشان نەکردووە.. بەلام ئەگەر بەووردی سەرنج بدەینە ئەو پەرتوکانەی لە سەر مێژووی کورد نووسراون ئەشێ بتوانین چەند حەقیقەتێکی تیا بدۆزینەوەزەمینەیەکیش بۆ باسەکەمان خوش بکەین.

فردەوسی لە شانامەکەی دا تیشکی ڕووناکی خستۆتە سەر زۆر حەقیقەتی شاراوەو مێژووی کوردەکانی پاکستان ئەگەرێنێتەوە بۆ سەدە دێرینەکان. لەم بۆچوونەی فردەوسییەوە واش دەرئەکەوێت کە هاتنی کوردەکان بۆ ناوچەی بەلوجستان کە ئەکەوێتە ڕۆژئاوایپاکستانی ئەمڕۆوە پەیوەندی هەبووە بە بارو زروفی ناخۆشی کوردستان و جەنگی خوێناوی نێوان فارسەکان و کوردەکان.

مەبەستی من لێرەدا ئەوەنییە کە دوژمنایەتی یەکی مێژووی لەنێوان دووگەلی دۆستدا وەکو کوردو فارس بهێنمە کایەوە ،هەرگیز گەلان نابن بە دوژمنی یەکتری بەڵکو فەرمانڕەوا فارسەکان بە حوکمی چینە کۆمەلایەتییەکەیان (نەک گەلی فارس) زولم و زۆریان لە گەلەکەمان کردووەو تاکو ئەمروش ئەو چەوسانەوەیە وەکو خۆی ماوەتەوە. جا هەرلە سەرەتاوە با خوێنەر ئەم خاڵەی لەیاد نەچێت کە هاتنی ئێمەی کورد بۆ ئەم ناوچە دوورانەو ئاوارەبوونمان و دەربەدەریمان هۆیەکی ڕامیاری هەبووە نەک ئابووری .. چونکە کوردستان لەڕووی کشتوکاڵ و مەڕو ماڵاتەوە ئەوەندە دەوڵەمەند بووە هیچ کاتێک گەلی کورد ناچار نەبووە لەبرساندا نیشتمانی جێ بهێلێ .. هەر ئەم دەوڵەمەندی و گوزەرانە ئابوورییەشە تاکو ئەمرۆ بۆتە هۆی داگیر کردنی کوردستان و زولم و زۆری ڕامیاری

لەلایەن چینە بۆرژوایییەکانی وڵاتەکانی ڕۆژ هەڵاتی ناوەڕاست .

جا با بگەڕێینەوە سەرباسەکەمان و ڕاکانی فیردەوسی . فیردەوسی ئەڵێ :


« نیستنددران(دشت) بسیارکوچ »

« زادنمان ولاچین و کورد و بلوچ »

ئەو (دەشت)ی فردەوسی ناوی بردووە بەشێکە لەناوچەی(بولان) کە ناوچەی کوردەکانی پاکستانە هەروەها فیردەوسی باسی جەنگی نێوان کاک کۆهزاد و ڕۆستم ئەکات .. کاک کوهزاد لەم ناوچەیەدا قەڵایەکی سەخت و گەورەی لەسەر چیای ( کۆچەلتەن ) "١" دروست کردووە کە سێ میل لەشاری ( نۆشکێ ) ی ئیستاوە دوورە و جیگایەکی ستراتیژی زۆر گرنگ بووە ، بەسەر هەموو دەشتەکانی بولاندا ڕوانیویەتی،دەشتەکانی بولانیش تەنیا ڕێگایەکی بازرگانییە کە وڵاتی هیند و وڵاتانی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست بەیەکەوە ئەبەستێت . بولان درێژییەکەی(٩٠) کیلۆمەترەو پانییەکەشی (٣٠) کیلومەترەلەم دەشتانە پێک هاتووە ( دەشتی بنگۆ ـ دەشتی کەلان ـ دەشتی زەردین ـ دەشتی کابو ـ دەشتی گوندین ) .

دیمس و مالسورات دوو نوسەری ئینگلیزین . لەسەر مێژووی بەلوجستانیان نوسوەو لەو بڕوایەدان کە نزیکی و لێک چوونی کەلەپوورو زمانی کوردەکان و بەلوجەکان زۆرمان ئەگەیەنێتە ئەو حوکم دانەی کە ئەم دوو گەلەلەنەژاددا یەک بن . هەر ئەم هۆیەشە وای لە کوردەکانی پاکستان کردووە لە بەلوجستان بمێننەو بە درێژایی مێژوو پەیوەندییەکی باش ودۆستانەیان لەگەڵ بەلوجەکاندا هەبێت وبەلوجەکانیش هەرگیز بە چاوی بێگانەوە تەماشای کوردەکانیان نەکردووە . ئەم دوو نوسەرە لەهەمان کاتدا ئەگەڕێنەوە سەرهەمان بڕوا کە باری ناخۆشی ڕامیاری کوردستان ئەم کوردانەی ناچارکردووە ڕوو بکەنە ئەم ناوچانەو لەگەڵ برا بەلوجییەکانیاندا بژین .

مێژوو نووسێکی بەلوجی (میرگول خانسیر) لە پەرتوکی ( بەلوج و بەلوجستان ) لەگەڵ بڕواکانی فردەوسی و دیمس و مالسورات ڕێدەکەوێت و هۆی کوچ کردنی کوردەکان بۆ بەلوجستان ئەگەڕێنێتەوە بۆ جەنگی خوێناوی بێ ڕەوای ( نەوشیروان ) دژی کوردەکان. ئەم جەنگە ناڕەوایە کارەساتێکی گەورەی بەسەر کوردەکاندا هێنا و زۆریان کوردستانیان جێ هێشتو لەناوچە شاخاوی و سەوزەکانی بەلوجستاندا وەکو ناوچەی ( سیستان)وکەناری ڕووباری (گەرمەسیل ) و (خوزدار)و (قەڵات) دا جێ نشین بوون .



## زمان

کوردەکانی پاکستان زمانی ڕەسەنی خۆیان لەبیر چۆتەوە ، ئەمەش ئەگەڕێتەوە بۆ دووری و ئاوارەییان لە کوردستان و پچرانی پەیوەندییان بە کوردەکانی کوردستانەوە . دووهەمیش زمان و شێوەی ژیانی بەلوجەکان کارێکی زۆریان کردۆتە سەر. لەگەڵ ئەمەشدا هەر شانازی بە کوردەواری ونیشتمانی خۆیانەوە ئەکەن و بەسەربەرزییەوە ناوی کورد ئەبەن . زمانی کوردەکانی پاکستان زمانێکی موتربە کراوە لە زمانی کوردی و بەلوجی بە زمانی ( براهۆی )"٢" ناسراوە. زمانی براهۆی لە ناوچەی مەکران و لسبیلە پێی ئەوترێت ( کورد گەلی ) . میر گول خانەسیر لەو بڕوایەدایە وشەی (براهۆی) لە(براخۆی ) یەوە هاتووەو یەکێکە لە خێڵەکانی کورد لە کوردستانی ئێرانەوە گەیشتونەتە بەلوجستان."٣"

ماموستا (مردۆخی ) لەپەرتوکی ( نەژادی کورد) بەزمانی فارسی زۆر خێڵ و تیرەی تری بەکورد داناوە و بۆ ئەم مەبەستەش نەخشەیەکی

بنەماڵەی ئەو خێڵانەی كێشاوەو نەژادیانی گەڕاندۆتەوە سەر گەلی كورد، ئەمڕۆ ئەم خێڵانە وەكو ( كەلپەر - مەری - بوكتی - مەگەزی - یوسف زەی ) بەبەلوج ناسراون . هەروەها ماموستا مەردوخی باسی دەوڵەتی كوردەكان لە بەلوجستان ئەكات پایتەختەكەیان شاری قەلات بووە ( تاكو ئەمڕۆ ماوە ) نزیكەی ٣٠٠ ساڵ لەساڵی ١٦٤١-١٩٤٨كوردەكان فەرمانرەوایان كردووە "٤"

## كوردەكان و ئیمپریالیزمی بەریتانی

ئینگلیزەكان پەلاماری هیندیان داو دەستیان كرد بە چەوساندنەوەو ڕووتكردنەوەی گەلانی ئاسیا .. لەو هەڵوێستە بۆگەنەئیمپریالیستیەیانەوە چاوی تەماحیان بڕیە ناوچەی بولانكە ناوچەی كوردەكان بوو تاكو ڕێگایەكی زەمینی بۆ لەشكر و فەرهودی بازرگانییانبكەنەوەو بە ئاسانی بگەنە ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست . لەبەرئەو هۆیە لەساڵی ١٨٣٨ هێرشێكی سەختیان كردە سەر ناوچەی بولان .. بەڵام ئەم هێرشەهەرچەندە سەخت بوو نەیتوانی لەئاستی نەبەردی كوردەكان و بەلوجەكاندا خۆی ڕابگرێت و ئینگلیزەكان شكان و بە نائومێدی گەرانەوە دواوە چەكو باروتێكی زۆریان لە پاشخۆیان جێ هێشت . ئازایەتی كوردەكان بەسەركردایەتی یوسف خان هەتاكو ئەمڕۆ لەسەر زمانی خەڵكی ناوچەكەیە .

## ژیانی ڕامیاری كوردەكان

دوای دەرچوونی ئینگلیزەكان لە ناوچەی بولان .. جگە لە بولان ناوچەكانی تری بەلوجستان كەوتنە ژێر دەسەڵاتی ئیمپریالیزمەوە . ئەم بارە ناخۆشو تاڵە تاكو ساڵی ١٩٢٠ وەكو خۆی بە سڕ كراوی مایەوە هیچ شۆڕشێك دژی ئیمپریالیزم بەرپا نەكرا ، هەرلەوساڵەدا بوو لاوێكی ڕۆشنبیری شۆڕشگێری كورد ( میر عبدالعزیز كورد ) توانی پارتی ( نیشتمانی ) دامەزرێنێت و هەموو خێڵە بەلوجەكانیش لەژێر ئالای پارتەكەیدا كۆبكاتەوە داوای ئازادی بەلوجستان بكات . شۆڕشی بە لوجستان بەسەركردایەتی ئەم شۆڕشگێڕە كوردەو یارمەتی بەلوجەكان و كوردەكان لەو ساڵەدا هەڵگیرسا و دەستكرا بەخەباتی چەكدارانە دژی ئیمپریالیزم .نواب نەوروز خان سەرۆكی خێڵی ( زەرەك زەی ) تاكو ساڵی ١٩٥٨ چەكی دانەناو لەژێر ئالای شۆڕشەكەی عبدالعزیز كورد دا خەباتی ئەكرد . لەزەمانی جەنەرال ئەیوب دا دەوڵەتی ئیسلامی پاكستان لەسەر قورئان لەگەڵ نەوروز خان دا ڕێكەوت و ڕەزامەندی خۆی بۆ جێبەجێ كردنی داواكارییەكانی پیشان دا ، بەڵام ئەم ڕێكەوتنە وەكو هەموو بەڵێنێكی ئیمپریالیزم و نوكەرەكانی بێ ناوەڕۆك بوو . نەوروزخان و پێنج سەد پێشمەرگە چەكیان دانا و نەوروز خان دەستو برد خرایە زیندانەوەو كوڕەكەشی لەسێ دارەدرا . نەوروز خان لە زیندانی ( حەیدەرئاباد) دا مایەوە تا لەتەمەنی ٩٠ ساڵیدا كۆچی دوایی كرد .

دووەم سەركردە ( نورالدین منگل ) نزیكەی شەش هەزار چەكداری هەبوو ، ئەمیش لەجەنگدا بەدیل گیرا و ڕەوانەی شاری ( پونە ) كرا نزیك شاری بۆمبای ، دەساڵ لە زیندانی پونە دا مایەوە و لەگەڵ ڕوخاندنی ئیمپریالیزم لەهیند ئەویش ئازاد كرا . ( خان محمد زەهری) نزیكەی دەهەزار چەكداری هەبوو لە كۆبوونەوەیەكدا بەدەستی سیخوڕێكی ئیمپریالیزم لە ساڵی ١٩٢٤ داكوژرا .

ئەم شۆڕشە بەسەركردایەتی میر عبدالعزیز كورد هەرچەند ووردە ووردە زۆر لاواز بوو تاكو لەلایەن دەوڵەتی ئیسلامی پاكستانییەوە بەتەواوی كوژایەوە چالاكی و كاری ڕامیاری پارتی نیشتمانی هەرگیز خەفە نەكرا . ئەم پارتە بەبەردەوامی تاكو مردنی عبدالعزیز كورد لەتەمەنی ٦٤ ساڵیدا "٥" لەساڵی١٩٦٩ دا زور جموجۆڵی ڕامیاری هەبوو. دوای مردنی عبدالعزیز كورد پارتی نیشتمانی بوو بەدوو بەشەوە :

١- پارتی نیشتمانی ( وەكو خۆی مایەوە هەمان پەیڕەو پرۆگرامی هەیە ).

٢- پارتی دیموکراتی نیشتمانی ( زیاتر ڕادیکاڵی و چەپ ڕەوە ) .

لەهەمان کاتدا ئەم دوو پارتە دژ بە ئیمپریالیزم و کۆنەپەرستانن و داوای ڕژێمی دیموکراتی بۆ پاکستان و ئۆتۆنۆمی بۆ بەلوجستان ئەکەن . زۆر ڕابەرانی ئەمڕۆی شۆڕشی بەلوجستان وەکو ( میرغوس بخش بیزبخو) کە ڕابەری شۆڕشی چەکدارانەی بەلوجستان بوو لەساڵی ١٩٧٥ ، لەژێر دەستی عبدالعزیز کوردا پەروەردە کراوە .

میر عبدالعزیز کورد پەیوەندی لەگەڵ سەرکردەکانی شۆڕشی کوردستاندا هەبوو نامەی لەلایەن مستەفا بەرزانییەوە بۆ ئەهات و زانیارییەکی باشی دەربارەی کوردستان هەبووو ، هەموو جارێک لەدەوری کۆئەبوینە وە باسی شۆڕشی کوردستانی عێراق و دەوری پارتی دیموکراتی کوردستانی بۆ ئەکردین ، ئەوەی جێگەی داخە پۆلیسی دەوڵەتی پاکستان گرتیان پەرتوکخانەو نامەکانیشیان سوتان و هیچ پاشماوەیەکیان جێ نەهیشت کە توزقاڵێک سوودی لێ وەرگرین . مردنی میر عبدالعزیز کورد تەنیا نوشوستی نەبوو بۆ کوردەکانی پاکستان بەڵکو کارێکی سلبیشی کردە سەر یەکێتی بزووتنەوەی بەلوجستان و سەروکێکی مەزنمان لەدەست چوو .



چیاکانی دەشتی بولان

دوای عبدالعزیز کورد زۆر ڕۆشنبیری تری کورد توانیویانە لەباری ڕامیاری بەلوجستاندا دەور ببینن. لەسەردەمی بۆتۆ دا دووئەندامی پەرلەمان ( محمود عبدالعزیز کوردکە لەساڵی ١٩٨١ کۆچی دوایی کردووە لەگەڵ عبدالواحد کورد ) لەناو کوردەکاندا هەڵبژێردران،لە هەڵبژاردنی ١٩٨٥ دا لەژێر سایەی دەوڵەتی کۆنەپەرستی ئەمڕۆی پاکستاندا کوردەکان مانیان گرت و بەشدارییان نەکرد بەڵکو زۆربە توندی دژی دەوڵەت و پیلانەکانی ڕاوەستاون.

( کوێتا - بەلوجستان )

٢٧ / ٧/ ١٩٨٥

**پەراویزەکان :**

١- کۆچەلتەن : وشەیەکی لێکدراوە ( کۆ ) (چەلتەن ) کۆ واتە شاخ بەزمانی براهوی.

٢- ئەگەر بەووردی تەماشای زمانی براهوی بکەین زۆر ووشەی کوردی ڕەسەنی وەکو خوی تیاماوەتەوە بۆ نموونە کوردەکانی پاکستان ئەڵێن : من ڕۆم - من ناڕۆم ، من زانم - من نازانم ، من خۆم - من ناخۆم ....

٣- ژمارەی کوردەکانی پاکستان نزیکەی(٣٠٠,٠٠٠) سێ سەد هەزار کەسە .

میر عبدالعزیز کورد هەموو ژیانی لەناو شاخ و زینداندا بردە سەر . لەساڵی١٩٣٤ بۆ پێنج ساڵ زیندان کرا ، هەروەها دیسانەوە لەساڵی١٩٤٠ ، ١٩٤٨، ١٩٥٧، ١٩٦٠ ١٩٦٢ و لەساڵی١٩٦٧ تا ١٩٦٩ لە زینداندا بوو .. لەدوا ساڵدا لەبەر ئەوەی زۆر نەخۆش بوو لەزیندان دەرهات و لەماڵەوە کۆچی دوایی کرد .

(( پەراویزەکان لە نووسینی - وەرگێڕ - ە ))

# لەڕاپۆرتی سیاسیی پارتی دیموکراتی گەلی کوردستانەوە

## نەتەوەی کورد ومافی چارەنووس

بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد رووبەرووی چەند جەنگێکی خەباتگێرانە دەبیتەوە، یەکەم لەگەل خوی، دووهەم دژی دوژمنەکانی، لەگەل راگەیاندنی فراوان لەنیو رای گشتی جیهان بو ئەوەی بتوانیت مەسەلەی مافی دیاری کردنی چارەنووس بکات بەراستییەکی ئەوتو کە نەتوانریت پشتەگوی بخریت، یان بازی بەسەردا بدری.

لەبواری ناوخوشەوە پیویستە بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد ریرەویکی پیشکەوتنخوازی جەماوەری بو خوی دەستنیشان بکات ولیی لانەدات هەروەها هەول بدات هەموو هیزە نیشتمانی و پیشکەوتنخوازەکان لەهەر ولاتیک کە بەشیک لە گەلی کورد تیایدا دەژی کوبکاتەوە لەبەرەیەکی نیشتمانیدا، لەگەل بەهیزکردنی یەکگرتن وبرایەتی لەنیوان پارت وهیزە پیشکەوتنخوازەکان لەهەموو پارچەکانی کوردستان، لەگەل هەولدانیکی راستەقینە وبی ووچان بو گریدانی کونگرەیەکی کوردی سەرانسەری بو هەموو پارتی وهیزە نیشتمانی و پیشکەوتنخوازەکان لە هەموو پارچەکانی کوردستان و دوستانی گەلەکەمانی بو بانگ بکریت. لە ئەرکەکانی ئەو کونگرەیەش لیکولینەوەی هەموو گیروگرفتەکانی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد ودەرکردنی بریاری گونجاو بویان، لەگەل دانانی بروانامەیەکی نیشتمانی کوردستانی وپیکهینانی دەزگایەک یان چەند دەزگایەکی بەردەوام بو چاودیری و ئاراستەکردنی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد، لەگەل دیاریکردنی چەند بنکەیەکی بەرپرسیار و خاوەن دەسەلات بو قسەکردن بەناوی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کورد بەگشتی. لەگەل دانانی بناغە بو مەلبەندی باس ولیکولینەوەی مەسەلەی کورد لەو جیگایانەی کە خوگرتن وبەردەوامی بو مسوگەر دەکات.

خەباتیش لەپیناوی ئەم ئامانجانە، کە هیچ دوو کوردیک لەسەری تیک ناچن، خەباتیکی سەختە ورەنگە دریژیش بخایەنیت وچەوسینەرانی میللەتی کورد ودەست وپیوەندە کوردەکانیان وئارەزووی تاکەکەس وگەلیکی تر لەم بابەتانە کوسپ دەخەنە ریگای ئەم ئامانجانە، بەلام (الله لایغیر مابقوم حتی یغیروا مابانفسهم)، جا نابیت چاومان لە دوو چەوسینەرانی میللەتی کورد بیت لە کونەپەرستان وشوفینیست و ئیمپریالیستان بو ئەوەی دان بنین بە مافی دیاریکردنی چارەنووسی میللەتی کورد، پیش ئەوەی کورد خوی زال نەبیت بەسەر بەرژەوەندیە چینایەتیەکان وتاکەکەسیە تەسک بینەکان کە دەبیتە کوسپ لەریگای هەستانیان بە کەمترین رادەی ئەرکە نیشتمانیەکان.

زور جار سەرکردەکانی کورد هەلگرتنی چەک لەدژی دوژمنیکی زوردار دەکەن بە بیانو بو پاکانەکردنی هەلە و کەمتەرخەمیەکانیان. هەلگرتنی چەک کاریکی پیویستە لەکاتیکدا کە دوژمنان دژ بە مافەکانی گەلەکەمان رادەوەستن وهەموو دەرگاکان لەرووی خەباتی ئاشتیانەی دادەخەن. بەلام مافەکانی کورد تەنها لە ریگای چەک نایەتەدی، چونکە ئەو ئامانج وئەو کارانەی لەسەرەوە باسکران لە چەک گەلگرتن گرنگترن و رەنگە بەبی ئەوانە چەک هەلگرتن کاریکی بی هودە بیت.

بو لاپەرە 40

# شۆڕشی نیکاراگواە باشترین بەڵگەیە بۆ سەرکەوتنی هێزی گەل .

د. کوردو

## کورتەیەکی جوگرافی ومێژوویی :ـ

نیکاڕاگوا ددکەوێتە ئەمریکای ناوەڕاست . سنوری بریتی‌یە لە، هیندۆڕاس لە باکور و کۆستاریکا لە باشور، دەریای کاریبی لە ڕۆژهەڵات ودەریای هێمن لە ڕۆژئاوایدا .

ڕوبەری ١٤٨٠٠٠ کیلۆمەتری چوارگۆشەیە، ٢ر٤ ملیۆن کەسی تێدا دەژی کە بە زبانی ئیسپانی دەدوێن ، لە روی ئابوریەوە ناوچەیەکی کشتوکاڵیە، لەگەڵ پیشەسازیەکی کەمی تازەپێگەیشتوو. بەرهەمی کشتوکاڵی زۆرە وەک ـ لۆکە، قاوە، برنج، فاسۆلیا، قامیشە شەکر، توتن و کاکاو وشتی تر. کەرەستەی خاوی سروشتی بریتیە لە ـ زێڕ، زیو، نیکل، قورقوشم، خەڵوز، نەوت وهەندێ شتی تر .


٥٥٪ی ئیشکەرەکان جوتیارن. ٥٠٪ی‌دا نیشتوان نەخوێندەوارن. ٣٠٪ی بێ کارن .

ساڵی (١٥٠٢) کۆلۆمبس دۆزیەوە، و بۆ ماوەی سێ(٣) سەدە لەژێر دەستی ئیسپانیا بوو، لەساڵی(١٨٢١) ڕزگاری بوو وسەربەخۆیی وەرگرت لەساڵی(١٨٢٣) بوە ئەندام لە "فیدرالی یەتی وولاتەکانی ئەمریکای ناوەڕاست ".

دەمێک بوو نیکاڕاگوا ببوە جێگای سەرنجی ئەمریکا وئینگلیز، لەبەر شوێنە ستراتیژیەکەی، بەتایبەتی دوای دۆزینەوەی زێڕ لە کالیفۆرنیا ساڵی(١٨٤٨)، وە بیریان لەوە کردەوە کە کەندۆیک دروست بکەن لە نێوان دەریای هیمن وکاریبی ، بۆ هاتوچۆ هاسان کردنی کاروانە ئاویەکان .

لەساڵی (١٨٤٩)میری نیکاڕاگوا ڕازی کرا بۆ ئەوەی کە کۆمپانیای ئەمریکی(ذی ئەکسیوری ترانسیت کابینی) ببێتە لێپرساوی بەڕێوەبەرایەتی ئەم کەنالە بەهەموو کاروبارێکیەوە .

لەبەر چاوتێبڕینی ئینگلیز لەم کەنالە و




لەترسی دەست بەسەرا گرتنی، ئەمریکا ناچاربوو کە پەیمانی(کلایتۆن ـ پۆلیڤەر) ،لەگەڵ ئینگلیز ببەستێ، کەبریتی بوو لە پەرەپێدانی کەنالەکە بەهاوبەشی .

دوای بەستنی ئەم پەیمانە، باری ناوخۆی نیکاڕاگوا زۆر شێواو وەبووە شەڕی ناوخۆ لە نێوان شاری (لیۆن)ی‌لیبراڵی و (گرانادا )ی پایتەخت ، کەمیری کۆنزەرڤەتیف حوکمڕانی‌دەکرد . وولاتە یەکگرتوەکانی ئەمریکا ئەوەی بە هەل زانی وسوپاییێکی بەسەرۆکایەتی(ولیام فالکیر) نارد بۆ نیکاڕاگوا لە ساڵی ١٨٥٥ لیبڕالیەکانی شاری(لیۆن)پێشوازی‌یان لێ کرد وکردیان بە (جەنەراڵ) ،ودوای ئەوە کەوتەری بەرەو(گرانادا )وداگیری کرد ،وپاشان سەرۆک وپیاوە گەورەکانی هەردوو لایەنی کوشت ودەستی بە سەر هەموو وولاتەکە داگرت ولە تەممووزی ساڵی(١٨٥٦) خۆی کرد بەسەرۆکی نیکاڕاگوا ،وئەمریکاش دانی پێ دانا وپەیوەندی دیپلۆماسی لەگەڵ دروست کرد .

دوای یەک گرتنی هێزەسوپاییەکانی هەندێ‌لە وولاتەکانی ئەمریکای ناوەڕاست ، فالکیر دەر کرا وهەرچەندە زۆر هەوڵی گەڕانەوەی دا، بەلام ساڵی(١٨٦٠)گیرا ولەسێدارە درا ونیمچە هێمنیەک گەڕایەوە بۆ وولات .

هەر لەساڵی(١٨٩٣)وە لیبرالیەکان حوکمڕا ـ

نیان دەکرد وزۆر خزمەتی وولاتەکەیان کرد وەدەستکەوتی کۆمەلایەتی باشیان وەدەست هێنا و زیانی زۆریان بە مەسلحی ئەمریکی گەیاند . جا لەبەر ئەم هۆیە بەئاشکرا ئەمریکا کودەتایەکی ڕێکخست بەسەرۆکایەتی(جوان ئەسترادا) لە ١٩٠٩/١١/٧، وە پشتگیری لێ کرد وبێ شەرمانەدانی بەو یارمەتی پارە وپول وچەک و سەربازی ئەمریکی نا ،وەتاکو چەسپاندنی حوکم خەلکێکی بێ تاوانی زۆریان کوشت .

لەسالی(١٩١٦) بەناوی "هەلبژاردنی سەرۆک"ـەوە بەشێوەیەکی ناشەرعی(جەنەرال ئەمليانۆ خامۆرا )ی کۆنە سەفیری نیکاراگوا لە ئەمریکا کرا بەسەرۆک ویەکسەر پەیمانی(بریان-خامورا ) یان مۆرکرد، کە بریتی بوو لە (هەقی تەواوکردنی کەنالی نێوان دەریای هێمن وکاریبی لە لایەن وولاتە یەکگرتووەکانی ئەمریکا )وە بە پێی ئەوپەیمانە ،کەنالەکە ودەور وپشتەکەشی کەوتە ژێر دەستەلات ومولکیەتی ئەمریکا وبەوەش ئەمریکا توانی بنکەیەکی دەریایی ستراتیژی دروستبکات . ولەترسی ڕاپەرینی گەلی نیکاراگوا ، لەسالی(١٩٢٢) چەند بنکەیەکیان دروستکرد بۆ ئامادەکردنی هێزێکی چەکدار بە ناوی(پاسداری نیشتمانی - الحرس الوطني)، کە پێکهاتبوو لە هەزارەها جاش وچلکاوخۆری خەلکی نیکاراگوا کەلەژێر دەستی ئەفسەری ئەمریکایی سەرپەرشتی دەکران ومەشقی کپکردنەوەو لێدانی ڕاپەرینی شۆڕشگێڕان دەدران .

هەر لەڕۆژی کودەتاکەوە گەلی نیکاراگوا دژی ویستەکانی ئیمپریالیزمی ئەمریکی وەستان وخەباتی بێ پایانیان کرد وقوربانی زۆریان دا ، کە گرنگترینیان ڕاپەرینە مەزنەکەی سالی (١٩٢٦)بوو، کە زۆر بە توندی دژی داگیرکەر وەستان ودژی پەیمانی(بریان - خامورا ) و بۆ سەربەخۆیی وولاتدەستیان دایە چەک وسەرتاپای وولاتیان هەژاند،تا ڕادەیەک کە سەرۆکی ئەو کاتە داوای لە سوپای ئەمریکی کرد کە هەر بمێنێتەوە لە نیکاراگوا لە ترسی ڕاپەریوەکان. حکومەتی ئەمریکی دوو نوێنەری نارد بۆ گفتوگۆ لەگەل سەرکردەکانی ڕاپەرین، ئەوەبوو کە هەموویان چەکیان دانا تەنها یەکێکیان نەبێت کە ئەویش(جەنەرال ئۆگیستۆ سیسار ساندینۆ)بوو، کە کۆنە ئەفسەری سوپای میری لیبرالی بوو .

ساندینۆ یەکەم بەیانی دەرکرد کە تێیدا گوتی "... سوێند دەخۆم بەنیشتمانم ومێژووەکەی ،کە ئەو شمشێرەم دەبێتە پشتگیر لەشەرەفی نیشتمانم بۆ نەهێشتنی زولم، ودامەزراندنی سەربەستی، وە بەرپەچدانەوەی ئەو دەست درێژیەی کە کرایە سەرم وسەر دلی نیشتمانە بەنرخەکەم بەدەست درێژی خەبات . من و سەربازەکانم وەک دیوارێک دەوەستین کە پۆلەکانی دوژمنی نیکاراگوای لەسەر تێک دەشکێت. وە ئەگەر سەربازەکانم دەست بوەشێنن بۆ لێدانی داگیرکەر ئەوا هیچ ئالایەکی بێگانە بە بەرزکراوەیی نامێنێتەوە لەسەر چیاکانمان،ئەی دوژمنان ئێوە هاتوون بۆ ئەوەی سەرمان ببڕن لە وولاتی خۆمان، وە چەندبێ ژمارەتان ئەوا هێزە نیشتمانیەکانمان ئامادەن بۆ بەرەنگارتان،وە ئەگەر هاتن بۆ شەڕمان ئەوا خوێنمان دەڕژێ و دەخشێ تا دەگاتە دیوارەکانی کۆشکی سپی (القصر الابیض)".

لەلایەکی ترەوە سەرەک هێزەکانی سوپای ئەمریکی بەیانێکی دەرکرد وتێیدا گوتی"ساندینۆی کۆنە جەنەرالی لیبرالی دادەنرێ بە کەسێکی لە یاسا دەرچوو ،وە میری وولاتەیەکگرتووەکانی ئەمریکا بەرپرسیار نیە بەرامبەر ئەو شەڕانەی کە سوپای چەکداری ئەمریکیدەیکا لەسەر خاکی داگیرکراو لە لایەن ساندینیەکانەوە". دوا بەدوای ئەوە چەندەها شەڕی بەتین روی دا کە ئەمریکا زۆر بە دڕندانە نوێترین چەکی قورس وسووکی بەکارهێنا لە ئاسمان و ووشکایی ودەریادا ، تەنانەت هەر لە ماوەی سالێکدا (٨٥)شەڕی جۆراوجۆر روی دا ، وە خۆڕاگری ساندینیەکان بوە هۆی دەنگدانەوەیەکی گەورە لە جیهان کە لە هەموو لایەکەوە دەنگی پێشکەوتنخوازانیان بۆ دەهات کە لە دلەوە پشتگیریان لێ دەکردن .

لەبەر سەرنەگرتنی ئەم جۆرە ڕێگایانە بو لەناو بردنی ئەو بزوتنەوە شۆڕشگێڕیانە،میری لەسالی(١٩٣٣)داوای لە ساندینۆ کرد کە بە

هێمنی چارەسەری گیروگرفتی وولات بکات ، بەڵام ساندینۆ یەکەم بەندی(شرط) بۆ دانیشتن و گفتوگۆ ،دەرچوونی دوا سەربازی ئەمریکی بوو لە خاکی نیکاراگوا .

هەر لەو کاتەدا بوو کە(بانستاسیۆ سۆموزا گارسیا )کرا بە سەرۆکی(پاسداری نیشتمانی) . دوای چەقاندنی ڕەگ وڕیشەیان ودامەزراندنی چلکاوخۆرەکانیان، هێزەکانی سوپای ئەمریکی دەرچوون لە نیکاراگوا .

لە ٣ی شوباتی ١٩٣٤ پەیمانێکی ئاشتیانە مۆرکرا وساندینیەکان چەکیان دانا و ناوچە ڕزگارکراوەکانیان داوە بە دەولت . دوا بە دوای ئەوە سۆمۆزا وپاسدارەکانی دەستیان وەشاند وزۆر لە هاوڕێکانی ساندینیان گرت و کوشت . وەلەبەر ناوبانگ دەرکردن وزۆری جەماوەری ساندینۆ ،سۆمۆزا لەگەڵ سەفیری ئەمریکی بڕیاری کوشتنی ساندینۆیان دا . لە کاتێکدا کە ساندینۆ و دوو لە هاوڕێکانی لە کۆشکی سەرۆکی وولات دەردەچوون دوای گفتوگۆ کردن لەبارەی جموجۆڵی پاسداری نیشتمانی دژ بە ساندینیەکان، چەند پاسدارێکی سەر بە سۆمۆزا تاویان دایە ساندینۆ وفڕاندیان وهەمان شەو کوشتیان ، وە دەستکرا بە قەڵاچۆکردنی ساندینیەکان وزیاتر لە ٣٠٠ کەسیان لێ کوژرا .

دوای دوو ساڵ لە کوشتنی ساندینۆ، واتە لەساڵی(١٩٣٦) ، سۆمۆزا هەڵسا بە کودەتایەک و خۆی کرد بە سەرۆکی وولات . لەو ڕۆژەوەخێزانی سۆمۆزا دەستیان گرت بەسەر حوکم، وە هەر ڕۆژەی لە دەست یەکێک لەو خێزانە ، یان دار و دەستەکانیان لە"پارتی نەتەوەیی لیبراڵی"ی یەوە بوو تاکو ڕۆژی سەرکەوتنی شۆڕشی گەلی نیکاراگوا لە (١٩٧٩/٧/٢٠).

خێزانی سۆمۆزا کە پەروەردەی دەستی(سی ـ ئای ـ ئەی) و کۆلیجە سەربازیەکانی ئەمریکان،هەر لە سۆمۆزای باوکەوە تاکو سۆمۆزا ـ دیبالە (کوڕی بچوکی سۆمۆزا ودوا سەرۆکی وولات لەم خێزانە) .

وە ئەم خێزانە لە فاشیەتدا هەمان شێوە و پلەی فاشیەتی عیراقی هەبوو بۆ هەمان مەبەست ، هەمان دەزگای کوشتن وبڕینی هەبوو، هەمان دەزگای ئاسایش وموخابەرات وئیستخباراتی هەبوو ، هەمان سوپای ناشەعبی(الجیش اللاشعبی) هەبوو ، هەمان دادگای بەرزی فاشی هەبوو بە خۆیی وبە یاسا دژ بە مرۆڤایەتیەکانیەوە ، بە هەمان شێوە پارە وپول ومولکی گەلیان دەدزی وحیسابیان لە بانکەڕۆژئاواییەکاندا گەیشتبوە بێ پایان، هەمان هەڵویستیان هەبوو بەرامبەر بە میریە کۆنەپەرستەکانی دراوسێسان وسەرتاپای جیهان دژ بە خەبات و بزوتنەوەی ڕزگاری خوازی گەلان وهەڵوێستی دژ بە وولاتە سۆشیالیستەکان ویەکێتی سۆڤیەت .

گرتنە بەری ڕێگای ڕزگاری تاکو سەرکەوتن-گەشەپێدانی ئایدیۆلۆژی وشێوەکانی خەبات :-

سەرکەوتنی شۆڕشی ئوکتوبەری مەزن ودەنگدانەوەی لە جیهان بووە هۆی ئەوەی کە هەموو گەلانی چەوساوە وزەحمەتکێشانی دونیا بەرەو پیلی بیر وڕێبازی(مارکسیزمی - لینینیزم)ەوە بچن . گەلی نیکاراگواش سەرەڕای ئەو زەخت و وزولم وزۆرەوە و دووری جوگرافی لە ئەورووپا ویەکێتی سۆڤیەت ، بەشی خۆیان لەو زانستە مەزنە وەرگرت وخەلکی ڕۆشنبیر بڵاوکردنەوەیان گرتە ئەستۆی خۆیان وهەڵسان بە دروستکردنی بازنەی ئالوگۆڕی بیری مارکسی لە ساڵی(١٩٢٥) بۆ ماوەیەک، ودواییی لەبەر گیروگرفت لە کار وەستان .

لەماوەی شەڕی دووهەمی جیهان(پارتی سۆشیالیستی نیکاراگوا )دامەزرا ، ئەو پارتەش هەر لەسەرەتاوە بۆ ماوەیەکی کەم توانی ببێتە پێشرەوی فیکری وعەمەلی گەل وزەحمەتکێشانی وولاتەکە ،وقوربانی زۆری پێشکەش بە خەباتی پێشکەوتنخواز کرد، وە بە نهێنی کاری دەکرد تەنها بۆ ماوەی(١٤)مانگ نەبێت کە لە ساڵی(١٩٤٤- تاکو ١٩٤٥) کە بەئاشکرا دەستی کردە کار وتوانی زیاتر جەماوەر لە دەوری خۆی کۆبکاتەوە .

بەدرێژایی ژیانی، پارتی سۆشیالیستە توشی چەندەها تەنگ وچەڵەمە وگیروگرفتی ناوەخۆ و دەرەوە بووە ،هێرشی دڕندانە کرایە سەر، کە بوە هۆی کوژرانی چەندەها سەرکردە وئەندامانی، لەبەر ئەوە نەیتوانی خەباتی چەکداری بکات

بەڵام زۆر لە ئەندامە لاوە خوێن گەرمەکانی ، دەستیان دایە چەک وزۆر گوێیان نەدایە خەباتی سیاسی وتا ڕادەیەک گوێیان شل نەدەکرد بۆ پارتی سۆشیالیست ، وئەوانە بوونەناوەرۆک بۆ دروست بوونی(بزوتنەوەی لاوانی نیشتمانی)و دوایی ناوی خۆیان نا (بەرەی ڕزگاری نیشتمانی ساندینی) لە ساڵی(١٩٦١)٠

ڕووداوی ڕۆژانەو ژیانی سەختی خەباتی دوورودرێژی دژ بە دیکتاتۆریەت وفاشیەت و ئیمپریالیزم، فێری کردن کە ڕێبازی ڕاستەقینە بۆ سەرکەوتنی گەلان ورزگاربوون لە دەستداگیرکەر، ڕێبازی مارکسیزمی - لینینیزمە و خۆچەکدارکردنە بە (تیۆری سۆشیالیزمی زانستی) وهاوبەشی کردنە لەگەڵ جەماوەر .

شۆڕشی نیکاراگوا یەکێکە لە نمونە بە نرخ وبە سوودەکانی سەرکەوتنی گەل وجەماوەری پێشکەوتنخواز بەهۆی یەک گرتنی خەبات لەگەڵ گشت لایەنە سیاسیەکان وپێکهاتن لەسەر بناغەی "ڕوخاندنی ڕژێمی فاشی و ڕزگاری لە دەست چەوسانەوە وژێردەستی و وەدەست هێنانی مافی دیمۆکراسی". ئەوەبوو چەند بەرەیەک پێکهات و چەپ وراستی کۆکردەوە هەر لە قەشە وپیاوە ئایینیەکانەوە بگرە تاکو ئەو پەڕی چەپڕەوەکان. بەتایبەتی بەرەی ساندینیەکان، وە دوو بەرەی تریش هەبوون بەناوی(بزوتنەوەی یەکێتی گەل) و(بەرەی پان وبۆری دژ بە ڕژێم).وە لەگەڵ بەرزبوونەوەی ئاگری شورش وخەبات لە ساڵەکانی دووایی‌دا ساندینیەکان وپارتی سۆشیالیست وبیست(٢٠) لە ڕێکخراوە شۆڕشگێر و جەماوەریەکان، لە ژێر ئاڵای(بزوتنەوەی گەلی یەکگرتوو)یەکیان گرت ولەلایەنی سوپاییەوە لیژنەیەکی باڵایان دانا .

لەساڵانی (١٩٧٨و١٩٧٩)دا باڵی چەپڕەوی بزوتنەوەکە بەتەواوی ڕێبەرایەتی گرتە دەستی خۆی ودووری خستەوە لە لادان لە ڕێگای ڕاستی بەتایبەتی دوای یەکگرتنەوەی هەرسی بەشەکەی بەرەی ساندینیەکان *.

**خەباتی چەکدار و ڕاپەڕین وڕاپەڕینی چەکدار:**

خەباتی چەکدار لەزووەوە سەری هەڵدا ،بەڵام دەتوانرێت بووترێت ، لەو ڕۆژەوە دەستی پێ کرد کە (ڕۆمان رایدلیس)ی کۆنەهاوڕێی ساندینۆ کە تەمەنی(٦٠) بوو ، لەساڵی(١٩٥٨)لەگەڵ چەند لاوێکی خوێن گەرم لە باکوری وولات دەستی بە خەباتی چەکدار کرد، بەڵام زۆری نەخایاند کپ کرایەوە بەدەستی سۆمۆزیەکان، وبنکەکانیان لەناو چیاکان داگیر کرا .

دوا بەدوای ئەوە، ودوای دروست بوونیان (بەرەی رزگاری نیشتمانی ساندینی)ئەو کارەیان گرتە ئەستۆ، وچەندەها بنکەیان دروست کرد، وهێرشیان دەبردە سەر بنکەکانی"پاسداری نیشتمانی"، بەڵام لەساڵانی ١٩٦٢-١٩٦٤ زۆربەی بنکەکانیان گیرایەوە، وەئەوەی کە ڕزگاری بوو لە مردن، هەڵگیرساندنەوە و بەردەوامی شۆڕشی چەکداری خستە سەر شانی خۆی .



● سوموزا پیاوی ئەمریکا

ساڵەکانی دوای ساڵی(١٩٧٠)دا دەنرێت بە ساڵانی ڕاپەڕین وسەرکەوتنی یەک لە دوای یەک و ناساندنی بزوتنەوە پێشکەوتنخوازەکەیان بە گەلانی جیهان، بەتایبەتی لە سەرکەوتنی چەند جۆرە عەمەلیاتێکی پێشمەرگە وفیداکارانە، کە توانیان چەندین لە دەستەوپەیوەند وخێزانی سۆمۆزا بفرێنن، وە هاوڕێکانیان ئازاد بکەن وپارە وپولێکی زۆر لە ڕژێم بسێنن بەرامبەر بە فرێندراوەکان .

ڕۆژ بە ڕۆژ ڕژێم زیاتر دیناڵاند لە بەر شکەستی ڕۆژانە ولەدەست خەباتی میللەت وگەورە بوونی ناکۆکی ناوەوە و گیروگرفتی ئابوری و کۆمەڵایەتی، بەتایبەتی دوا ساڵەکانی هەفتاکان، ئەوە بوو لەساڵی ١٩٧٨ڕاپەڕینە مەزنەکەی کە سەرتاپای وولاتی گرتەوە و هەناوی ڕژێمی

داتەکاند وبە تەواوی ئابڕۆی برد، ولە هەمان کاتیشدا هێزی گەل وخۆڕاگری نیشان دا بە گشت جیهان .

ئەو ڕاپەرینە دەستی پێ کرد بە شێوەی مان گرتن لە چەند کارگەیەک، ودوایی تەشەنەی کرد وبوو بە مانگرتنی گشتی لە (٨/٢٥) کە گشت جۆرە هاتوچۆ وپیشەسازی وبازرگانی یەک لەکار وەستا .مانگرتووەکان داوای وازهێنانی سۆمۆزایان دەکرد لەگەڵ داوا گشتیەکان،لە شاری (ماتا جالبا) شەڕێکی گەورە ڕوویدا لە نێوان ساندینیەکان ومیری ،ولەئەنجامدا میری شکا و شارەکە بەتەواوی کەوتە دەست ساندینیەکان ، ئەوە بوو سۆمۆزا شاری ماتاجالبای بەبێ بەزەیی بوردومان کرد .

لە ٩/٩ ساندینیەکان بڕیاری ڕاپەرینی چەکداریان دەرکرد تا ڕوخاندنی ڕژێمی سۆمۆزا .

لەلایەکەوە درێژە بە مانگرتن درا بۆ ڕۆژانی دوای ٩/٩، وە لەلایەکی ترەوە ڕاپەرینی چەکدار دەستی پێ کرد، وهێرش برایە سەر مەڵبەندەکانی پاسداری نیشتمانی ولە ماوەیەکی کەمدا ئەو شارانەی کە ڕاپەرینی تێداکرا کەوتنە ژێر دەستەڵاتی ساندینیەکان. سۆمۆزا هێزێکی گەورەی کۆکردەوە لە پاسداری نیشتمانی وسەدەها بەکرێ گیراوی بۆ هات لەلایەن ڕژێمە بۆگەن وکۆنەپەرستەکانی وولاتەکانی ئەمریکای ناوەڕاست، تەنانەت (کوبیەکانی) دژ بە شۆڕشی کوبای مەزن یش بەشداریان تێداکرد. وە چەکێکی زۆری قورس و سووکی پەیدا کرد لە ئیسرائیل وئەمریکا و وولاتەکانی تری سەر بە ئەمریکا لە ئەمریکای ناوەڕاست .

هێرش برایە سەر شارە ڕزگارکراوەکان زۆر بە دڕندانە وفاشیانە وبمباباران وکاول کردنیان بەسەر ئەو شارانە هێنا کە تا ئێستا لە مێژوودا مەگەر هیتلەر یان ڕژێمی فاشی عیراق بەو تاوانە هەڵسابن، هەر لە کوشتنی ژن ومنداڵ وپیر، دوای بە دیلگرتنیان تا نە هێشتنی شار ودێهات لەسەر ڕووی ئەرز وتەخت کردنیان .

ساندینیەکان وجەماوەری شارەکان توانیان بۆ ماوەی(١٢)ڕۆژ خۆیان بگرن وبەرەنگاری ئەو هێرشە ببن، ولەو ماوەیەدا بوونە باشترین نموونەی خەبات ودونیایان هێنایە هەژاندن، قارەمانانە قوربانی بێ پایانیان پێشکەش بە میللەت کرد، وتاوانەکانی ڕژێمی سۆمۆزا و ئیمپریالیزمی ئەمریکیان بە جیهان ناساند .

دوا بەدوای ئەم ڕاپەرینە، ئەمریکا بۆی دەرکەوت کە گەلی نیکاراگوا بەوە ناوەستی و ڕژێمی سۆمۆزا ش گەیشتبوە ئەو پەڕی لاوازی، جا بیریان لەوە کردەوە کە ڕژێمی سۆمۆزا لاببەن و دیکتاتۆرێکی تری سەر بە ئەمریکا ، بەڵام لە ژێر ناوێکی تر، دابنێن. هەوڵی زۆر درا بۆ کزکردنی بزوتنەوە ڕزگاریخوازە شۆڕشگێڕانەکە، بەڵام ساندینیەکان وبەرەکانی تر بەیانێکیان دەرکرد بۆ درێژەپێدانی هەمان شێوەی خەبات ، دژی ڕژێمی سۆمۆزا وهەر ڕژێمێکی تری وەک سۆمۆزا کە لەلایەن ئەمریکاوە دابنرێت، تاکو مافی چارەنووس دەکەوێتە دەستی میللەت .

دوای ماوەیەک لە هێمنیەکی نیسبیدا وە دوای ڕزگاربوون لە هەندێ ناکۆکی ناوخۆی ناوبەرەکان، کە بریتی بوو لە ناکوکی نێوان لایەنە سیاسیەکان لەسەر ڕووداو ئەنجامەکانی دوای ڕاپەرین وبەرپرسیارێتی هەر لایەنێکیان، لەئەنجامدا (بزوتنەوەی گەلی یەکگرتوو) لە بەرە پان و پۆڕەکە دەرچوون و لە گەڵ چەند ڕێکخراوێکی تردا (بەرەی نیشتمانی نەتەوەیی) یان پێک هێنا . ئەمەش جگە لەوەی کە لە ٧ ی مانگی ئاداری ١٩٧٩ هەرسێ باڵەکەی بەرەی ساندینیەکان ڕێک کەوتن لەسەر یەک خستنی کار و باری عەسکەری و (٩)کەسیان هەڵبژارد کە بوونە بەرزترین ئەنجومەنی سەرکردایەتی لەبزوتنەوەکە بە گشتی، شایانی باسە کە ساندینیەکان هەردەم دەست پێکەر ودەست وەشێن بوون لە گەڵ ئەو هەموو ناکۆکیەی کە لە ناویان دا هەبوو وە دایم هێزی کاریگەر وجەماوەری بوون .

دپسان مەشخەل بەرز کرایەوە ،لەناوەڕاستی ئاداری ١٩٧٩ چەندەها کاری چەکداری لە چەند شارێک کرا وە هێرشی ئازایانەیان بردە سەر بنکەکانی پاسداری نیشتمانی وسەرکەوتنی یەک لە دوای یەکیان بە دەست هێنا .

لەلایەکی تریشەوە ڕژێم هەوڵی خۆ بە هێز کردنیدا وە ژمارەی پاسداری نیشتمانی زیاد کرد وچەک وتفاقی نوێ وکوشندەی کڕی بە هۆی ئەو قەرزە گەورانەی کە لە وولاتە یەکگرتوەکانی ئەمریکای وەرگرت.

لەو کاتەی کە شۆڕش بەردەوام بە هێزتر دەبوو وە دەستکەوت وسەرکەوتنی باشی وەدەست دەهێنا، (ئەنجومەنی بەڕێوەبەرایەتی حکومەتی ڕزگاری نیشتمان)ئاشکرا کرا لە کۆستاریکا لە حوزەیرانی ۱۹۷۹، لەولاشەوە هێرشە سەرەکیەکەی ساندینیەکان دەستی پێکرد، وهەر لەو مانگەدا بوو کە دەستیان بە سەر (۲۵)شاردا گرت وچەکێکی زۆریان دەستکەوت، تاکو گەیشتنە شاری ماناگوا ولەسێ لاوە دەورەیان گرت.

لە ٥ ی تەمموزی ۱۹۷۹ سۆمۆزا بە خۆی وخاو وخێزانی ودەست وپەیوەندەکانی ڕایان کرد بە فرۆکەیەک بەرەو ئەمریکا، دوای ئەوەی کە یەکێک لە خزمەکانی خۆی دانا بە سەرەک کۆمار کە ناوی(فرانسیسکو ئۆکۆریۆ)بوو. ئەمەیان وای ڕاگەیاند کە واز لە حوکم ناهێنێ تاکو ساڵی ۱۹۸۱کاتی هەڵبژاردنی گشتی.

شۆڕشگێڕەکان پیلانی"ئۆکۆریۆ"یان تێکدا و لە(۱۸ی تەمموزی ۷۹)دا توانیان پایتەخت بگرن وئۆکۆریۆن ڕای کرد بوو دەرەوەی وولات.

لە ۱۹ی تەمموز ئاڵای ساندینی بەرزکرایەوە لەسەر کۆشکی سۆمۆزا.

شەو لە کۆبونەوەیەکی جەماوەریدا ناوی ئەندامانی میری شۆڕش خوێندرایەوە. ڕۆژی دوایی واتە لە ۲۰ی تەمموز (میری کاتی بۆ ڕزگاری نیشتمان)وسەرکردایەتی(بەرەی رزگاری نیشتمانی ساندینی)گوێزرانەوە لە شاری (لیۆن)ەوەبۆ شاری(ماناگوا) وبووە گەورەترین ئاهەنگی جەماوەری لە ناو جادە وکۆڵانەکانی ماناگوا.

هەر لە یەکەم چەند ڕۆژی دوای سەرکەوتن، دەست بەسەر هەموو سامان وزەوی وموڵکی سوموزا داگیرا، کە نزیکەی سێیەکی گشت زەوی نیکاراگوا بوو. وەدەست پێکرا بەدابین کردنی مافە دیموکراسیەکانی گەل، ومیری هەڵبژێردرا بە شێوەیەک کە نوێنەری ڕاستەقینەی گەل بێت.

لەساڵی ۱۹۸۰(ئەنجومەنی دەوڵەتی نیکاراگوا )دروست بوو، کە بریتییە لە"پەرلەمانێکی کاتی وە دەزگایەکی دەستووری ودیموکراتی بەوە نوێنەری گشت ڕێکخراوە سیاسی ونەقابی و کۆمەڵایەتی جۆراوجۆری تێدایە.

لەهەمان ساڵدا (بەرەی نیشتمانی)دروست بوو کە بریتییە لە چوار هێزی سەرەکی ئەوانەش (بەرەی رزگاری نیشتمانی ساندینی)، (پارتی سۆشیالیستی نیکاراگوا)، (پارتی لیبراڵی بێ لایەن)و (پارتی مەسیحی کۆمەڵایەتی)ن.

سەرکەوتنی ئەو شۆڕشە مەزنە ومێژووی خەباتی، پڕە لە تاقیکردنەوەی زۆر وبەنرخ وپڕ سوود بۆ گەلانی ڕزگاریخوازی ژێر دەستەی ئیمپریالیزم، وە نمونەیەکی بەرزە بۆ سەلماندنی هێز وتوانای گەل کاتێک کە خەبات دەکات بۆ سەرکەوتن و وەدەست هێنانی مافی چارەنووس وگرتنە بەری ڕێگای پێشکەوتن و ئاسایش وگەشەکردن.

جا بێ گومان جێگای سەرسوڕمان نیە کە ئەمریکا لەژێر سایەی حکومەتی(ڕیگان)، کە هەموو هەوڵ وتەقەللایەک بەکار دەهێنێ بۆ ملکەچکردنی ئەم شۆڕشە بۆ ویستەکانی خۆی و بیر وخێنی وبیکات بە عیبرەت بۆ گەلانی تری ڕزگاریخواز، وبۆ سەلماندنی هێز وتوانا و زەبەللاحی خۆی دژ بە خەباتی میللەتان، و بۆ چاوترساندنی بزوتنەوە شۆڕشگێڕیەکانی تری گەلانی ئەمریکای ناوەڕاست وگشت جیهانی ئیمڕۆ.

وە بەوەی کە لە دەستی هاتووە دژایەتی شۆڕشی نیکاراگوای کردوە هەر لە یەکەم ڕۆژی بزوتنەوەکە تاکو سەرکەوتنی ودوای سەرکەوتنی وهەتا ئیمرو.

جا ئەو گەلەی کە مافی چارەنووسی خۆی و ئەو سەرکەوتنە مەزنەی وەدەست هێناوە بەو هەموو دەردەسەری وخەباتە دوور ودرێژە سەختەوە، قەت بەئاسانی ناڕوخێ ومل بۆ پیلانی

بو لاپەرە 40


# سەرچاوەی هونەری میللی کوردی

نووسینی : جەمشید کوردۆ

هونەری کوردی لە کوردستان دا کولتور و پاشکەوتێکی زیندووە ، بەبێ پچڕاندن، هەمیشە پەیوەندی لەدایک بوونەوەی خووڕەوشتیهونەریی لەنێوان نەوە جیاوازەکانی نەتەوەی کورددا پاراستوە ـ ئەوەش گەنجینەی پراکتیکی کردەوەی دەرەونیی نەتەوەیە ، سەرمایە و کانگایەکی مەزنی بیر و هەست و هۆشی هونەر سازییە ، لەجوان پەرستی ـ ئیستێتیکی و بلیمەتی دا .

ڕوخساری نەتەوایەتی ـ لەکات و شوێندا ـ بەکۆمەڵێک یاسای سەخت و گران دا تێ پەر دەکات ، کە یەکەمیان : یاسای پەیوەندییە لەگەڵ سروشتی نیشتمان دا ، دووهەمیان : پەیوەندییە لەگەڵ مێژووی نەتەوایەتیو نیشتمانی دا ـ لە بۆتەی ئەو یاسا سەرەکییانەدا گشت یاساکانی تری زاخاو دانەوە و شارەزایی دەروونی و کولتوری چەکەرەدەکەن، لەهونەردا ڕەنگ دەدەنەوە . بەڵگە بۆ بلیمەتی هونەری میللی نەتەوەی کورد زۆروبێ سنورن ، کەم نەتەوەی ئەمڕۆی جیهان هێندەی گەنجینەی خۆماڵی و سەربەخۆ هەیە : جل و بەرگی نەتەوایەتی کوردی ، نەخش و نیگاری سەرجاجم و کوتاڵ و گۆرەوی و زین و خشڵ و مافورو بەڕەو کڵاو ، سیرامیک و مسگەری و ... .. هتد ، ئەگەر بێت و سەرپێیی سەرنجی جلی ژنانەی کوردی بدەین ئەبینین کە هەر وەکو چیاو دۆڵ و ڕوبارو دارستان و خاکی کوردستان بەجوانترین ڕەنگ و شێوە ـ فۆرم ـ خۆیان ئەنوێنن ، ڕاستەوخۆ پێوانەی دەروونی و فەلسەفی و جیوگرافی و مێژوویی نەتەوەی کورد دەرئەبڕن ـ هونەری میللی بەوە خۆی دیاری ئەکات کە پەیوەندی بەو یاسا کولتورییانەوە هەیە کە پاشکەوتکراون و ئاوێنەی ڕاستەوخۆی ژیانی ڕۆژانەی ڕەنج و جۆری بیر کردنەوەو ژیانی نەتەوەیە و هەر بۆیەکا ئەتوانین بڵێین کە ڕوخسارە تایبەتییەکانی هونەری میللی

کورد لە کات و جێگای مێژوویی دوور ودرێژ دا دروست بوون و ڕەنگیان لەباری دەروونی و ڕەوشتی شارستانی دا داوەتەوە ، بەوجۆرە چۆنیەتی هەست و هۆشی ژیانی نەتەوایەتی ڕۆڵێکی گەورەیان لە بنچینە دانانی ئەو هونەرەدا هەیە ـ هونەری میللی ـ بەگشتی ـ ئەوە دەردەخات کە نەتەوەیەک چۆن بیر لە جوانی ژیان و کردەوەی چاک دەکاتەوە .. هەموو ئەم ڕاستییانە ئاوازی ناخی ئەو بلیمەتییە دیاری دەکەن کە لە هونەری میللی دا هەستی پێ دەکرێت ، ئەم ئاوازەش ڕوخسارێکی تایبەتی ژیانی فەلسەفی وڕەوشتی نەتەوەیە ، نەک تەنها لە نێوان جیوگرافیا و مێژوو وکات و جێگەدا ، بەڵکو بە گشتی دوورییە سایکۆلۆجی و کۆمەڵایەتی ونیشمانییەکانیش دەرئەبڕێت ـ کۆک بوونی ئەم پانوراما دەرونییەش بۆ نەتەوەیەکی ڕەسەن پاش هەزاران ساڵی پەیوەندی و بەرهەمی هونەری و ئابووری و شارستانی و لە ئەنجامی گەلێک ـ پرۆسیسی ـ کولتورەوە لەدایک دەبێت



ئەمە وینەی پاشماوەیەکی ئەرکیولوجیە وبو چوار هەزار ساڵ لەمەوبەر .

دەروونی نەتەوایەتی، ڕوخساری نەتەوایەتی بەهێز تر ئەبن ، بە تایبەتی لەو کارو بەرهەمانەدا کە هونەرییین و پەیوەندییان بە کات و جێگای مێژووییەوە هەیە ، چونکە لە پێویستی ژیان و هەست و بیری ئەونەتەوەیەوە بەرهەم ئەهێنرێن ـ نموونەی بیر کردنەوەی ئیستێتیکی و پیوانەی برنجێتیئەو بەرهەمانەش بە هەمان شێوە تایبەتین وجیاوازن لەگەڵ پێوانەی کۆمەڵێکی تردا ،هەرچەندە کە ئەوانیش پێوانەی خۆیان بۆ برنجێتی هەبێت ـ ئەگەر بمانەوی ڕوخسارێکی گشتی هونەری میللی نەخشە بکێشین ئەتوانین بڵێین کە لە هونەری میللی دا ئەندامێکی نەتەوە ـ هونەرمەند ـ تاکە کەسایەتی خۆی دەکاتە نوێنەری گشتی هەست و بیروڕەوشت و نەتەوەکەی ، بە هەموو توانایەوە بەیاساکانی پاشەکەوتی کولتوری و فەرهەنگەکانییەوە کارەکەی خۆی بەجێ دەهێنێت ـ هونەری میللی هەموو نەخش و نیگارو شێوەو فۆرم و پەراوێزێکی کۆن و نوێ لە خۆی دا کۆدەکاتەوە،




نمونەی مافوریکی میدیەکان کە بو سەدەیپینجە

بژاریان دەکات ، دەیکاتە ڕوخساری نەتەوایەتی و تۆوی ـ ئەتنی و نیشتمانی ـ نەتەوە دەچێنێتەوە ، لەگەڵ ئەوەشدا کە هونەریمیللی ـ کولتورێکی جیهانییە ـ بەڵام هەموو نەتەوەیەکی خاوەن ڕوخساری ڕەسەن سیمای تایبەتی خۆی هەیە و لە هونەرە میللییەکەی دا بەئاشکرا دەردەکەوێت " سەرچاوەی : م.ئ. نیکراسۆفە ـ هونەری میللی وەکو بەشێک لە کولتور ـ موسکو ١٩٨٣ " بەبێ ورە کردن ئەتوانین بەهونەری میللی بلێین زمانی دووهەمی نەتەوە، هەر لەبەر ئەو ڕوخسارە جیهانی و نەتەوایەتییەی خۆی هونەرێکی میللی کە ڕەگ و ڕیشەی دێرینی خۆی داکوتابی زمانێکی نەتەوایەتی و جیهانییە لەهەمان کاتدا و خۆی لە هەموو شێوەو فۆرمە پلاستیکییەکانی دا دەنوێنێ ،هەر لەبەرئەوە خۆی لە هەموو پلەکانی شارستانییەتدا بە زیندویتی ئەپارێزیت و هەروەکو مۆزگەخانەیەکی پڕ لە نموونەو سەرچاوەی بیرو هەست و جوان پەرستی نەتەوایەتی ومرۆڤایەتی ـ لە کوردستان دا بێجگە لە پاشەکەوتە کولتورییەکانی تری هونەرو شارستانییەتی جیهانی کۆن ـ ئەنتیکە ـ زۆر شێوەی جیاوازی تری هونەری میللی خۆیان پاراستووە ، یەکێک لەو هونەرانەی کە ڕوخسارێکی زۆر تایبەتی نەتەوایەتی کورد لە هەموو مێژووی دا دەنەخشێنێت و بەبێ پساندن : جۆلایی و مافور چنینە، چ لە جیهانی کۆن و سەدەکانی ناوەڕاست و سەردەمی نوێشدا ـ بەپێی (ئ. م . مینیشا شیفلی ) : لەسەرەتای ساڵەکانی شەستی ئەم سەدەیەدا تەنها لەکوردستانی ئیران دا " چواردە هەزار " دەزگای مافوور چنین هەبووە ، کە ساڵی (پەنجا و حەوت هەزارو پێنجسەد) مەتری چوارگوشەی مافووری کوردی خراونەتە بازاڕەوە ( سەرچاوە: ئ .م.مینیشا شیفلی ـ کورد ـ زانست . موسکو١٩٨٤)ـزانایانی ڕۆژهەڵاتناسی مافوور زۆر لە مێژەهەستیان کردوە کە کوردستان بنکەیەکە لە دێرینترین سەرچاوەکانی مافووری ڕۆژهەڵاتی، هەربویەکا لە زۆر نەخشەی جوگرافی دا کە پەیوەندی بە

بازرگانییەوە هەبێ لەگەڵ ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست دا ناوی کوردستانیشیان بە گەورەیی دیاری کردوە، بەتایبەتی لە نەخشەی ئیتاڵی وئەڵمانی و بەریتانی و فەرەنساوییەکان دا، تا ئەمرۆش لە ئەنتیکەخانەی مافوری ڕۆژهەڵاتی هەندێک لە پایتەختی ئەو وڵاتانە نەخشەی لەو بابەتە هەڵواسراون - بێجگە لەوە لە موزگە خانەی تاران دا مافورەکانی کوردستان کۆنترین شێوەکانی مافوری ڕۆژهەڵاتی دەنوێنن وکەم و زۆر سەرنجی زانایان و هونەر پەروەرانی شارەزایان ڕاکێشاوە، بەتایبەتی زانا ئەڵمانی و فەرەنساوییەکان مافوری ناوچەی بەختیاری و لوڕستان و سنەو سەقز و .. هتد، مافوری وایان تیادایە کە بۆ سەدەی شانزەهەم دەگەڕێنەوە، بەلام کۆنترین مافوری کوردستان مافوری سەردەمی میدییەکانە کە ئەوەش بەڵگەیەکی مێژووییە بۆ ئەوەی کە هونەرێکی خاوەن ڕەگ و ڕیشەی زۆر دێرینە. بێگومان دوزینەوە ئەرکیۆلۆجییەکانی داهاتوو پتر ئەم ڕاستییە ئەسەلمێنن - سەرچاوەی مافوری ڕەگی خۆی لە کۆنترین پلەکانی ڕابوردوی دێرین دا هەیە. لە ڕیلیێفێکی (ئەرکیۆلۆجی) چوار هەزارساڵی پێش دا کە لە نزیک چیای بێستونەوە دوزراوەتەوە نموونەیەکی لەو بابەتە ئەبینین.

گرنگترین ناوچەی خوری - نایاب - لە کوردستان دا ناوچەی سنەو کرماشان و کورد شار و کەرکوک و بەدلیسن، سوپاس بۆ هونەرمەندی بەرز و لێزانینی تەکنەلۆجی - کیمیای ڕەنگ و چۆنیەتی چنین و داڕشتنی هونەری، مافوری کوردستان نوێنەرێکی بێ هاوتای هونەری میللی نەتەوەی کوردە، نەک هەر لە ناوچەی ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاست دا بەڵکو لە ئەوروپا و ئەمریکاش دا - بۆ ئەوەی لە جادوی کاریگەرێتی ئەو مافورانە بگەین ئەبێ پێشەکی ئەوە بزانین کە ئەو مافورانە تەنها - دیکۆر - نین، بەڵکو کۆکەرەوەی فەلسەفەی بینراو و ئەبستراکتی زۆربەی سەردەم و پلەکانی کولتورو شارستانیەتی کوردستانن، بێگومان جیاوازی هەیە لە نێوان کولتوری نووسرا و بینراودا، بەلام هەردووکی دوودیوی میدالیایەکن کە پێی ئەوترێ کولتوری نەتەوایەتی - مافوری کوردی لە ڕەنگ و ڕەنگی و ئەندازیاری و هونەری فۆرم و کێشەکانی دا دەربڕی ئاوازی پڕ لە - ریتم - و دیسپلین و پلاستیکیەتی مۆسیقا و گۆرانی و هەڵپەڕکێی نەتەوایەتی یە و بەلام بە شێوەیەکی گەردونی - تر، نەتەوەی کورد وەکو هەلبەستێکی دەرون پارێز ئارەزوو ئاواتەکانی بیری خۆی تیادا تومار کردون - هەروەک بڵێی نەخشەیەکبێت کە لە داهاتوو دا شار و دێهات و وڵاتی کوردستان بەوجۆرە هونەرسازی و نەخش و نیگار بکرێت، کەلەدوورەوە تەماشای بکەیت وەکو مافور بێتە بەرچاو - مافورەکانی کوردستان ئەبن بە چوار بەشی سەرەکییەوە یەکەمیان: نەباتییە: واتە نەخش و نیگارەکانی پتر گوڵ و گوڵزار و گەڵاو لاسک و چیمەن و درەخت و ... هتدن. دووهەمیان ئاژەڵین،




نمونەی مافورێکی میدیەکانە بو سەدەی پینجەم وشەشەمی پیش زایین ئەگەریتەوە.

واتە، پتر ئاژەڵیان تیادا نەخشکراوە، بەتایبەتی ئاسک و کەڵەکێوی و ئەسپ و پڵنگ و شێرو .. هتد.. سێهەمین: شێوەی مرۆڤ - ڕاوچی - دڵێری - جەنگ .. هتد چوارهەم: شێوەی

بو لاپەرە 40

# بەبۆنەی تێپەڕبوونی ساڵێک بەسەر کۆچی دوایی یەلماز گۆنای نەمر

## - باوکی گۆران -




**گۆنای :**
ئێمە ئەمانەوێ لە ولاتی خۆماندا لەسەر خاکی خۆمان بەزمانی خۆمان گۆرانی ئەوین و ئازادی بلێین

ساڵێک لەمەوبەر، لە بەرەبەیانی ڕۆژی نۆی ئەیلولی ڕەشدا، دوور لەخاکی ئەونیشتمانەی کە ئاوێتەی سەربەخۆبوون و یەکێتی و ئازادی بوو.. دڵی گەورەترین هونەرمەندی کورد لە لێدان کەوت - پایتەختی هونەر - شاری پاریس لە خورپەی ئەو مەرگە ناکاوە ڕاچڵەکی، ویژدانی زیندووی مرۆڤایەتی بەئاگاهاتەوە. ڕۆژنامەو ئاژانسی دەنگوباسەکان بە هەموو لایەکی جیهاندا بڵاویان کردەوە کە "یەکێک ! گەورەترین هونەرمەندەکانی چەرخی بیستەم لە ئاوارەیی دا دڵی لە لێدان کەوتە.) بەڵام لە هەموو لایەک پتر کۆستی دایکی گۆنای کەوت - کوردستان نیشتمانی داگیرکراوی باوەڕی نەدەکرد - بۆیەکا کرێکارو ئاوارەکانی کوردستان لە هەندەران بە پەشۆکاوییەوە ئەو ڕۆژەیان بردە سەر.. چۆن ئەبێ بمرێت..کێ ئەڵێ مردووە.. - ڕاست نیە! تەنانەت بۆ ئێوارەش کە ڕادیۆکان باسیان کرد هێشتا لە دڵی ئاوارە کوردەکاندا ئەو هەواڵە جێگەی نەدەبۆوە... ڕاستە کە گۆنای مرد، بەڵام باوەڕو "ڕێگە"ی نەتەوەکەی، هونەر و ئاواتەکانی خەباتی زیندوون و نامرن.. ئیتر هەر کرێکاری کورد بوو داخی دڵی خۆیان دەردەبڕی و ئەوەی شتێک پارەی هەبوو، هیواش هەبوو بە پیتاکە بەرەو پاریس کەوتنە ڕێ - هیچ نەبێ بۆ ئەوەی لە ناشتنەکەی دائامادە بن، بەبێ کەسی، لەدوور ولاتیدا نەخرێتە گۆڕەوە - ١٣ی مانگ، بەیانی ناشتنەکەی، پاریس پڕ بوو بوو لە کوردی کارگەر و ئاوارە و بە پەشۆکاوی و تەکانەوە خۆیان بەرەو بارەگای ئینیستیتوی کوردی ئەکشان - لەبەر لاشەکەی دا یەک بەدوای یەکدا بەدڵ ئەگریان و کرنووشیان ئەبرد - گەورە پیاوانی ڕۆشنبیری و ڕامیاری کۆماری فەرەنساش ڕێزیان گرتبوو، یەک بە یەک سەری ڕێزیان دادەنەواند لەبەرامبەر لاشەی ئەو کوردە بنبمەتەدا - کەژاوەی تەرمی گۆنای بەرەو ناودارترین گۆڕستانی فەرەنسا و جیهان کەوتە ڕێ - گۆڕستانی پێر لاشیس - چاوەڕوانی لاشەی کوردێکی مەزن بوو، ئەو کوردەی کە سەروماڵ و بیر و هونەرەکەی بەخشی لە پێناوی ئازادی گەل و نیشتمانەکەی دا.. ئەو مرۆڤەی کە تەنها چل و حەوت ساڵ ژیا، بەڵام بەژیان و هونەرەکەی شۆڕشێکی بەرپا کردو لەسەر تراجیدیای چەوساندنەوەی نەتەوەکەی جیهانی بەئاگا هێنایەوە.. لە

کوردستان لەدایک بوو، لەناو تەلبەندی هەژاری و چەوساندنەوەو زیندانی داگیرکەرانا گەورەبوو، بەخەباتی بێ وچانی بووە بە پاڵەوانێکی خاک و نەتەوەکەی، بەڵام لە پاریس مرد.. مردنێکی چاوەڕوان نەکراو.. ڕۆژنامەیەک لە پاریس نووسیبووی: کێ یەلماز گۆنای کوشت؟ باڵوێزی تورکیا بە ناوی جەنەراڵە گێلەکانی ئەنقەرەوە ناڕەزایی ولاتەکەی خۆی دەربڕیبوو لەبەردەم میریی فەرەنسادا، کە کوردێکی وا لە ولاتی ئەوان بە پەناهەندە وەرگیراوە - تورکیای ئەندامی ناتۆ و فەرەنسای دەستە خوشکی لەهەمان پەیمانی ئیمپریالیستی دا چۆن گەیشتوونەتە ئەوەی کە

خۆیان لە گۆنای – ئەو کوردە ترسناکە – ڕزگار بکەن ؟ یشتا شتێکەو تەواو ئاشکرا نەبووە – کێ باوەڕی ئەکرد کە کچە هەژارێکی ڕازایی ببێتە دایکی یەکێک لە مەزنترین مرۆڤەکانی کوردستان و جیهان – کەس باوەڕی نەدەکرد، تەنانەت کە بڕیاریش درابوو گۆنای لەگۆڕستانی مەزنەکانی مێژوو دا بنێژرێت هەندێک کەس و لایەنی کۆنەپەرستی ناوچەکەو جیهان پێیان ناخۆش بوو ، تەنانەت لە مەرگەکەشیدا وازیان لێ نەدەهێنا – برسێتی هەژاری ،ئاوارەیی، زیندان و ئەشکەنجە مێردەزمەی سەرسنگی خۆی و نەتەوەکەی بوون، هەر لەبەر ئەوە خۆی و هونەرەکەی بۆ نەهێشتنی تۆوی ئەو دەردانە ئاڕاستە کردبوو ، بە پێنووس و کامێرا نەخشەی بۆ داهاتووی پڕ لەئازادی و شادی و بەختەوەری گەل و نیشتمانەکەی ئەکێشا ، بەبێ سڵ کردن لە داگیر کەرانی دڕندە !

کوردستان پاش لە نیو سەدە داگیر کردن و دابەشکردنی ئیمپریالیستی .. پاش هەزاران – ژان و بەربەرەکانی و باج دانی خوێن وفرمێسک و چەوساندنەوەی نەتەوایەتی بێ وینە ..پاش دەرباز بوون لە چەندین جاری – گینوسیت – و هەوڵی لەناوبردنی تەواوییەوە، لەلایەن دڕندەترین هێزی ( داگیر کردن و کۆڵۆنیالیز – می ) تایبەت بە خواروی ڕۆژئاوای ئاسیای دواکەوتووەوە – هاوارێکی مێژوویی خۆی وەکو هەورە بروسکە بە جیهان دا بڵاو کردەوە – هاوارەکە سەرنج ڕاکیش و بێ وێنە بووبوو مرۆڤایەتی پێشکەوتنخواز بەئاگا هێنانەوەبوو لەسە ریاری چەوساندنەوەی نەتەوەیەکی بیست و پێنج ملیۆنی لە سەدەی بیستەم دا .. ئەو هاوارە فلیمەکانی گۆنای بوون ، زۆر کەس لەسەرەتاوە باوەڕیان نەدەکرد کەشتی واهەبێ و بکرێت و لەلایەن ئەو میریانەشەوە کە هەموویان ئەندامی نەتەوەیەکگرتوەکانن و بڕیارەکانی مافی چارەنووسی مرۆڤ و گەلانیان مۆر کردووە – چۆن ئەبێ لە کۆتایی سەدەی بیستەم دا لەناوەڕاستی جیهان داو لە سەر سنوری خواروی ئەورووپا بەو جۆرە ڕەگەز پەرستانەو دژوارە لەگەڵ نەتەوەیەکدا ڕەفتار بکرێت– نەتەوەیەک بەو شێوەیە لە هەموو هۆیەکی پێشکەوتن و ئاشتی و ئازادی بی بەری بکرێت! داگیر کەرانی کوردستان ملیونەها دولاریان بۆ خەفەکردنی کێشەی کوردو شاردنەوەی دەنگ و ڕەنگی لە جیهان داخەرج کردبوو، زۆر بەختیار بوون بەوەی کەکەس لە جیهاندا ئاگای لەوەنیە، کە ئەمان لەژێرەوە چی ئەکەن ، بەڵام فلیمەکانی گۆنای بەتایبەتی فلیمی ( ڕێگا – یۆڵ ) بە هەموو هێزێکی مێژوویی و مرۆڤایەتی دڵتەزێنەوە ئەوەی ئاشکراکردو – لەبنی هەمانەکەی دان – و ڕای جیهانی لە ڕاستی گەیشت و بۆ یەکەم جار هەستی بەوە کرد کە تراجیدیا و کێشەی نەتەوە و نیشتمانێکی لێ ئاشکرا بوو ، کە هەتا ئێستا لێی شاردرابۆوە ، کە لەڕاستیدا



ئێمە دەخوازین لەژێر ئالای خۆمان دا بە سەربەستی و سەربەخۆیی بژین .

یەکێکە لە گەورەترین کارەساتەکانی چەوساندنەوەی نەتەوایەتی هاوچەرخ – پاش ئەوەی جیهان لەوە گەیشت– کەئەو هونەرمەندە چۆن و بەچ بارو باوەڕێکەوە لە زیندانی داگیرکەرەکانیەوە توانیویێتی ئەوفلیمانە

بو لاپەرە 39

# بە بونەی یادی چل ساڵەی کۆماری دیموکراتی کوردستانەوە (مەهاباد) ماموستای خەباتگێڕ کەریمی حوسامی بو پەیامنێری (پێشەنگ) دەدوێ



پەیامنیری پێشەنگ لەچاوپێکەوتنێکا گفتوگۆیەکی تایبەتی لەگەڵ بەڕێز مامۆستای خەباتگێڕ (کەریمی حوسامی ) کردووە سەبارەت بە یادی چل ساڵەی دامەزراندنی کۆماری دیموکراتی کوردستان . لێرەدا بەنیازی هاوبەشی کردن لەو یادکردنەوە پیرۆزەو بۆ ڕووناکی خستنە سەر هەندێک لایەنی چۆنیەتی دامەزراندن و بەسەرهات و تێکچوونی ئەو کۆمارە ساوایەی کوردستان دەقی ئەو گفتوگۆیە دەخەینە بەرچاوی خوێنەرانی (پێشەنگ )زۆریش سوپاسی مامۆستا حوسامی دەکەین کە بەسنگێکی فراوانەوە پێشوازی لە پرسیارەکان کردووەو وەڵامی داونەتەوە .

پێشەنگ

---

**پ/ ئایا ئەتوانن کورتەیەکمان دەربارەی چۆنیەتی دامەزراندنی کۆماریدیموکراتی کوردستان بۆ باس بکەن، بەتایبەتی لەڕوانگەی بیرەوەرییەکانی خۆتانەوە ؟.**

– دامەزراندنی کۆماری دیموکراتیکوردستان (مەهاباد ) بەلای منەوە دەکرێ بەسەرەتای مێژووی نوێی خەباتی ڕزگاریخوازی گەلی کورد دابنرێ . چونکە بۆ هەوەڵ جارە لە مێژووی کوردستاندا بە تایبەت لەسەدەی دواییدا گەلی کوردلە بەشێکی نیشتمانەکەیدا دەسەڵاتی سیاسی دەگرێتە دەست و چارەنووسی خۆی دیاری دەکا .

ڕاستە کۆماری دیموکراتی کوردستان لە بەشێکی بچووکی نیشتمانی دابەشکراویکوردا پێکهات ، بەڵام ئەم ئەستێرەیە تاڕادەیەکی زۆر تیشکی هاویشتە سەربەشەکانی دیکەی کوردستان و گەلی کوردی جوولاند . بەشداری براکوردەکان و هاتنیان بۆ مەڵبەندی کۆماری (مەهاباد ) و هاوکاریان، ئەم ڕاستیە دەسەلمێنێ کە کۆماری دیموکراتی کوردستان تەنیا هی کوردەکانی کوردستانی ناوەندیەبوو بەڵکو کۆماری ساواو دەسەڵاتی سیاسی کورد و کوردستان بوو .

کۆماری دیموکراتی کوردستان لە هەل و مەرجێکدا دامەزرا کە بەڕووخانی ڕێژێمی ڕەشی ڕەزا شاو ڕەوینی تەم ومژی دیکتاتوری لەئێران و هاتنی ئوردووی سوور بۆمەڵبەندی ئازەربایجان و کوردستان کەخەڵک بەرزی ڕووسی بە ( مەلائیکەی چاوسوور) ناودەبرد شنەبای ئازادی هەموو ئێرانی گرتبووەو کوردیش دەرفەتی هێناو کەوتە خۆ و لەبەشێکی نیشتمانەکەیدا شوێنەواری حکوومەتی زوڵم و زۆری ڕەشکردەوەو کاروباری وڵاتی خۆی گرتە دەست .

کۆماری کوردستان لە کاتێکدا دامەزرا کە گەلی کورد لەڕیژێمی ڕەشی ڕەزا شادا لەوپەڕی کەسادی و بێبەشی و ژێر دەستیدا دەتلایەوە . هەموو داب و شوێن و نەریتی نەتەوایەتی کورد کوێر کرابۆوە . بەتەواوی مافی ڕەوای خۆی بووکەڕاپەڕێ و زنجیری کۆیلەیەتی بپچڕێنی و خۆی چارەنووسی خۆی بەڕێوەبەرێ .

پێویستە ئەوەش بڵێین کۆمەڵەی ژ.ک بەردی بناخەی ئەم کۆمارەی دامەزراندبوو ولەماوەی

٣سێ سالڕا هەستی نەتەوایەتی بە جۆرێک لەدڵی هەموو کوردێک دا بزواندبوو کە تەنانەت ئەو دەرەبەگانەی لەهەموو ژیانیان دا خزمەتکاری ڕژێمی پەهلەوی بوون . ئەوانیش لە کردەوەو ئاکاری ڕابردوویان تەریق ببونەوەو هاتبوونە ڕیزی جووڵانەوە و ئاخرەکەشی بە گوێرەی جەوهەر و خاسیەتی چینایەتی خۆیان هەر ئەوان پشتیان لەکۆماری دیموکراتی کوردستان کردو لەپشتەوەرا خەنجەریان لێدا .

دامەزراندنی کۆماری دیموکراتی کوردستان نابێ بە کارەساتێکی دەستکردو کتوپڕ بزانین .

هەر لەساڵی ١٩٤٣ وە کەژەنەراڵ هۆشمەندی هەوشار هاتە مەهابادو لەلایەن خەڵکەوە بە تەماتەو هێلکەو بەردەباران پێشوازی لێ کرا و نەیتوانی سەعاتێک لە مەهاباد بمێنێتەوە، ئەم هەستە شۆڕشگێڕییە لە خەڵکدا پێک هاتبوو کە ئیتر چیدیکە نابێ بێگانە حکوومەت بەسەر کوردستان دا بکاو کورد دەبێ خۆی چارەنووسی خۆی بگرێتە دەست، لەڕاستی دا هەر ئەو دەم گەرای پێکهێنانی هێزی چەکداری کورد دامەزرابوو. زۆر لەئەندامانی بەکاری تێکۆشەری کۆمەڵە نەزم و ڕێک وپێکی نێو شارو تەنانەت گوندەکانی مەڵبەندی موکریانیان گرتبوە ئەستۆ .

ئەوانە لیباسی نیزامی زۆر جوانیان کردبووە بەرو لە نێو خەڵکدا دیار بوون.

لەم سەر و بەندەدا هێشتا هێندێ پاسەوانی حکوومەتی تاران لە مهاباد مابوون، مانگی مای ١٩٤٣ڕۆژی‌پاش وەدەرنانی ژەنەراڵی هۆشمەندی هەوشار خەڵک شارەوانیان پەلاماردا و ئاخرین شوێنەواری دەسەڵاتی ڕەشی چەند ساڵەی حکوومەتی تارانیان لەمەهابادکۆتایی پێ هێنا . هەوەڵین شەهیدی ڕێگای ڕزگاری کوردستان لەگرتنی شارەوانی مەهابادداگیانی خۆی فیدا کرد .

پاشدامەزرانی حیزبی دیموکراتی کوردستانی ئێران ١٦/ئاب/١٩٤٥ ئیتر دەبوایە دەسەڵاتی سیاسی کورد شکڵێکی ڕەسمی و ڕێک و پێک بەخۆوە بگرێ و نشانی خۆی لەکۆمەڵی کوردەواری دا تۆماربکاو نیشان بدا . بۆ ئەم کارە دووهەنگاوی گرنگ و بنچینەیی هاوێژران یەکەم سروودی (ئەی ڕەقیب) بە سروودی نەتەوەیی و نیشتمانی کورد پەسەند کرا .

دووهەم ئاڵای کوردستان و نشانی کۆماری پەسەند کران .

ئاڵای کوردستان سووروسپی و سەوز لەسەر سپییەکە لە نێوە ڕاست ڕۆژ لەگەڵ دێتەدەرەوە و ئەم لاولای دووگوڵە گەنم و ژێرەوەی نووکە قەڵەمێک ئاڵای کوردستانی دەڕازاندەوە.

پێویستە ئەم مەبەستە وەبیرخەمەوە ئەوانەی کە ئەمڕۆ وشەی "خودموختاری" بە کۆماری کوردستانەوە دەنووسێنن و وشەی " دیموکراتی " لێدەسڕنەوە لەلایەک هیچ ئاگایان لە دروشم و ئامانج و ڕێبازی کۆماری دیموکراتی کوردستان ساڵی١٩٤٦نیەو لەلایەکی دیکەشەوە لە ترسی بۆرژوای چەوسێنەری نەتەوەی دەسەڵاتدار ناوێرن واقعیەتی جوڵانەوەی ڕزگاریخوازی ساڵەکانی ١٩٤٥ - ١٩٤٦کوردستانی ئێران نیشان بدەن . هێندێ هێزی دیموکرات و پێشکەوتنخوازیش جارو بار وەکی فارسدەڵی " بۆخاڵی نەبوونی عەریضە) ، باسی دووی ڕێبەندان و یادی پێشەوا قازی محمددەکەنەوە ئەوانیش بۆ ئەوەی گەلی کورد بیر لە کۆمارو دیاریکردنی چارەنووسەکا، لە جیاتی جارێک وشەی " خودموختاری " دەجاری دووپات دەکەنەوە. نەخێر کۆماری دیموکراتی کوردستان لە مەهاباد کۆمارێکی دیموکراتبوو ئامانجیشی دیاریکردنی چارەنووسی گەلی کورد بەدەستی خۆ بوو.

ئەمە باسێکی درێژەو بەدرێژی لە جێگای‌خۆیدا باسی دەکرێ .

پاشبەستنی کۆنگرەی حیزبی دیموکرات **٢٤ی ئۆکتوبری ١٩٤٥** ڕۆژی ١٧ای دسامبر لەڕێ وڕەسمێکی تایبەتی و لەنێو جموجۆڵ و هەستی ئاورینی کۆمەڵانی خەڵکدا کە لەسەرانسەری کوردستانەوە ڕوویان کردبووە مەهاباد ئاڵای شێروخورشید نشانی حکوومەتی ئێران لەسەر بانی عەدلیەی مەهاباد داکێشرا خوارو،ئاڵای سێ ڕەنگی کوردستان کە سوورەکە سەرکەوتبوو

له جیگای هه‌ڵکرا . باسی ڕێ و ڕه‌سمی ئه‌وڕۆژه و خۆشی و شادی خه‌ڵک کتێبێکی ته‌واوی ده‌وێ .

ته‌نیا ئه‌وه‌نده به‌سه که بڵێین "خـود موختاری " ئاڵاو نیشانی وڵاته‌که ناتوانێ بگۆڕێ و ئاڵاو نیشانی تایبه‌تی و سـروودی نه‌ته‌وایه‌تی و نیشتمانی خۆی هه‌بێ.یه‌کێک له‌م تاوانانه‌ی که پێشه‌وا قازی محه‌مه‌دی پێ مه‌حکووم به مه‌رگ کرابوو گۆڕینی ئاڵای ئێران بوو .



له ۱۷ای دیسامبه‌ره‌وه له‌سه‌رانسه‌ری کوردستانی ناوه‌ندی له شارو گوند شایی و دیلان و هه‌ڵپه‌رکێ بوو . شاعیره‌کان و شایه‌ره کان شیعرو گۆرانیان بۆ ئاڵای کوردستان ته‌رخان کردبوو . هه‌ژار شاعیری کۆماری مه‌هاباد به‌بۆنه‌ی هه‌ڵکردنی ئاڵاوه به‌سته شیعرێکی دانابوو که ئه‌م دوو شیعره‌م له‌بیر ماوه که ده‌ڵێ :

**" داری ئاڵاکه‌م وه‌کوو چقڵه له‌بۆ چاوی عه‌دوو"**
**" هه‌رکه‌سێ خۆشی نه‌وێ، ڕه‌ببی وه‌به‌رخه‌نجه‌رکه‌وێ"**
**" ڕێی نه‌جاتمانه په‌نا بۆ ئیتحادی شوره‌وی"**
**" سورمه‌یه بۆ چاوی ئێمه خاک وخۆڵی مه‌سکه‌وی"**

دوا به‌دوای ئه‌و له بۆکان و نه‌غه‌ده‌وشنۆو خانێ ئاڵای پیرۆزی کوردستان هه‌ڵکرا و له‌سه‌ر بانی باره‌گای کومیته‌کانی حیزبی ده‌شه‌کاوه .

له به‌فرانباره‌وه له سه‌رانسه‌ری کوردستان خه‌ڵک ڕووی ده‌کرده مه‌هاباد و به قه‌ولی شاعیر مه‌هاباد ببوه قیبله‌گای کوردان. ڕێ و ڕه‌سمی دووی ڕێبه‌ندان و دانانی ده‌وڵه‌تی کۆماری دیموکراتی کوردستان و ناوی وه‌زیران و هه‌نگاوه‌کانی کۆماری دیموکراتی کوردستان له‌زۆر شوێن و نووسین دا باسیان کراوه‌و پێویست به دووپاته کردنه‌وه‌ی مناکا .

**پ ۲- ئایا هیچ بیره‌وه‌رییه‌کی تایبه‌تیتان له‌سه‌ر شه‌خسیه‌تی پێشه‌وای نه‌مری کۆمار له‌یاد ماوه - ڕاده‌ی تێگه‌یشتنی ڕامیاری و شارستانی - نووسینه‌کانی ، و هه‌رچییه‌کی ترکه ئه‌یزانن؟.**

وه‌لام : پێشه‌وا قازی محه‌مه‌د ڕه‌هه‌ق ئه‌م پله و پایه‌ی لێ ده‌وه‌شاوه و له‌و سه‌ره‌به‌نده‌ی ژیانی سیاسی و کۆمه‌لایه‌تی کوردستاندا که‌س له‌پێشه‌وا زاناترو هه‌ڵکه‌وتووتر و له‌خۆ بوردووتر نه‌بوو پێشه‌وا شه‌خسیه‌تێکی مه‌زن و خاوه‌ن نفـوذ و پرستیژ بوو . له‌سه‌ره‌تای تێکچونی ڕێژیمی ڕه‌شی ڕه‌زا شادا بۆ پاراستنی شار و چه‌کدار کردنی خه‌ڵکی شار بۆ دیفاع له‌به‌رامبه‌ر تالان و بڕۆی هێندێ عاشیره‌تی کوردا نه‌خشی گه‌وره‌ی هه‌بوو .

پێشه‌وا پیاوێکی ئازاو نه‌ترس بوو . له بیرمه ڕۆژێک خه‌به‌ریان هێنا که له‌میاندواو کوردو عه‌جه‌م له‌به‌رامبه‌ر یه‌ک وه‌ستاون و له‌وانه‌یه شه‌ڕێکی خوێناوی ساز بێ . پێشه‌وا له‌باره‌گای حیزب هاته‌ده‌ر و به‌تاقی ته‌نێ له‌گه‌ڵ پیاوێک سواری ترومبێل بوو به‌ره‌و میانداو . خه‌به‌ریان به‌حاجی بابه شێخ دا که پێشه‌وا به‌ته‌نیا بۆمیانداو ڕۆیشت .گوتبووی: جیگای ترس نیه .حه‌زه‌رات "مه‌به‌ستی ڕووسه‌کان" بوو، له‌وێن و ناهێڵن ته‌قه بکرێ . پێشه‌وا گه‌یشتبووه میانداو و له‌شکری هه‌ردووک لایانی بلاوه پێکردبوو .

پێشه‌وا به‌زمانه‌کانی ئینگلیزی و فه‌ره‌نسه یی و ڕووسی و فارسی و عه‌ره‌بی قسه‌ی ده‌کرد و یه‌کجار زۆر له‌سه‌رخۆو نه‌رم و قسه خۆش بوو .

کاتێک قه‌ره‌نی ئاغای مامه‌ش مردبوو ،پێشه‌وا بۆ سه‌ره خۆشی ده‌چوه په‌سوێ لاجانی مامه‌شان ، له‌نه‌غه‌ده بۆ نانی نیوه‌ڕۆ لای دا . پێشوازییه - کی گه‌رمی لێکرا . سه‌رکۆمار بوو ده‌چووه‌سه‌ره

خۆشی سەرەک عاشیرەتێک کەدژی کۆماری و سەر بە حکومەتی تاران بوو، بەلاّم تەنیا دلّشادی رەسولّی و ئەفسەرێکی دیکەی لەگەلّی بوو. لە کۆمیتەی نەغەدە پێشنیار کرا هێندێ قۆلّ سوور و پێشمەرگە لەگەلّ خۆ بەرێ، لەوەلاّمداگوتی: " من دەچمە سەرە خۆشی خۆ ناچمەشەر"!

ڕاستییەکەی تائێستا هیچ نووسراوێکی پێشەوا بلاو نەبۆتەوە. بەلاّم ئەوەندەی من بزانم کتێبخانەیەکی لەڕادەبەدەر گەورەو دەولّەمەندی هەبوو. چی تیدایەو چی لیّهاتووە دوا ڕۆژ دەری دەخات.

**پ ٣: ئەو وانانە چین و کامانەن کە بزووتنەوەی ئازادیخوازی ئەمڕۆی کوردستان ئەبێ لە پەند و مێژووی کۆماری دیموکراتی کوردستان یوەربگیرێت؟**

**وەلاّم:** کۆماری دیموکراتی کوردستان تاقیکردنەوەی دەولّەمەند و بەنرخی بۆ جولاّنەوەی ڕزگاریخوازی کورد بەجێ هێشتووە.

بەلای منەوە وەزعی جوغرافیایی و سروشتی کۆمەلاّیەتی کوردستان ئەوە دەسەلمێنێ کەهێزە ڕزگاریخوازەکانی کوردستان، هەتا بتوانن لە هێزە ئازادیخوازەکانی ولاّتانی دراوسێ نزیک بن و دۆستایەتیان بکەن.

- هێزە ڕزگاریخوازەکانی کوردستان نابێ بە هیچ جۆرفریوی دام و دەزگای حکوومەتە شۆڤێنیست و کۆنەپەرستەکانی داگیر کەری کوردستان بخون.

- حیزب و ڕێکخراوە دیموکرات و نیشتمانیەکانی کوردستان پێویستە زەحمەتکێش وهەژار و چین و تاقم و توێژی چەوساوەی کورد بە پالّپشتی باوەڕ پێکراو بزانن و بڕوا بە دەرەبەگ و کۆنەپەرست و بۆرژوای ڕاڕای کورد نەکەن. هەرئەوەندە ڕوویان بدەنێ کەکەلّکیان لێ وەربگرن.

بزوتنەوەی ڕزگاریخوازی ئەمڕۆیکوردستان پێویستە بکرێتە یەک و بەوەستایی و لێ زانی لە چوار چێوەی سیاسەتێکی پێشکەوتنخوازانەی کوردستانی دا بنکەیەکی کوردستانی دابمەزرێ و مەسەلەی کورد لە نێو کۆڕو کۆمەلّەکانی جیهانی دا بێنێتە گۆڕێ.

بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی کورد بەر لەهەموو شت دەبێ پالّ وەهێزی لەبن نەهاتووی گەلی کورد بدا و هەستی ڕزگاریخوازی لەناخی هەموو تاکێکی کوردا بەهێز بکا.

**پ ٤ :-**

**هۆی ڕاستەقینەی ڕووخاندنی کۆمار چیبوو، چ هێزێکی ناو خۆ و دەرەوە تاوانباربوون؟**

**وەلاّم:-**

لام وایە ناکرێ باسی هۆی ڕاستەقینەی ڕووخانی کۆماری دیموکراتی کوردستان بکەین. واتەپرسیارەکە بەم شێوەیە وەلاّم دانەوەیدژوار دەبێ.

گەلێک هۆ بوون بە سەبەبی ڕووخانیکۆماری ساوای کوردستان کە هەر یەک بە نۆرەی خۆیان کەم یا زۆر کاریان کردۆتە سەر وەزع بەگشتی وەزعێکی ئەوتۆیان پێک هێنا کە کۆماری کوردستان نەیتوانی خۆ بگرێ.

ڕوونکردنەوەی هۆیەکانی ڕووخانی کۆماری دیموکراتی کوردستان باسێکی دوور ودرێژ و لێکدانەوەیەکی قوولّی دەوێ.

بەر لە هەموو شتهەل و مەرجی دواکەوتووی ئابووری و فەرهەنگی و کۆمەلاّیەتی ئەودەمی کوردەواری دەبێ بە یەکێک لە هۆیە گرنگەکانی ڕووخانی مەهاباد بزانین.

- خۆتێ خزاندنی دەرەبەگ و ئاغا و خاینەکان لە دەزگای ریبەرایەتی حیزب و حکوومەت، هەنگاو نەنان بۆ کەم کردنەوەی زولّم وزۆری دەرەبەگان کە وەرزێر و زەحمەتکێشانی گوندی گۆڕانێکی قوولّی کۆمەلاّیەتیان تێدا بەدی نەدەکرد. زەحمەتکێشانی کورد لەدەست ژاندارمەی ڕەزا خان ڕزگار ببون، بەلاّم هێشتا دیل و ژێر دەست و چەوساوەی دەرەبەگ و خاوەن ملّکی کورد بوون.

- تەنگەبەر کردنی جولاّنەوە بە چوارچێوەی کوردستانی ناوەندی و جیا بوونەوەی بەشی خارووی کوردستان وەک سەقز و بانە و کرماشان و هەورامان و مەریوان و تیلەکۆ و تەنانەت لورستانیش یەکێ دیکە لە هۆیەکانی کزبوونی کۆماری کوردستان بوون.

– تەمەنی کورتی کۆمار کە نەیتوانی کادر و کار مەندی لێزان و تێگەیشتوو بەبیروباوەڕ پەروەردە بکاو بێجگە لەوە جوولانەوەی کوردستانی موکریان وەک هەموو جوولانەوەیەکی دیکەی گەلی کورد خاوەنی ئیدە ئولۆژی شۆرشگێری نەبوو .

– سیاسەتی بەرگری و دەست ڕاگرتن لە لێدانی دوژمن لە کاتێکا کە دوژمن زۆر کزو لاواز بوو، دەکرا لە ناوچەی بانەو سەقز و سەر دەشت تەنگی پێ هەڵ بچنن و دەسەلاتی کۆمار لەم ناوچانەش دا سەقام گرتوو بکەن .

– نەبوونی قاطعیەت و لێبراوی لە ئاست دوژمنانی نێو خۆو ساوەساو لەگەڵ جاسوس و خاینان و سزا نەدانیان .

ئەمانەو زۆر وردە شتی تر هۆی نێو خۆی شکانی جوولانەوە و ڕووخانی کۆماری دیموکراتی کوردستان بوون . دیارە هۆی دەرەوەش بێ تەئسیر نەبوون . کشانەوەی ئۆردووی سووری سۆڤیێتی لە ئێران و دوا بەدوای ئەو پەلاماری لەشکری ئیران کە لەلایەن ئینگلیزو ئەمریکا پشتیوانی دەکرا دەکرێ بە هۆی دەرەوەیان دابنێین .

مێژوو نووسەکانی بۆرژوایی و گەلێک جار ناسیونالیستەکانی کورد یەکێتی سۆڤیێت تاوانبار دەکەن کە گۆیا کۆماری کوردستانی بەجێ هێشتووەو وازی لێ هێناوە .

بەم پێ یەو بە گوێرەی ئەم بیرو ڕایە دەبوایە ئۆردووی سوور بە پێچەوانەی پەیمان و قەول وقەراری نێو نەتەوەیی لە ئێراندا مابایەوە و سەربازی سۆڤیێتی بۆ پاریزگاری کۆماری کورد شەڕی کردبایە . ئەوە لەکاتێکا کە هێزی بەرگری کوردستان ، بێجگە لە بارزانییەکان ، چەکی دانابوو، ڕێبەرانی کۆماری مەهاباد بڕیاری شەڕ نەکردنیان دابوو .

بەلای منەوە ئەم بۆ چوونە بێجگە لەوە لە باری زانستی یەوە ڕاست نیە . بە مەبەستێکی دیکەش بڵاو دەکرێتەوە ، ئەویش ناحەز کردنی یەکێتی سۆڤیێتی لەبەرچاوی زەحمەتکێشانی کورد کە قەلایەکی بێ فایدەو پەلەقاژەیەکی سەر نەکەوتووە .

**پ ٥– وەکو نیشتمانپەروەرێکی دڵسۆز و تێکۆشەر بۆ مافی (٢٥) ملیۆن مرۆڤی کوردی چەوساوە – چۆن باری ئەمڕۆی بزووتنەوەی ئازادیخوازی کوردستان ئەبینن و هۆی چییەکە ژمارەیەکی کەمی گەلی کورد بەشداری خەبات دەکات و بۆ تا ئەمڕۆ سەرەڕای خەباتی دوورو درێژی بە هیچ جۆرە سەرکەوتنێک نەگەیشتووە .**

وەڵام :–

بەلای منەوە بزووتنەوەی ڕزگاریخوازی کورد تووشی قەیران و پەشێوی بووە . ڕەنگە بەکار هێنانی ئەم وشەو زاراوەیە بەدڵی زۆر کەس نەبێ ، بەلام بەداخەوە واقعیەتە .

لەدنیای ئەمڕۆدا کە گەل و نەتەوەی حەفتا هەزار کەسی سەربەخۆیی وەردەگرن ، نەتەوەی ٢٥ ملیۆنی ئێمە نەک هەر بێ بەش و ژێر دەستو چەوساوەیە ، تەنانەت کەس باسیشی ناکا .

ڕەنگە ڕێبەرانی کورد بەوە خۆیان دڵخۆش بکەن کە جاروبار لە ڕۆژنامە و نووسراوەکانیاندا باسی سەفەر و ئاخافتنێکی خۆیان دەکەن ، بەلام بەداخەوە ئەمانە ناتوانن برینی تەشنای کورد ساڕێژ بکەن .

من قەیران و پەشێوی مەسەلەی کورد لە لەتلەت بوون و زۆری حیزب و ڕێکخراوە کوردییەکاندا دەبینم کە لەبەر کێشەو ناکۆکی نێو خۆیان ناپرژێنە سەر مەسەلەی بنچینەیی میللەتەکەیان .

هێشتا نەگەیشتوونە ئەم ڕادەی دڵسوزیو هەستکردن بە بەرپرسکە بزانن گەلی کورد چەندە لە کاروانی پێشکەوتن و پێگەیشتن بەجێ ماوە و کوردستانی دابەشکراو بەجنگ حکوومەتانی شوفینییەوە دەتلیتەوە .

ئەم هەموو حیزبانە کە هەموو خۆیان بە ڕێبەر و " طلیعە "ی میللەتی کورد دەزانن هێشتا نەیانتوانیوە مەسەلەی کورد وەک مەسەلەی نەتەوەیەکی ٢٥ ملیۆنی کە مافی دیاریکردنی چارەنووسی هەیە لە سیاسەتی خۆیاندا و لە مەیدانی جیهانیدا بێننە

**بو لاپەرە 39**

# بەیادی کۆچی دوایی مامۆستا علاءالدین سجادی یەوە

هەژار موکریانی

دۆستێکی زۆرخوشەویستم ڕۆی لێ ناوم،چونکە چەند ساڵ لە بەغدایە دەگەڵ عەلاءالدین ژیاوم، زۆر لەنێزیکەوە دیومە وبە هەموباران ناسیومە بەیادی کۆچیەکجاری کە ئەم بەینانە ڕوی داوە، کورتە وتارێک بنوسم.

من گەرەکمە نوسینەکەم تایبەتی بە تاکێک نەبێ، دەگەڵ ڕێز لە نوسەرگرتن سەدکۆنەی ئەوانەش بکەم کە بە دوڕبان دەپێون وهەرتاوێ جۆرێ داخێون.

جارێک لە گووارێ "هەولێر" کە لە هەولێری دەردەچو ، خەبەرۆکێکم نوسیبو . کەچی لە بەر بەختی کەچم دەچاپ داندا تێک درابوو، سەر و قونی لێک درابوو، کەس تام ومێژەی لێنەکرد، کورتە باسەکەش ئەمە بو :"ڕۆژێک سەیری دوکانێکی بەغدام دەکرد، چەقەڵێکی مۆمیایی کراوی لێ داندرابو. لەژێر قاچیەوە نوسرابو (بیست وپێنج دیناری تەواو).

من سەری زمانی خۆم گەست ،هات بەدڵمی.هەیاران ئەم مام چەقەڵە موحتەرەمە ئاخۆ دەبێ بە زیندی سەر شاعیر،نوسەر،هونەرمەندێکی کورد بو بێ. لەژیانیدا لە برسان ولە ترسان ئۆقرەی نەبیوبێ وئێستا کێ لاشەی مردگی بەم دەردومەفسەرە ڕچوابێ؟ کێ ئەزانێ ؟؟

هەزار دانە بە زینوویی فلسێ ناژین کەچی یەکێک بە مردوویی بایی بیست وپێنج دینارە!!

بەخوای سەیرە.

لەدرێژایی مێژوی پرنەگبەتی کوردا ،هەر شاعیر،هەر هونەرمەندێک لەناو کوردا،هەلکەوتبێ و هونەرەکەی بەزمانەکەی خۆی دانابێ وشیعری بە کوردی دانابێ ، هیچکەس ئاوڕی وێ نەداوە، بەسوکی، تەماشای کراوە، بویتە مەسەل:هەرکەس پینەی پێوە دیاربێ، جلکی شر وبەتیقوڵ بێ ، لەشی چڵکن وگەمار بێ، کەوشی چەک وبە بزمار ولار وخواربێ، دەڵێن لاچو تەرحت هەر لە شاعیر دەکا !!. کەس تەنانەت تواشی بەکڵاوی ناپیوێ، کەس پێی ناڵێ کەرت بە چەند.

هەربۆیەشە بەشێکی زۆر لە نوسەرانی بەچکە کورد، لەبەر ناچاری وهەژاری وەزوان ناموبان نوساوە وخۆیان ومناڵ وکاڵیان لە مەرگی بێ کوللیرەیی لەپەنایەک حەشاردا وە.

نامەوێ مەلای جزیری ،خانی،نالی،حاجی،مەولەوی وزۆری تر لەو کەسانەی کە ئێستا مایەی شانازی کوردەکانی کوردستان وکوردناسانن بۆ نمونە بهێنمەوە ،لازم ناکا مێژوی کۆنتان بۆ بخوێنمەوە .ئەمەوێ هەر بەسەرچڵی ومەویژ نمونەی کەویژێک ئەوانەوە بیر بێنمەوە کە هاوچاخی خۆمان بون ودەمان ناسین.

مەلا مارفی کۆکەیی ئەگەر بێژم لە برسا مرد رەنگە باوەڕم پێ نەکەن چونکە ئەو دەمانی وشک زۆر هەرزان بو.

مەلا ئەمجەد ئەو هونەرمەندە بێ وێنەی کە نازناوی شیعری کاک بو ، ئاغای لێ ببوە رموزن و لەچەند جێ دێ بەدەریان کرد.

قانیع تا مرد نان ودۆی خۆی رۆژێک لەپەنایەک نەدیت.

حاجی تەوفیقی پیرەمێرد کە حاڵی ماڵیش خۆش بو، هەرچونکە کمونیست نەبو، کەس رۆژنامەکەی نەدەکری ،دەیانگوت دەستندەخۆری ئینگلیسانە.

فایق بێکەس کە چریکەی گوێی دوژمنانی کەڕ دەکرد، دو لێفەی لەماڵدا نەبو کە خۆی و منداڵەکانی پێ داپوشێ . بەقەرزداری جولەکەی ئارەق بە قەرزدەر مرد.

گۆران ئەو ئەستێرەگەشەی عاسمانی ئەدەبیاتی کورد، بۆ دابێن بونی بژیوی دەگاتە یافای فەلەستین، وتاربێژی رادیۆی شەرقی ئەدنا بێ.

جەگەرخون پەنجا ساڵ پتر بۆ شیعر وچیرۆکی کوردی چەوسایەوە، لەجیاتی نان خوێنی جگەری خۆی دەخوارد، چەندێ لەکوردستان ژیا ومن دەمزانی گەسک لێدەری کۆلانان لەو تێرتر بون، کەس ئیرەیی پێ نەدەبرد ./

ئەوانە لەژیان ئاوا بون، لەپاش مردنیان چاوا بون ؟.

ئەگەر تاک وتەرایەکیان وەک مەلا مارف و قانیع ومەلا ئەمجەد، چەند هەناسەساردی دیکەش تەرم نیڕان لە گۆرستان بەچەند خودا عافوی بکا گوتن بلاوەیان پێکردن و چون هەر چون ونا ـ ویان دەگەل لاشیان ون بون ؟!.

لە وتار وشوێنەوارانەی لەو پارادارانەی زۆر بو کە خۆیان بەکوردپەروەر ورۆشنبیری دوستی نوسەران دەزانی .

لەپاش مالێ سلامالێ وەخۆکەوتن، بۆ یادی فایقبێکەس وپیرەمێردی گردی یارە ومەرگی گۆران مێوانی ونان وخوان درا . روپەر بەجارێ وەرگەرا . چۆن دەبێ لەبیرمان بچێ ! ئەشێ ناشتنی لاشەیان، ئەم هەمو کردە باشەیان لە لایەن ئێمەی رۆشنبیر کە لە کوردی پەرستی دا ئاوی شەوی شلوێ ناکەین وەبیر حەشاماتی مەردم بخرێتەوە .

دەتگوت: مەولودنامە دەکەن. بەردەرک وبان وبیلایی ئاورشێن کەن، بەڕان راخەن، سەنیر و پالپشت داخەن، شتی بۆن خۆش بسوتێنن، چرا و مۆمان داگیرسێنن دنیا بکەنە چراخان، چەند کەس هەر گولاو بپژێنن، کابانی دەستاوخوش بان کەن، قۆلی بەبازن هەلمالن تەشک وداوێنی لێ هەل کەن، پلاوملاوی زۆر چێ کەن با چەور بێ ، کشمیش وخورماش تێکەن، خۆرشت وترشک زۆر خوش بێ، باهەمو چلەیەک بۆش بێ، وێرای هاوسای کۆک وپۆشتە و دەوروجیران، لەو روتانەش بنگێرنەوە کە دەم دەشیعران وەردەدەن و زۆر تامەزرۆن، بابە بە خێری گیانی مردوەکە تێر بخۆن، هەمو روژێ هەلناکەوێ کفتە مفتە وا بەلاش وبەلێشاوبێ .. سائەوانیش لەسەریانە بە وتاری بایەخدار وبەشیعری تەر وئاوداریان کۆڕەکە برازێننەوە .

لەپاش مڕبون لە خواردن ولەپاش پڕ بون لە شەکراوان ومەکراوان، هەردەم یەکێ لەسەر بەرزەک قوت دەبتەوە وبەو پەری گفت ولفتی خۆش دەس پێ دەکا .

" خوشک وبرایانی بەرێز :تکا دەکەم هەسنە سەر پێ، دەقیقەیەک قروقپ ، مەنای بێ دەنگە، رەنگە هەر لەمدەقیقەدا گیانی نازداری کۆچ کردو لمە بەهەشتەوە بفرێتە سەر ئەم کۆڕە و ببیسێ چۆنی باس دەکەین !!.

دایکم دەیگوت پلکەبەسێ لە خاتوامانی مامانی دەگێڕاوە، کە ئەم زاتە ممبارەکە هەر ئەو ساتەی سەری لە هێلکە جولاوە، سەهەندە و بلیمەتێک بو هەمو مان واقمان وڕمابو .مەمک مژینی مەوزون بو ، گریانەکەی لە رەوتی شیعری ئازاد بو ، بیلامانێ، بیلاتەژبی،باپەرژینەکە، گولَ بێ باوبژینی بە قافیە و مافیە دەردەچو ، لەبێشکەدا بە گروگالی مندالی بەیتی وای دەهوندنەوە لون لە چاوی ئێمەدابێ لەودا نەبو ،کەس وانەبو ، ئەی هەزار رەحمەت لە گۆڕی ، ئەلفاتیحا ..".

یەکێکی تر قەسیدێکی دورودرێژی داناوە مردو دەلاوێنێتەوە، شیعر و وتار وەکو قەتاری وشتران بەزنجیرە دێن ودەچن.لەسەریەک کەلەکە دەبن، های لەو کوڕەی چالاکانە فریاکەوێ و ئەو یادنامەیە چاپ بکا . لەسایەی مردگی خوابەخشیو ئەوەندە پولَ پەیدا دەکا کە مردوەکە خەونیشی پێوە نەدەدیت .

وەکو بۆیان گێڕاومەتەوە کە تەرمی پاکی جەگەرخون لە سوێدەوە هاتۆتەوە بۆ گۆڕستانی "قامیشلی"، لەلایەن کوردەکانەوە پێشوازیەکی وای لێکراوە کە کەمتروێنەی دیتراوە. بە سەتان، بگرە هەزاران ترومبێلی هەوادارانی لە دەشتەدا وەکو مەڕی حاجی تاغی سەریان دە پاشلی یەک ناوە، سەدهەزاران لە ناشتنیدا بەشداربون . ئەی خودا خێریان بنوسێ .

خوشک وبرا کوردەکانی هاوزەمانی هاوزمانم دەزانم ئێوەش دەزانن ئەم قسانە ئەفسانە نین سەربەخۆ هەلمبەستبێ، ئێوەش ئەوانەتان دیوەوبە دلتاندا تێپەریوە، بەلام وەک من دەخۆتاندا رانەدیوە دەری برن . وەرن هەر لە خۆتان پرسن تو خوا مەلا ئەوە ئاردە؟!.

بە بروای من ئەو خۆلەزیندوپوا ردنە وبۆ مردنی خەمخواردنە، ئاکارێکی نزم ونانەجیبانەیە !!.

ئێمەی کوردی خاکەسەری بێ سەروبەر، ژێر چەپۆکەی داگیرکەران، لەناو خۆدا ولە هەندەر

ـ مان خیرەومەندێک دەس ناکەوێ دانی خێرمان
پێدا بێنێ،دروێک لە لەشمان دەربێنێ، هەزار و
ئەوەندە ساڵە لەو چاڵەدا قەتیس ماوین وبێ
ناوین . نەیارانمان ویستویانە زمانە زگما ـ
کەکەمان لێ بەربەست کەن . لەسایەی بێ زما ـ
نیەوە بە یەکجاری مافی رەوای نەتەوەیی مان
پێ پەست کەن . ئەگەر من و تۆش نەزانین ئاغا
ـ کانمان باش دەزانن هەر زمانە قەباڵەی بمو
ـ نی گەلانە ، هەر گەلێ زوانی نەمێنێ قەت نا ـ
یکرێ سەرهەڵێنێ و خۆبنوێنێ ومافی رەوای خودا
داوی وەدەست بێنێ ۔ هەر گەلێک یان هەر مندا
ـ ڵێک لە گەلێکدا زمانی تایبەتی بە خۆی یان
فێر نەبوە یان لەبیر براوەتەوە لەناو بۆ ـ
تەی ئەو بیانیەی زمانەکەیان فێر بوەتواوە ـ
تەوە . لەو قەرارەی ئەمان لەو هەموماوانە
بەلەز و هەڵەداوانە ویستویانە زمان وفەرهە ـ
نگەکەمان بنەبرکەن و کورد سڕکەن وگیان و
دڵی لە فەرهەنگی خۆیان پڕ کەن۔ ئێمەش لۆژ
لۆژ وەک دەگوێ گادا خەوتبین ولەو بیرە دەر
نەکەوتبین کە ئەوان رۆیان هێشتوینێ ،نەشمان
زانیوە چباسە چۆن تائێستاش هەر ماوین ویە ـ
کجارەکی نەفەوتاوین !.

کورد گوتەنی تەگبیر وتەقدیر لێک جودان
هەمو شت بەدەستی خودان . خوا ویستویە ئا ـ
میانی ژیانمان بمینێ.چەند کەسی وا بخولقێنێ
زۆر گوێ نەدەنە نان وئاو . بێ بەرگ وپێڵاو
رابوێرن ، لە گۆشت وپلاو وازبێرن .دڵ دان بە
کیژی دنیایی، ئەوینی پاکی خودایی ، خوشە ـ
ویستی زید وخزمان هانیان بدا هەستی تاودڵ و
هەناوان بە زوانەکەی دای و باوان بدرکێنن ،
روپەرانی پێ برەنگینن، رەنگە لە بەرخۆ گو ـ
تبیتیان: خۆمانەبێ ودۆمانەبێ، نەک بەزوانی
بێگانەبێ ۔

جزیری وخانی سەرپلی کوردی نوسینیان خوش
کردوە .بەرەودوای یەک بوێژانمان داویانەتە
سەر ئەو رچەی ئەو دوانە بۆیان شکاندوین ، و
ئەوانە تێیان گەیاندوین بەکوردی نوسین
رەوایە. ئەگەر چەند دەوروزەمانێک فەرهەنگی
کورد هەربریەتی لە بەیت وهوتەی کۆنە بو ،
دیسان شوکرانە بژێرین کە لەسایەی ئەوانەوە
زۆربەی زۆری وشەی زمانمان پارێزرا ولەبارەی
مەبەستەکانی جۆرا وجۆری ئەدەب وئەدەبیاتەوە
زۆر هەژارتر لە خەلکی تر نەماینەوە .

خۆ دیاریشە پەخشان نوسین بو پارازتنی
زمانمان لە شیعر وهۆتە باشترە .چونکە مەیدا ـ
نی نوسانی نەسر وپەخشان تا بێژی پان وبەر ـ
ینە ، نوسەر ریشی دەبەردەستی وەزن وقافیە و
هەیت وهوتی تردانیە .

خودا وڕاستان لەمە چەرخی چاردەهەمینی
ئیسلامیدا .ئەم دەروەشمان لێکراوە وپەخشان و
داستان نوسمان لێپەیدابون،ئێستا کە زۆری وا
ـ مان هەن، بەهۆی نوسینی چیرۆک وگردەوە کۆ ـ
یی دیرۆکان دەستەبەری هەرمانی کوردیەکەمانن.

یەکێک لەو پەخشان نوسانە لەزەبرانە ،سە ـ
جادی بو کە دەمەوێ یادی بکەم.

پێش حەفتا ساڵ لەماڵ مەلایێ سنەیی منالێک
هاتە سەردنیا ناو عەلاءالدینیان لێ نا .ئەلف
وبێتکەی پێ خوێندرا ونرایە بەر فەقێیەتی.بە
نانی دەقنەخواردن وبەتالی با با رابواردن ،
سوختە بو بە مستەعید ومستەعید کرا بە مەلا .
چۆن مەلایەک؟ لەعارەبی وفارسی وکوردی وریا و
پیتۆڵ . بەڵام جلک شروشۆڵ وتەبەک وباخەڵ چۆڵ
وهۆڵ۔ دەگەڕا بەشوێنی نانداا لە بەغدایە گێر
ـ سایەوە. لەسایەی چەند خێرەومەندێک بەگێرە
گێر پێش نوێژیەتی لە کونەگورگێکا دەس کەوت
کە ناونرابو مزگەوت .حوجرەیەکیش بو جێ خەوی
مەلا هەبو .صەدخۆزگە بە حوجرەی نالی۔من ناوم
نابو کونەرەش ۔ بە رۆژ دەبو چرا هەڵکا .بە
شەو چۆنی تێدا هەڵ کا ؟.هەر خۆی وخودا بیزا ـ
نێ .

ئاوارەیە ،غەوارەیە .گوناهی هەرەگەورەشی
کوردبونیەتی.سالەهای ساڵ رۆژوشەوی وکات وسا
ـ تی لەو حوجرەدا لەسەر حەسیر ببوە سیپاڵ .
جا مەگین چلۆنکایی با دەنا هەرگیز ئەو زیندا
ـ نەی جێ نەدەهێشت . هێشتاش هەر لەوە دەتر
ـ سا کوردی نامەرد،کەمالم هەقە زۆریش بون،
تۆمەتی ئێرانی بونی بەمل دادەن،لەپاش گرتن
وجزیادان بو ئەو دیوسنوری رادەن.ئەو نانە
وشکەشی بچێ کە ئێستا بێ منەت دەیخوا ..جیا
لە کاری پێش نوێژیەکەی هەرپێنج فەرزان کەبە

حاڵ نان وبژیوی ئەمرنەژی لێ دەردەهات . بە ڕۆژ و بەشەو بێکار بو،بێکار لە بەهەشتیش بژی وەڕەز دەبێ، خۆی لەکن خۆی ناحەز دەبێ و قێزی لەخۆی دەبێتەوە .

خۆ نەمازە سەجادی کۆنە گەڕێدەی دنیا دیدەی قسەزلی بەبالاچوکی وا لەش سوک بەبێکاری لەژورێکی ڕەش وبرش تەسک وباریک و شەدارو ئاوا تنوک وتاریک دا دەس لەبان دەس کارێ نەکا .هەردەش رزێ با مەرەکەف لە قورم ومازو دروس کا قەفەچێک وکاغەزی کاش زۆر هەرزانە، با بەختی خۆی لەنوسین تاقی کاتەوە .

بەختی لەم ئەزمونە گرتی، بو یەکەم جار لە گۆواری "گەلاوێژ"دا ناوی سەجادی خۆی نواند. نێزیک دەساڵ ئەم ناوەمان لەسەر بەرگ و ناوەڕۆکی ئەو گۆوارە بایخدارە دەخوێندەوە ئیتر بەری بەرهەم دانی کرایەوە ،وردە وردە بوژایەوە، مێژوی ئەدەبیاتی کوردی،باسی شۆڕشەکانی کورد ،گەشت وگوزارنامەکانی،فەرهەنگۆکی بە عارەبی وفارسی وکوردی، کتێبی ڕشتەی مرواری کە ئێژن بویتە هەشت بەرگ، بەرهەمی علاءالدینن ئەمە جگە لە وتاری ناو ڕۆژنامە وراوەی شیعری شاعیران وزۆری تریش کە هەژماردنیان دژوارە .

زۆر سەبوری بەمن دەهات زۆر جار لە کونە ڕەشەکە سەرم دەدا ،بەیتێکم بو وەرگێرا بو بۆم خوێندەوە :"تۆ نەمردوی ئەی علاءالدینی سەجادی نەسەب ، خاوەنی مێژوی ئەدەب ، پێش نوێژی پێخواسی عەرەب "دەیگوت ئەرێ پێخواسەکە منم یان پاش نوێژەکانمە!!.

لەو ژیانە پر لە ژانەدا تەمەنی گەیە حەفتا ساڵ .. ئەو هیچ لەدەست نەهاتوانەی هەر ئیرادگرتن دەزانن وهەرگیز لە هونەر ناڕوانن کردبویانە ئامانجی تەوس وتوانج وزەدەیان لێ دەدوزیە ولەیەکتریان دەقوزیەوە :مەلا دەس ژار وچنوکە ،ترسەنۆکە گۆشەگیرە ،لەم ناوە هەر خۆی لەبیرە، سەر بۆ حوکمات دەنەوێنێ، لەمەجلیسی تەشریعی کە جاشخانەیە چۆن قبوڵ دەکا بەشدار بێ ولەناو کومەڵ لەکەدار بێ .

ئیتر سەرتان نەئێشینم پێ هەڵگوتن بەدینار وغەیبەت کردە بە خەڵوار بو،ئەم بەرگۆیی وبە نامۆیی لێ ڕوانینە تا دەی ئاویلکەدانی،تا دوا هەناسەی ژیانی دوایی نەهات .تا خەبەر هات کە ماموستا علاء الدین عەمری خوای کرد.

ئەمجار وەرە وگوێ لە ئاخ وکۆڤان بگرەولە داخی دوزمانان مەمرە.هەر ئەوانەی بەزیندویی کەولیان دەکرد،شین وچەمەرەیەکیان بە داستان بیگێرنەوە. مخابن بو ئەو جوان چاکە جوانەمەرگە،لەوەتا پەلکی وەریوە هەمو کوردستان هەتیوە وسەد بەیت وبالۆرەی تریش. خوشکی دلسۆز،کاکی برا،ناڵێم زۆر، بەڵام هەر تۆزێک ئینسافتان بێ ،ئەو کەسانەی پیشەیان کوردی نوسینە وگەشە بەزمان وفەرهەنگی کوردی دەدەن هەتا ماون وا بەسوکی سەیریان مەکەن.کەموسکێک ڕێزیان لێ بگرن واتا بەخوێت وخۆرایی نە جنێو نە پولیان پێ بدەن،نەخراپیان پێ بکەن نە خێر .. چونکە نوسەر ئەگەر فێری سوالکەری بو خۆشی وهونەری هیچ نازین .

با ئاکارە نالەبارەکەی کەونارا بەروپشت کەین. نوسەرێک کە بۆ بەدبەختی هەر زیندوە خوتان وای دانێن مردوە .ئەو پول وپارەی لە یادی لاواندنەوەی پاش مردنی بەخت دەکرێ لە ناوخۆدا کۆی کەنەوە. کروبەرهەمی نوسراوی هەڵسەنگێنن،بی نرخێنن. هەڵەوپەڵەی ئەگەر هەیە لێ بژارکەن.بەو دەسمایە بۆی لە چاپ دەن،لەفرۆشیاو پارەکەی خۆتان بەزیادەوە وەرگرنەوە .لەو دزانەی بپارێزن کە ئەمرۆ لە کوردستاندا کاریان بوتە دزی وفزی لە شاعیران ونوسەران، بێ پرس ورا کتێبیان چاپ دەکەنەوە وئاور لە ویژدان وشەرەف نادەنەوە .ڕاستی ئەمانە خەتەرن وبەر لە زۆر نوسەران دەگرە کە بەکاری خۆ دلخۆش کەن. لاوێکی کورد کە بزانێ هەرچی نوسی ئەو دزانە هەر لەهەوا دەیقوزنەوە وهەق ومەقی بەرپێدەدەن، چون واز لەنوسین ناهێنێ وناچێ کارێکی تر بکا کە بەرهەمێکی پێ بگا ؟.

ڕاستان دەوێ ئەو کەسانە ناکەسانە نەنگی ناو شارەکانتانن،تا دەتوانن لەناو خۆتانیان دەراوێن.با ئاکاری کۆمەڵگاتان وەک ماڵ وکوڵا



# گورگە برسیەکان

رەفیق سابیر

(بۆیەڵماز گیونەی نەمر)

✱ چرا ✱

پەڵە هەورێ، نیوەشەوێ ، بەخۆی گرتم
پەڵە هەورێ،بەرەو ڕێی نەهاتی بردم
لەناوجەنگەڵی کریوەو
غەریبیدا ونی کردم
پەڵە هەورێ ، هەڵی گرتم
لەهەرێمێکی بێ کەسا
وەکو چرا هەڵی کردم.

✱ بەکویدا هاتی؟ ✱

بەم نیوە شەوە لەکوێوە هاتی؟
چۆن گەردی دیلیت لەخۆت تەکاندو
ئێوارانێکی تەماوی زستان
وەک خۆر هەڵهاتی؟!

سەهوڵبەندان بوو .. بەکوێدا هاتی؟
ئاگرباران بوو . بەکوێدا هاتی ؟
کوردستان تژی سەگی بێگانەو
نوقمی تاوان بوو .. بەکوێدا هاتی؟
بەکوێدا
هاتی؟!
چۆن لەهەرێمی گەلە گورگدا
بەشارستانی و
لاوک ڕاهاتی
لەبەر هەرەسی ئەم بارانەدا
تۆی نوقمی خەون، پەلکە زێڕینەی
یان ئافگەی هەڵم .. ؟

لە سەفەربەرو
لەژێر کەلاوەی ئەم وەرزانەدا
ڕوخساری ئاسۆی
یان گوڵە گەنم؟
لەبەیانێکی داگیرکراوا ،ئێمەلەگەڵتۆدێرا بینەوە ..
لە زامەکانتا..
لەخەمەکانتا
ئاکاری ونمان دەدوزینەوە
بەخۆشەویستی و
پەلکە زێڕینە
کوردستانی دیل،دەتەنینەوە .

✱ یەڵماز گیونەی ✱

ئای لەڕۆحی سەرشێتم ، ئەمشەو چی لێقەوماوە
لاقاوێکی ناوەختەو
لەهاوینا هەڵساوە .
ڕۆحی سرک و سەرە ڕۆم
دەڵێی لەڕووی دەسڕێژو سێدارەدا وەستاوە
بەگۆرانی و
تورەیی و
لاساری هەڵماساوە
لەناو تاریکی و خۆڵا
لەهەرێمی سەهۆڵا
وەک گرینک داگیرساوە .

ئای لەڕۆحی جەبرەوم، ئەمشەو چۆن وروژاوە !
بێ هاورێ و تاک و تەنیا
دژی مەحاڵ وەستاوە
بەرەو ڕۆحی سەربەستی
دونیای بەپێش خۆی داوە .

# شورش

لالو حسن

شورش دەبێ لەناخێک دا
ئاگر بگرێ کە ووزە
تێی دا
بسوتێنرێ
ئەو شورشەش شورشێکە
کە کرێکار ئەو ووزەیە
دەسوتێنێ
بەرهەم هێنەر هەر ئەوانن
هێزەکەشیان توانایەکە
کە شورشی راستەقینە
بە گوی خەلک دا دەچرپێنێ
ئەی ئەوانەی
ئەی ئەوانەی
تاکو ئێستا ووزەی مەردی
دلێرانەی ئەو پیاوانە
ئافرەتانە دەرەتێنن
چاک بزانن روژی دوایێ
بو ئەوانە گەرچی ئەمرۆ
زوربەی پارت ودوستەکانتان
بە ئاشکرا وبە نهێنی
لەبواری پاشقول گرتن
جێ نەماون چاک بزانن
کە ئەمرۆکە کرێکار وئاشتەکانیان
ووریان ووریان
ئامانجیشیان پێویستیە
هەر دێتەدی
هەر دێتەدی

بەرهەم بهێنێت هەندەی تر گرنگی بەکێشەکە داو ، پرسیاری لەخۆی ئەکرد : باشە ئەم هونەرمەندە ئەگەر لەدەرەوەی زیندان دا و بەئازادی فلیمی بەرهەم بهێنایە ـ ئەبوایە چەند شتی سەرسورهێنەری تری بەرهەم بهێنایە و چەندی تر گەنجینەی سینەمای جیهانی دەوڵەمەند بکردایە ؟ جیهان لەوە گەیشت کە هێزی فلیمەکانی گۆنای سەرچاوەکە ـ یان مێژووی ژان و ئازاری ملیۆنەها مرۆڤی چەوساوەی کوردە ، کە ئێستا هیچی لەبارەی کێشەکەیانەوە نەزانیوە، هەر لەبەر ئەوە هیچ بەرگری لێ نەکراوە لەلایەنۆای گشتی جیهانەوە . ئەو تێگەیشتنە بووە هۆی ئەوەی کە فلیمی ( ڕێگا ) ی گۆنای گەورەترین خەڵاتی سینەمای جیهانی وەرگرێت ـ چونکە بێجگە لە سەرکەوتنی هونەریی دەربڕی کێشەیەکی ڕەواو پڕ لە کارەساتی نەتەوایە-تی و مرۆڤایەتیَ بوو ، بەبێ هیچ ڕتوشێک ـ جیهان بۆ یەکەم جاربوو فلیمێکی کوردی لە سەر باری چەوساندنەوەی کوردستان ببینێت و هەر بۆیەکا بە تەوژم بینەران لە هەموو لایەکی جیهان دا بۆ بینینی ئەو فلیمە دەچوون .. شێوەی پاڵەوانەکانی، سروشت و دیمەنە جیاوازەکانی .. مۆسیقاو گورانییە کوردییەکان .. هەموو فلیمەکە بەگشتی دەربڕی ئێش و ئازارو ژان و چەوساندنەوەو هیوا و ئاواتبوون .. چوار سوارەکەی فلیمی ڕێگا کە پێکەوە بەرەو ئاسۆ ئەکشێن ڕێگاو ئاواتی هەموو کوردێکی نیشتمان پارێز بوو ،لاپەڕەیکی نوێ بوو لە خەبات وبیری ئازادی کوردستانی دا ـ گۆنای بە فلیمەکانی ئەوەی بۆجیهان ئاشکرا کرد کە نیشتمان و نەتەوەیەک هەن بەدەستداگیرکەرەکانیانەوە لە مەترسیدان، بێجگە لەوەی کە بۆ هەموو شۆرشگێرانی کوردیشی سەلماند کە هونەرو کولتووری نەتەوایەتیش چەکێکی زۆر گرنگی تری خەباتە، باڵێکی ڕاستەو خۆی ڕێگای سەرکەوتنە ، ئەبێ وەکو بەڵگە و هەوێن بە کار بهێنرێت|وپتر سەرکەوتن بۆکوردو شکۆ و نەمری بۆ گیان و بیرو هونەرەکەی گۆنای ■

--- پاشماوەی لاپەرە

ـ نەکانتان پاک وخاوێن رابگیرێ .

ماموستا سەجادی کە مرد ،ئەگەر کاری ناپەسندیش کرد ،دەگەڵ خۆی بردە بن گڵێ.

ئەو بەرهەمەی لەو بەمیرات ماوەتەوە هەر ۆشەکوردیەکانی بێ وهیچی ترنا .دەتوانین فەر-هەنگی قەبەی لێ پێک بێنین وبیکەینە مایەی شانازی وبە عەلاء الدین بنازین. ئەو کەسەی چو ، مێژوی ئەدەبە کوردیەکەی بێ پرس ورای ئەو چاپکرد وهەقەکەی خوارد ،خۆی لەسەر کۆنەی ویژدان بوارد. بەلامەوە ئەو بەسوکی لێڕوانینەی نوسەرانی بەکارمانە .

پوختەی وتار تکا دەکەم شاعیر ونوسەرەکا-نتان کە پارێزگاری فەرهەنگ وزمانتانن هەر بەزیندویی مەمرێنن وبەمردوییش پێ ناوێ مو-میایی بیان هەنون وتازە نرخیان بۆ دیاری کەن. مەیکەن بە نەقلێ چەقەڵی کابرای بەغدا.

خودا حافیز .

--- پاشماوەی لاپەرە 33

گۆڕێ . هەریەکە خۆی بە دروشم و سیاسەتێکەوە بە ستۆتەوە کە تاقی کردنەوەکانی تاڵی ڕابردووی جووڵانەوەی کورد چەوتی ئەم ڕێبازەی دەرخستووە .

ڕاستە کە هەل و مەرجی سیاسی وجوغرافیایی و باری نێو نەتەوەیی لە سەرکەوتنی خەباتی ئازادیخوازی کوردا بێ تەئسیر نەبووە بەڵام خۆی ئەسڵی دەگەڕێتەوە بۆ سەر سیاسەتی چەوت و لێ نەزانی هێندێک لە ڕێبەرانی کورد .

نەبوونی ستراتیژییەکی ڕوون ، نەناسینی دۆست و دوژمنی ستراتیژی گەلی کورد ، نان بەنرخی ڕۆژ خواردن و ستراتیژی فیداکاتیک کردن ، خۆبەستنەوە بە حکوومەتەکانی دوژمنی کورد ، کێشەو ناکۆکی و یەکتر کوشتنی حیزب و ڕێکخراوە سیاسییەکانی کورد کە نێوەڕۆکی سیاسەتی هندێک لە ڕێبەرانی ئێستای جووڵانەوەی کورد پێک دێنن ، ناتوانێ خەباتی دژوار و پڕ لە تەنگ و چەڵەمەی گەلی کورد بگەیەنێتە قۆناخی سەرکەوتن و ئەم نەتەوە بەشخوراوەش ڕزگار بکا.

### --- پاشماوەی لاپەرە 23

گومان لێ کراوی ئیمپریالیزم کەچناکاتە وکەس گومانی لە هێز وتوانای دانیە کە تا سەر خەبات بەردەوام دەکات بە پشتگیری ویارمەتی گەلانی تری ڕزگاریخواز وپێشکەوتنخواز دژ بە ئیمپریالیزم لە جیهان دا .

<u>پەراوێز:-</u>

* دوای گەورەبوون وزیادبوونی ژمارەی ئەندامانی بەرەی ساندینی، سێ(٣)بال دروست بوون بە گوێرەی بۆ چوونیان وچارەسەریان بۆ پەرەپێدانی خەبات ، ئەوانەش بریتی بوون لە :

١- باڵی یەکەم(کۆمەڵی یەکەم)- باوەڕیان بە شەڕی پارتیزانی دوور ودرێژ هەبوو، بەتیپەکانی پێشمەرگەی ناوچیاکان بۆ وەدەستهێنانی سەرکەوتن .

٢- باڵی دووەم- باوەڕیان بە ڕاپەرینی چەکدار هەبوو بۆ سەرکەوتن، کە لە شارەکانەوە دەست پێ دەکات ،وزیاتر پشت بە جەماوەری ناوشارەکان دەبەستێت .

٣- باڵی سێهەم- لەنێوان هەردوو لادابوون، وە باوەڕیان بە هەردوو شێوەی خەبات هەبوو کە شان بەشانی یەکتر کاربکەن تا سەرکەوتن وەبەهۆی یەکگرتن لە نێوان شار ودێهاتەکان .

Hizar parzînkên hîvîya û hizar tevna,
Hingî d,hête pêşçavên min..
"Zîna" b,dîwarên xu d,kenît
Hinde nêzîke çinema..
"Şîrîn" dê"Bêstûn"î simît,
Direfşa hera bilinde û
"Nahîd" ya awaza d,jenît.
Hîngî "Celwa" d,bêjîte min..
Şeve şahya perî û horya
Şeve biheşt û yotûbya
L,evî warî
Şeve..şeve..
Benderê paporrên xuzîya
Êzgê xewna û hemî xuşya..

TEHRAN
22/6/I984

### --- پاشماوەی لاپەرە 17

مافی دیاریکردنی چارەنووس وەکو سەرەتایەک مانای جیابوونەوە دەگەیەنیت وهەروەها مانای یەکگرتنیکی ئارەزوویانەدەگەیەنیت ،بەلام گرنگ ئەوەیە دەستی لی بەرنەدەین تەنانەت لەو کاتەی کە جی بەجیکردنە واقیعیەکەی یەکگرتنیکی ئارەزوویانە بیت .

### --- پاشماوەی لاپەرە 26

جیو میتری و ئەپستراکت و دروشم، بێگومان زۆر دروشمی میتۆلۆجیش بەکار دێن، بەلام هەمووی بۆ باری ئەندازیارییەکی پوخت و ڕاست و ڕەوان دابین ئەکرێن - لەبەر ئەوە هیج سەیر نییە کە لە زۆر مافوری کوردستان دا گەلێک فۆرمی سروشتی بۆنەتە فۆرمی جیومیتری - فۆرم و شێوەکانی چوارگوشەو لاکێشی و سێ سوچ و ئەستێرەو هێڵی ڕاست و هێڵی چەوت و کەوانەو ... هتد هەموو واتای تایبەتی خویان دەبەخشن و ئەلف و بێی دامەزراندنی پانورامای نرخە هونەرییەکانی مافورێکن ، کە ئەویش هەروەکو تابلۆ یەکی هونەری پیوانەی تەکنیکی و فەلسەفی خۆی هەیە ، لەگەڵ هەموو جیاوازییەکی تری نێوانیان دا . لەماڵی کوردا مافور دەوری تابلۆش دەبینێت ، بەتایبەتی کە بەسەر دیوارەکانەوە هەڵی ئەواسن . ئەم ڕاستییەش ئەوەمان بۆ ئەسەلمێنێت کە مرۆڤی کورد هەمیشە بەرهەمی هونەری خۆماڵی خۆی هەبووە بۆ پەروەردە کردنی دەروونی - بەرهەم هێنەری مافوری کوردیش هەموو ژن و منداڵی کوردن کە هەر لە گزنگی بەیانەوە تا تاریکی ئێواران بە پاداشتێکی زۆر هەرزان کاریان پێ دەکەن و بازرگانەکان بە نرخێکی زۆر گران لە پایتەختەکانی ڕۆژهەلاتی ناوەڕاست وئەورووپا دەیانفرۆشن !

## SIRÛDA GEL

Parta Gelîn,Parta Gelîn
Parta karker û rêncberîn
Ronahkerên rêkê emîn
Bo kurdistan rizgarkerîn
Dagîrkeran dê teqînîn
Kaxên zorê dê roxînîn
Hemî parça dê keyne êk
Alay rengîn dê çeqînîn
Dê helqînîn rihên zorê
Beg birjiwa dêkeyn gorê
Dê ava keyn komelgehî
l,ser bingehê hevpişkîyê
Ne napalim ne merg û xwîn
Ne top û tank şkence û birîn
Rêgey xebatman nagirin
Bo Kurdistan cana didîn
Em hevalîn bo bindestan
Li her alyê hejar hestan
Ta gorkirna gişt faşîstan.

**ŞEHÎD CENGO**

## ŞEV

### I_WARBARAN

Ev cîhane..
Hemî evîndara rojêye..Eznebim
Ez heyvim û min şev divêt
Çunke tinê..
D,nav pêlên reşên şevêda
   Ed,şêm yara xu ramîsim
Tinê..tinê..
D,nav prasîyên şevêra
Ed,şêm dijminê xu bigrim..helawîsim
Ez heyvim û min şev divêt..
Çunke kirasê min şeve..Çiya û berrwîn,
Min bawere..
Nîva dastana jiyanê
D,paşya şkeftave binvîsim
Min şev divêt..
Çunke d,şevêda cejna me destpêdketin
"Biromîsyûs"hersal bikar
Hêdî..hêdî..
B,dizîve..
J,çiyayên "Qewqaz" d,hêtexar
Destê zerdeştî d,girîtin
   J,dil d,bêjîtin..
         Cejin pîroz,
D,şevêda ciwanya agirî xoyadbît
Sitayişbît ev agire
Herdem sitayişbît Newroz..,
Lewra..lewra..
Demê roj rojê d,hêlît û
Kezya şûrrd,kete nihala,
Demê l,ser kanya gundê me
Hirrkên şivan û gavan
Têkheldbin..
D,gel dengê çavrî û kewala.
Demê valadbin hêlînên çekçekwîla
Hêlînên din..
Avadbin..b,zivrrîna çwîçk û tewala.
Lewra..lewra..
Demê j, ber wîrrwîra beqa
   Hêrrdbin zevî,
Demê l,ser gopîtkên çiya
D,qerrisîtin befr û kevî.
Demê silavd,kete çema
Tirîfa heyva kewçera çardeşevî.
Lewra..lewra
Demê l,nav şîv û percana
      D,bîte firtêna çirkuna,
            L,nav aqara..
Xuşdbît kibara guhîna,
Demê asman..
D,bîte perraşoteka reş
Vedgirîtin..
Şax û nihal û betena.
Lewa..demê
      Demê..demê.,
Hingî gava xuşya mine
Xuzya min şeveka dirêj û bêbine,
Çunke hingî..
Pêngav d,bezin bo heneka
Tibl û dev hêdî d,gezînin
Pirç û stivank û eteka.
Hîngî barwît..
Eşqa azadyê heldgirît
Semfonya aştîyê d,bêjît,
Hingî hêlînên zarrokyê
Geşdken derazînkên xewna
         Dil radçînin..

## COTYARO

Dest û dêmê te zinarên qermiçîne
Ling û zendên te wekî darên bejîne
Herdu çavên te şikevtên hilweşîne
Ew çi damarin ?! wekî maran xuşîne
Herdu lêvên te wekî xaka hişîne
Ew milên te wek dîwarên daketîne
Zarowên te her nexweşin , dilşikîne
Kes nizane ew hene an jî mirîne.....
Tirşik û nanê ceyî boyî te hiştin
Lê ji bo xwe çav û laşê te biriştin
Cotiyaro! Pir wekî te têne kuştin
Boyî axan gorê zarokan qeliştin
Pîrekên wan naz û rindik rûdiniştin
Awirêd çavan bi çingalin , bi xiştin
Bax û bîstanên li hawîrê bihiştin
Pîreka te kinc û lingên wan dişuştin ....
Karê sê salan te jê anî sewalek
Zadê mala te di salê de çiwalek
Ma ji bo çi ?!..Va kurê te bû şivanek ?!..
Ma ji bo çi ?! Ew nebûye xwandevanek ...
Hogirê wî bû , li zozana ..Beranek
Ew li ser pişta kerê reş , bû siwarek
Te bi destên xwe kurê xwe kir berazek.....
Cotiyaro ! Ma ji kê re tu diçînî ?!
Her nexweşî .. bê kiras û bê nivînî
Pir şevên tarî , tu bê agir dimînî
Her bi nalîn û fixanî , dilbirînî
Ma nîye carek tu jînê bihejînî ?!
Derkevî aza bijî , royê bibînî ?!
Tariya jînê , bi destên xwe hilçirînî ?!
Tola bavê xwe ji axê xwe hilînî....?!
Cotiyaro û karkeran herdem bi yek bin
Her li hember dewlemendan , tev li şerbin
Piştegîr û hem heval û dostê hev bin
Zend û bendê va welatê xweş û rind bin
Roja cengê ..Nola leşker , lêk bi lek bin ...

**CANKURD**

## XORTÊN GEL

Gelê Kurdistan
Partîya rêzan
Pêşengîn hatîn
Emîn Partîzan
Bikiryar û renc.
Em xortên kurmanc
Em ne xwînmijîn
Ne birakujîn.
Lê çîna zordest
Em kirîn pêpest
Ger lênerabîn
Nabîne serbest.
Bimrî hovêtî
Bijî yekîtî
Dest bidene hev
Deng biden gîtî.
Pale û cotyarîn
Em pirolîtarîn
Nekes perestîn
Em nekedxwarîn
Pêşve diçîn em
Direvît sitem
Zanista cîhan
Dixwînîn herdem.
Em serferazîn
Xudan rêbazîn
Rizgarîya gel
Bilez dixwazîn.
Em serbilindîn
Zîrek û tundîn
Me dest dane hev
Lewra em rindîn.
Tevda mêrxasîn
Xort û gernasîn
Li tev cîhanê
Pir deng û basîn.

**HOZAN**

chalakmuhamad@gmail.com
حسنته سعر تنث: جالاک

# NAMEK JI ŞIVAN PERWER BO ZAROYÊN SEHÎDÊN PARTÎYA ME



Hozanvanê şoreşgêr,hunermendê navdar Şivan Perwer namek ji zaroyên şehîdekî partîya me ra şandîye,em deqqa wê namê li jêr çapdikîn.Li gel rêz û supasîyên govara PEŞENG ji hozanê gel,Şivan Perwer ra .

KULİLKÊN ŞUNA ŞEHİDAN

Çimena delal û Kawayê hêja !

Mın surete we dı Rojnameya gel de dit,lê kûr û dûr nıhêri û lı ser gelleki fıkırim.

Bavê we jı me re bû qurban û kete dılê ezmanê Kurdıstanê.Lı nava stêrkên ezmanê me bû yekek jı wanên xemgin û dıçırıse.Ewan stêrkan lı ezmana reş gırêdane û dınalın bı ser me de. Ezmanên me jı ber wan ewrên reş û tari gırê dıdın.Lı jêr,axa welat dı dilê xwe de gelleki xemgin,hêc û bı gırr û nıfrine,weke axa Viet-namê.Lê,nalina stêrkan û gırr û nıfrina erdê wê rojekê bıçırıse,wê ewrên reş û tari bela bıke,buharê wer e can û gulên kesk,sor û zerê bıbışkıvın.Ezmanê sahi bıbın,wê stêrk bıgrın govend û dilan.Gulên sor wê lı ser gora şehidan vebın,bılbılên evindar wê lı ser gulan dıl bıdın.

Kawayê hêja !Navê te navê Kawayê şehid û Kawayê hesınkare ku hinûhin nişana serefrazi û serbılındıyê ye........

Çimena delal ! Navê te ji rengê buhara Kurdıstanê ye ku hemûher bı hêvi ye.....


Can û cana mın ! Bavê we şehid bû û dayıka we ji dildar û dılovane.Lê dızanıbın hûn zarokên me ne û lıber dılê me gelleki eziz û hêjane.Heyfa bavê we lı erdê namine. Wê rojekê kevır û kuçkên Kurdıstanê bı ser dıjmınê xwinxwar de bıhedıme û wê lı ser her lat û zınarên Kurdıstanê tirêjên azadi û serbesti bı xwina şehidan reng bıdın.

Apê we Şıvano bı vê hêvıyê xebat dıke......

Gellek selavên hısreta dûrıyê lı dayıka we ya dılovan û bı hısreta dûri û evina welat têmê çavên we, zarokên mın............Hezar selav jı bo wan 13 şehidan û hezar selav bo hemû şehidên Kurd û Kurdıstanê

9.8.1985

ŞIVAN PERWER



pirtùkeke cihè,bi zimanè azirî,bi rèzyùmèa rùsî ronahî dîtîye,wa tè navkirinè:"Lîteratùraèd miletîè ù pevgirèdanèd wane lîtèratùrê",ku ser hîmè ji dîroka pevgirèdanèd gelè kurdaye lîtèratùrîè tevî gelèd Pişkavkazè hatîye nivîsarè.

Xènji vana,bendèd wîye ulmîye usaye giranbiha ronahô dîtine,çawa:"Adirbècan nava lîtèratùra kurdada"(bi zimanè azirî),"Nivîskarèd Adirbècana Îranè derheqa kurdada"(bi rùsî),"Pevgirèdanèd kurdaye lîtèratùrîè tevî lîtèratùraèd gelèd Sovîètistanè" ù "Çend aspèktèd ji lènihèrandina dîroka pevgirèdanèd rùsa-kurdaye lîtèratùrîè"(bi kurdî),"Samèd Vùrxùn derheqa kurdada"ù yèd mayîn.

Nava salada bi zimanèd ermenî,rùsî,kurdî,azirî rojnema ù kovarada ji 50-î zèdetir bendèd wîye ulmî derketine,li ku hîmlî pirsèd dîrok ù tèorîa pevgirèdanèd lîtèratùrîè,pèşdabirina derecèd lîtèratùra bedewetîèye vè demè tène azurùkirinè.Û,femdarîye,wekî XXXX bona nivîsara wan monografîa,benda gelekè bi seda pirtùkèd cihè-cihè bixùnî,wan zimana rind zanibî.

Dèmek,zelal ù ferih zanebùna çend zimana,usa jî ew yek,ku ew bona nivîsara tèmakè zanyarî bi seda pirtùkèd cihè-cihè dixùne,bi wè yekèva ew ji gelek ulmdarèd mayîn tè cudakirinè.

Niha em çend gotina jî derheqa xebata wîye sereke ù mexlùqetîèda bèjin./Lè bi texmîna min ew her xebat xwera xebata hîmlî hesab dike/.

Roja îro ewledè kurdayî hèja Kinyazè Îbrahîm dosèntè înstîtùta Yèrèvanèye pedagogîèye ser navè X.Abovyane,serwèrè kafèdra ziman ù lîtèratùra azirîye,dewsgirtîè dèkanè fakùltèta fîlologîèye,endamè şèwra înstîtùtèye ulmîye.Ewî bilî înstîtùtè,aspîrantùraè,usa jî fakùltèta ùnîvèrsîtèta Yèrèvanèye marksîzm-lènînîzmèye agîtasîaè-propagandaèye fîlosofîaè,ya rex Komîtèa navbendîye Partîa Ermenîstanèye komùnîstîè temam kirîye.

Komùnîstè helal timè bi lèksîava ber xebatkarèd gundèd komarèye kurda ù azirîya pèşda tè. Ew endamè şèwra tèatra Yèrèvanèye azirîye ser navè Cebar Cebarlîye dramatîkîèye bedewetîèye dewletèye.Van axirîya Kinyazè Îbrahîm bù endamè yekîtîya nivîskarèd Sovîètistanè.

Wextèda Kinyazè Îbrahîm çend sala serokatî li koma xwendkarèd Yèrèvanèye kurd kirîye,me tevayî gelek civîn ù èvarîèd qedirgirtinè,lîtèratùrîè-sazbendîè teşkîl kirine.

Meriv demekè zendegirtî dimîne,ku ew çawa pèra dighîne van hemù tişta bike.Carna usa diqewime,ku bi seheta dikare bi tèmaèd cihè-cihè tera xeberde.Û kèm merî zane,ku ew carna sibe ber textè xweyî nivîsarè safî dike,dora kîjanè bi seda pirtùkèd ulmîne,kîjan ew bi aqilane dide xebatè.Û gava cînar jè pirs dikin,ku çima şeva ronaya oda wî dişuxule,lè ya cînara-na, ew awa bersîvè dide: "Lîtèratùra cînarèd mine ermenî pèşda çùye,lè ya me hewcè peşdaçùyînèye".

Her tişt nîbù,ku vè bendèda derheqa ewledè kurdayî hèja-Kinyazè Îbrahîmda hate gotinè,lè çawa ku cimet dibèje:"Çi jî bèjim,bejna syarè min tèX".

**TÊMÛRÊ XELÎL MÛRADOV**

---

Ji lapere( **52** )

û çap bûna wê bi herdu core tîpan pir giringe divê berdewambe heya dewran tê û milletê me xwebixwe bibijêre ka bi çi tîpan û bi çi rêyê da bimeşe.Kêfa min tê ku Pêşeng bi sîstematîk dertê û eve nîşana wêye ku ser binge hekî qewîn sekinîye û yên têda dixebitin jî zimanê kurdî baş dizanin û agahin çi nava çand û edebyata kurdî da diqewime.Dilê min şad dibe ku ez bimînim dostê Pêşengê û Gel,û ez daxwaza pêşketin û serketinê ji bo wan dikim, çunkî xizmeteka mezin ji gelê mera dikin divê em biparêzîn û xuyîkîn.Careka din ez daxwaza serketin û pêşketinê ji bo Gel û Pêşengê dikim di rêya xizmeta çanda gelê meda.

JÎ SERHİLDANA GEL...

Hewlêr.Û li meha Çirya Pêşînda derê navendîya Birayetî ya Dihokê girtin.Li ser van hemî yan ra jî rijîmê av û elektirîk yên ji malên pêşmergeha û her malekê ku yek jê derketî nav tevgera welatparêzîyê birîne.

Raperîna gelê me li Bajêrên Kurdistanê ji nû ve nîşan dide ku gelê me xudî hêz û pêçênên şoreşgêrîye ji bo pêkanîna armancên xwe û hêzên xweyên niştimanparêz di rawestandina qadisîya şûma Seddam û rizgarîyê ji dîktatorîya faşîst.Eve hemî hêzên xêrxwazên gelê me li pêş erkên niştimanîyên tarixî dadinêt di yekîtîya xebat û têkoşîna hemî hêzên niştimanparêz da û tund kirina xebatê ji bona roxandina rijîma dîktator û faşîst da..

# MÊRÊ QENC, ZANYARÊ JÊHATÎ Û NÎŞTIMANPERWERÊ DILSOZ



Derheqa Kinyazè Îbrahîmda minra him dijware binivîsim, him jî hèsaye. Dijware, ji ber ku nava bendeke biçùkda mirov nikare temamîya şuxulvanîya wîye lîtèraturîè, lèktorîè (dersdarîè), xeysetè wîyî mirovhizîè, berbihèrîè, niştimanperwarîya wî bîne ber çeva. Hèsaye, ji ber ku ez wî rind nas dikim, şuxulvanîya wî bi kèrhatineva tijeye.

Niha zanyar, lîtèratùrzanèd kurd gelek hene. Lè sè şertè sereke hene, bi saya serè kîjana hinek ji wana wè derecèda pèşîya hevalbendèd xwe dikevin. Şertè pèşin ewe, ku, talant ù xebathizî xortanîèda pèşda tèn ù tu ji wede zùtir dibî ulmdar. Û ne ku tu ulm çawa pèşek xwera dibijèrî, lè ulm bere-bere, xwexwe dibe pèşekè te. Şertè duda ewe, ku ulmdarè bi nav ù deng xebata te qîlèmet dikin. Şertè sisîya-gava bingeha (hîmè, rikna) tèma dîsèrtasîa te ne ku tenè govekeke tèmakèye teng hildigre nava xwe, lè-govekeke fire.

Ev hersè derece jî bal Kinyazè Îbrahîm hene, bùne rewşa xeysetè wî, dîharbùna talant ù xebathizîya wî. Em bène ser şertè pèşin: dema Kinyaz şagirtè dibistanè bù, miqaledarekî rojnema "Rya teze" ù para radîoxeberdanèd bi zimanè kurdîyî herî aktîv bù. Dema înstîtùtèda hela xwendkar bù, îdî miqalèd zanyarî dinivîsî. Dibistan ù înstîtùt bi qîmetèd here başva temam kirin, dîploma xwendina bilinde sor sitand.

Şertè duda: em bîr ù bawarîèd çend zanyarèd bi nav ù deng bînin, ku derheqa Kinyazda gotine.

I. Sèkrètarè şèwra koordînasîone ulmî, ya akadèmîa komara Adirbècanèye zanyarî Tèmùr Axmèdov.

-Tèma dîsèrtasîa Kinyazè Îbrahîm Mîrzoève ulmî gerekè bè testîqkirinè, ji ber ku ew emekekî mezine nava dostîya lîtèratùraèd gelèd Yekîtî Sovîètda ù dostîya gelada.

2. Sedrè yekîtîya nivîskarèd Adirbècanè, akadèmîk, Mèrxasè xebata sosîalîstîè Mîrze Îbrahîmov.

-Ez çawa serokè Kinyazè Îbrahîmî ulmî wextè xweykirina dîsèrtasîa wîye kandîdatîè, gerekè bidme kivşè, ku ew, wekî zimanèd rùsî, ermenî, azirî, kurdî, tirkî rind zane ù serederî zimanèd farizî, erebî ù çend zimanèd gelèd Asîa Navîn dike, usa jî fikra wîye lîtèratùrzanîèye aqilbend, ku ewî dereca pevgirèdanèd lîtèratùra cimetada daye xebatè, mecalèd baş saz kirin seba wè yekè, ku pevgirèdanèd kurdaye lîtèratùrêye tevî gelèd bira derkevine meydaneke fire ù hèjayî guhdarîya lîtèratùrzanèd bi nav ù deng bin.

3. Sedrè yekîtîya nivîskarèd Ermenîstanè Vardgès Pètrosyan. (kovara "Adirbècan" №IO, I984s.

-Dereca pèşdabirina lîtèratùra adirbècanè li Ermenîstanè pire emekè lîtèratùrzan-kritîkè bi talant Kinyazè Îbrahîm Mîrzoev.

4. Akadèmîkè kurdî pèşin; sèkrètarè ulmîyî sereke, yè seridtîya Akadèmîa RSS Qazaxistanèye ulma Nadirè Kerem Nadîrov.

-Degme diqewime, ku mirovek tenè çend derecada jèhatîbe: him lîtèratùrzan ù kritîk, him jî bedew ù bejneke sibhanî lèbe, him wetenhiz ù milethiz, him jî camèr ù aqilbe. Kinyazè Îbrahîm xùt yekî usane.

5. Profèsorè kurd-Hecîè Cindî.

-Lènihèrandinèd Kinyazè Îbrahîm dereca tezeyz nava lîtèratùrzanîya meda. Ew matèrîalèd derheqa lîtèratùra kurdada derdixe erafè heatifaqîè.

Qîmetekî mezin dane xebata Kinyazè Îbrahîm usa jî profèsor, nivîskarè ermenîayî berbiçev Hèktor Riştùnî, akadèmîkè Akadèmîa Îraqèye zanyarî, serwèrè kabînèta înstîtùta Lènîngradèye Rohilatzanîèye kurdzanîè, ya Akadèmîa Yekîtî Sovîète zanyarî Qanatè Kurdo, rèktorè înstîtùta Yèrèvanèye pèdagogîèye ser navè Xaçatùr Abovyan, endam-miqaledarè Akadèmîa ulmèd pèdagogîè Lèmvèl Valèsyan ù yèd mayîn.

Em bène ser şertè sisîya ù sertestîèd kandîdatè ulmèd fîlologîè, dosènt Kinyazè Îbrahîm bînine ber çeva, tèma dîsèrtasîa kîjanî "Pevgirèdanèd kurda-azirîaye lîtèratùrîè" bù, ku sala 1978-a bi pirtùkeke cihè ronahî dît. Tèma dîsèrtasîa wîye doktorîè, ku çawa monografîa îdî bi

# ZIMANÊ MAKÎ

KEÇA KURD

ve çûye.Li gel pêşketina jiyana komelayetî bere bere peyv û gotinên nû peydabûne. ziman xetîreyek bû li rex jiyana komel,li gel jiyana koçerî folklorek koçerî çêbû,gotinên nû peydabûn,zozan û germiyan pez û hirî bi rengekî xweşik li goranî û stran û lawikên evîndarî da xuya bûn.Herweha li gel komelê çandinî da dîsa ziman gavek fireh avêt û folklorî jî xwe nû kir li gel jiyaneka çandinî nû peyvên pale û melûkêş û stranên paleyî û destar hêrkê dirustbûn.Jin jî wekî mêr belkî ji mêr pêtir beşdarî kir li pêşxistina ziman û dozîna peyvên taze.Parek mezin ya jina kurd heye li pêşxistina folklorî,bêguman guhastina folklorî ji rolekî bo rolekî din beşê mezin li ser destê jina kurd bû,çunkî zarok li ser destê dê mezin dibin ,li temenî du salî guh didin Lorandina daykê û li ser dengekî zîz û zimanekî şêrîn li dergoşê dixewre diçin. Dayik bi deyan rûdaw û serpêhat û karesata bi rêya çîrok û lawik û lorandin ji bo zarokan diguhêze.Eger em bêyn û dîroka Kurd û Kurdistanê binêrîn lêbikolîn dibînîn sedan hêrişên dagîrkerî ji hev bir nebûne,hêrişên şahê Îranê û sitema dewleta Osmanî û hatina misilmanî li Kurdistanê ta ku li dawîyê beşkirina Kurdistanê li jêr destê sê dewletên bêgane da,yanku ev gele bi sedan sal maye bindest,û herweha sê zimanê bêgane bi kotekî xwe berdane nav cergê Kurdistanê .Van dewletên bêgane bi xurtî hewil dane ku zimanê Kurdî ji bingeh bibirin,li gel vî qasî jî zimanê makî paraztîye û maye. Bawerîya min waye ku parêzgeha ziman û xundingeha ziman dê bûye.Dê li hundirê malê de hişt ziman bi vî rengî pak û rewan bimîne.Dêye kelepûr û folklor diparêze ji qûnaxek bo qûnaxeka din.Dêye zarokan fêr dike li ziman û leyistok û çîrok û mamik û pendan,dê li şîna mirîya li ya kuştiya li mal mîratî li şêwî bûna zarokan bi dengekî şewat dibêje û folklorekî reng reng pêşkêşdike.Herweha li henakirina bûka,li , guhastina bûka,li dîlana,li cenga û hemî rengên ahenga jina kurd folklorekî kevin li gel kirasekî nû pêşkêş dikir.Bi vî rengî zimanê kurdî û folklor parastî maye û zimanên bêgane nekarîya biserda zal bibe.

Lawazîya ziman erkê ser milê dayika xwendevane : Ji ber parçebûna Kurdistanê û damezrandina xwendingehan bi sê zimanên bêgane linav Kurdistanê,herweha xwendina zarokan û fêrbûna zimanê bêgane,sed mixabin zimanê me gelek lawaz bûye .Ev jî karesatek pir mezine, çunkî man û nemana milletan bi mana zimane,eger ziman çû hestê netewayetî jî pêra diçe û herweha ziman,kelepûr û folklorê gel jî winda dibe.Raste em bawerîn ku zimanê kurdî namire lê ev lawazî û tevlîbûna wişeyên bêgane zimanî berew nemanê dibin.Eger em nikarin yan jî em xwe naêşînin ji bo dîtina peyv û zaraveyyên taze ji bo parastina zimanê makî, ji bo me şerme bi taybetî xwendevanên kurd li cihê peyvên kurdî em peyvên biyanî bikar bînîn , xwendevanên me xwe rewşenbîr nabînin eger wişe û hevokên biyanî bikar nehînin. Bawerîya min waye : eger xwendevanê kurd li vê qûnaxê ageh li ziman û wêje û dîroka gelê xwe nebe ew ne roşenbîre.

Gelê kurd weke hemî gelên cîhanê dewlemende li folklor û peyvên kevin û nû lê mixabin em wan bikar na hînîn,ev jî erkê mêjûyîye li stuwê xwendevana û bi taybetî ser milê dayika xwendevane,eger dayik welatparêz û dilsoza gelê xwe be dikare zarokên kurd ji vê karesatê rizgar bike,çunkî dayik xwendingeha pêşî û pêşîye ji bo zarokan.Eger zarok ji biçûkî li hundirê malê zimanekî pak fêr bibe bi meznahî nikare devjê berde.Zarok naçare

Zarok naçare li xwendingehê peyvên zimanekî din fêrbibe û tê mal jî her wan peyvan bikar tîne,lê gava li hundirê malê da rêberek hebe zarokan ji wê yekê dûr dike.Bêguman ew rêber jî dayike ,ev diya ha eger hestekî neteweyî pêra hebe ew rênade zarokan ku peyvên zimanên din bikar bîne,dê jêra bêje li cihê "yazmîş"yan "Kîtabe" di zimanê me da"Nivîsandin " heye.Ev erkê dayikê ye ku divê ew zarokan agehdar bike ku zimanê xwe ji bîr nekin ji ber çûna xwendingeha çunkî pêtir ji çaxê dayikê û guftû goyên wê bi zarokan raye. Divê dê wa bike ku zarok têbigehe zimanê makî çend giring û bi bihaye li jiyana wan da. Bi vî awayî eger rêberek zana rêya rast şanî zarokan bide zarok zimanê xwendingehê jî fêr dibe û zimanê xwe jî jibîr nake ■

Şanogerîya sêyemîn:"Bûk û Xesû" ji nivîsandina Xoy.Gulcara Üsif rulê serekî têda lîst û bi rastî rulekî pir rind û hêja gêrand.Şanogerîya çaran:ji kakila folklorê kurdî bû bi navê:Xec û Siyamend".Şanogerîya pêncê:Ji berhemên nivîskarê Corcî Otya Yosyayanî bû bi navê "Madem Otombêl wernegerîyaye",naveroka wê bi van peyvan tê naskirin"Li dû wê kî wê genimî biçîne,kî wê erdî bikêle(bajô),kî wê nanî çê bike? Demek wê bê gund wê ji xelkê vala bimînin,hêjî nebûye direng,werin da em bizivirîn, madem Otombêl wernegerîyaye".Şanogerîya Şeşê: Ji nivîsandina nivîskarekî Ermenî bû binavê " Zavayê Biyanî".

Di sala I984ê da me I2 roja geryanek kir li Ermenistanê,me li bajêrên Alaxîr,Sinkîrî , Circirîsî,Bombî,Şamîranî,Fîrk û bajêrê Cimzînê çend şanogerî pêşkêş kirin.Di van bajêrada kurd piranîne.Ü me li Yêrîvanê jî şanogerîyek pêşkêş kir û pêşwazîyeka germ ji me kirin.

Herwisa emê herin devera Batomê ku 200 malên kurd têda dijîn,û bi helkeftina cejna Newrozê emê çend şanogerîyan pêşkêş bikîn.Ü emê herin Kazaxistanê jî.

Di demekî nêzîk da emê şanogerîya "Tayê darê" jî nivîsandina nivîskarê Sovêtî Xorî Fîzborc pêşkêş bikîn.Ü emê bixebitîn ji bo pêşkêş kirina şanogerîyên kurdî yên pêtir.Emê şanogerîya Mem û Zînê ji nivîsandina Şekoyê hesen jî pêşkêş bikîn.

Pirsa 6)Dixwazî çi ji kurdên li Kurdistanê ra bêjî,û bi taybetî ji bo xwendevanên rojnama Gel û govara Pêşeng ra?

Bersiv) Em ji birayên xweyên kurd hez dikîn ,û jêra dibêjîn canê me bi weraye,Em pir dixwazîn dengê azadîya gelê me bigehe me û em bibîstîn ku gelê me ji sitem û bindestîyê rizgarbûye,û damezrandina kurdistana yekbûyî bibînîn,vîn û daxwaza me ye wê rojê bibînîn û dixwazîn şanogerîyekê li ser wê rojê ,roja rizgarîya Kurdistanê ,çêbikîn.Dibêjim bijî gelê me,bijî welatê me,bijî xaka me.Em gelek bi hêvîne ku tevgera gelê me li ser pirogramekî xebatê yek bigre ,çunkî gelê me yeke û armanca me jî her yeke.

Rojnama Gel û Govara Pêşeng li cem me hatine nas kirin û em wan dixwînîn ,ew bi rastî daxwazên gelê me nîşan didin,û ewan em bi hev û du dayne naskirin.Em şanazîyê dikîn ku hûn di rêya wan da karûbar û xebatên meyên hunerî nasdikin.Li dawîyê daxwaza serketin û serfirazîyê ji bo xwendevanên Gel û Pêşengê dikim■

# JIN Û

Dê û komelên kevin:

Bê-guman jin,yanku dê, kevrê pêşî û bingehîye li pêkanîna jiyana komelayetî da.Çunkî jinê ji bo cara pêşî komelê binemalî damezrand li demekî ku jiyana mirova aloz û bi rengekî xurt serberdayî bû.Jiyana jin û mêranî bê sinor bû,herweha bav ne xuya bû, winda bû.Lêbelê dayikê karî zarokan li xwe bicivîne û wan xudî bike,li katê biçûkî zarok ser sîngê dê xudî dibûn bi şîrêmakî.Lê dîsa li meznahî dê zarokên xwe bi geya û galaş xudîdikirin.Dê bo cara yekê bîr li wê kir ku xwarnê ji geya û galaş çêbike.Pêşkêşkirina xwarnê ji destê dê hoyek pir giring bû ji bo peywendîya li navbera dê û zarokan.Li ser vî bincî komelê binemalî peydabû,herweha bav jî hate xuya kirin.Li wî demî mirovî bîr kir ku çekê kevirîn saz bike ji bo çinîna giya û kuştina dehba li nêçîrê,herweha ji bo berxwedanê li çaxê şer.Bav diçû nêçîrê lê nedikarî wek dê xwarina rojane peyda bike.Bi vî rengî dayikê dikarî fermanrewayîyê bike û serokatîya komelê binemalî bike, û dûvra li ser astekî firehtir serokatîya komelekî mezintir jî bike.Wa diyare ku jinê li navbera komelên kevnda destekî bilind hebûye li rêkxistina jiyaneka rêkûpêk û berew rasttir û baştir.Bi vî rengî çend qûnaxên pêşî bi destpêka jiyana mirov desthelatîya pîrekê maye.Lê paşê bêtihnî û lawazîya leşê jinê bêçar bû dar lidê mêr û jin hate jêr destelatîya wî de.Lê dîsa gera dê kêm nebû li jiyana komelayetî da bi taybetî li hundirî malê da.Jin karkerek bû, karê malê û karê çolê mil bi milê malxwê malê dikir li alîyekî û li alîyekî Jin jî ew peywendîyên bihêzên li navbera dê û zarokan her manû ta îro jî her maye.

Jin û folklor:

Piştî ku jiyana komelayetî bi rengekî fireh dest pêkirî û her milletek li herêmekê cihgîr bûy û zimanek bo xwe pêkanî,gelê kurd jî niştecê bû li Kurdistanê .Wekî her milletekî din ew jî bûn xwedî xak û ziman,Kevintirîn belge ji bo zimanê kurdî Avista ye pirtûka Zerdeşt pêxembere.Dîroka vê pirtûkê vedigere nêzîkî şeşsed sala berî zayînê.Ji wê çaxê ta îro ew ziman her maye û her berew pêş-

Jibilî Kerem em sê kes Endamîn di Yekîtîya Rojnamevanên Sovêtistanê da .Û me pir miroven zana hene wekî Farîzof,diktor û serokê kolîca aborîyê ya nêvdewletan li zankoya Mosko.Û em şanazîyê bi losya Elo dikîn pirofîsora harîkar di zankoya Tiblîsê da ,ew pispore di biyolocya da, û Lama Ravawî,kandîtaya zanyarî yên dîrokêye û niha lêkolîna dike û dinivîse li ser egerên dîrokîyên barkirina kurdan ji Kurdistana Tirkî bo Corcîya .Herwisa Kerîm Emoyêv jî kandîtaye di zanîn aborî da û sekretêrê karûbarên zanistîye di Enstîtuya aborî da li Corcîya .Hejî gotinê ye ku Kerîm mirovekî dilpak û hoşmende û gelekî zîreke.Jibilî wan jî me zana hene di matmatîkê da û di Fîzîkê da û pizîşkîyê û gelek warên dinên zanînê.Helbet van zanayan cihekî bilind di civaka me da heye û xwedî rêz û şanin,û em şanazîyê bi wana dikîn ,çunkî ew nûnerên gelê mene û herwisa ew kurdên dilsozin û welatparêzin,ji doza xwe hezdikin.

Pirsa 4)Kengî Şanoya Kurdî li Tiblîsê hatîye damezrandin ? Û çi li pêşîya damezrandina wê hate kirin?

Bersiv:Şanoya Kurdî li sala I974 ê da hate damezrandin .Divê bêjim ku demê ez hatîme Tiblîsê vîn û hezkirineka rastîn ji bo damezrandina Şanoya Kurdîhebû.Hinek kesan bîra vê çendê kiribûn wekî Kerem Naqoy yê ku hîngî di Enstîtuya Rojhilatnasîyê da li Corcîya kar dikir û serokê civata xortên kurda bû li civata rêveberîya bajarê Tiblîsê,û Şamil Murad ku hîngî xwendevan bû niha endazyare.Em gehiştîn bawerîyeka timam ku şano ji gelê me ra pêwîstîyek giringe ji bo parastina ziman û edebyat û kelepûrê wî û pêşxistina wan wekî gelên din yên li Tiblîsê dijîn. Me bi 5 salan Şanoya Kurdî saz kir.

Pirsa 5) Ta niha we çend şanogerî pêşkêş kirîne ?Û we çi piroje ji bo pêşerojê hene?

Bersi : Ji sala I974ê ve ,yanku ji demê damezrandina şanoya Kurdî li Tiblîs ve, me 6 şanogerî amade û pêşkêş kirîne...Ya yekan navê wê "Sinco Keça xwe dide şû" ji nivîsandina nivîskarê kurd Eskerî Boyk,eve şanogerîyeka komîdîye û ji civaka kurdewarîyê hatîye wergirtinê.Me ev şanogerîye di meha Gulanê da sala I980 pêşkêş kir,û bûwe kireka hunerîya giring di jiyana komara me da ,çunkî yekemîn şanogerîya kurdî bû ji awayê xweve di komarê da dihate pêşkêş kirin.Rojname û amîrên rojnamevanîyê çend rojan li pey hev derheqa wê dinivîsandin .Divê bibêm ku Emîndarê giştîyê Komîta Navînîya Partîya Komunîst a Corciya Edward Şînadze(niha Şalyarê Derveyê Sovêtistanê ye) li ser mîgrefonê di kongireya 26 ê a Partîya Komunîsta Sovêtistanê da qala damezrandina Şanoya Kurdî kir.

Di payiza I980 da me şanogerîya Çinar yanku Elî û Omer ,ji nivîsandina Giyorgî Xakayîf pêşkêş kir . Naveroka wê li ser pêwendîyên mirovane bi hevra û çawa divê mirov ji birayên xweyên mirov ra hez bike.



Di sala I98I ê da şahyaneyyên mezin û giring hatin gêrandin ji bo bîranîna 60 salîya damezrandina Komara Corcîya.Di van şahyana da sê rojan (I3-I4-I5/Avdarê)şahyane bi rojên çanda kurdî hate kirin,û di van rojan da tev amîrên rojnamevanîyê qala edebyat,Hozan û hunerê kurdî dikirin û tîpên kurdî dikirin û tîpên kurdî yên nemayişên folklorî û şanogerî pêşkêş kirin.Herwisa pir çavpêketin hatine kirinê li gel zana û edebyatzan û hunermendên kurd,û radyoya komarê pirogramên taybet bi kurda belav kirin û televizyonê jî filmê dekomêntê rengîn "Em Kurd" nîşanda û dîsa ev filme li sînemayên Mosko û hinek bajêrên din jî hate nîşandan. Kurdên Sovêtistanê ji Ermenistanê,Asya Navîn, Mosko û Lenîngiradê û bajêrên din jî ji bo van şahyana civîyabûn. Û Edward Şîfarnadze emîndarê Komîta Navînîya Partîya Komunîsta Corcîya jî di rojên çanda kurdî da pişkdar bû. Hîngî me jî herdu şanogerîyên xwe pêşkêş kirin.Paşî dan bi şanogerîya kurdî hate dan û nav li ser danîn Şanogerîya Gelêrî,û şanogerî hate xelat kirin jî. Niha em bi serokatîyên Sendîka ra li Corcîya dixebitîn ji bo careka din şahyane kirinê bi çanda kurdî.

# ÇAVPÊKETINEK LI GEL RÊVEBERÊ ŞANOYA KURDÎ LI BAJÊRÊ TIBLÎS

Di şahyana ( ahenga) Newroza îsal da li Mosko peyamnêrê rojnama Gel û Govara Pêşeng ê kak Murad Oso Çawirî,rêveberê şanoya kurdî ya bajarê Bedlîsê(paytextê komara Corcîya a Sovêtî) maskir û ev çavpêketine pêra kir:

Pirsa I) Xwezî tu ji me ra li ser kurdên li komara Corcîya Sovêtî bi axivî.


Bersiv:Em kurd di nav malbata gelên Sovêtistanê yên bira da dijîn,û piranîya me li komarên Ermenistanê û Corcîya bi cih dibîn. Lê kurd li Ezirbêcanê û hinek komarên Asya Navîn da jî hene.Derheqa Kurdên li Corcîya,bi awaye kî serekî li bajarê Bedlîsê dijîn.Û hejmara wan digehe nêzîkî 40 hezarî,û hejmara rûniştivanên Bidlîsê tevda dibe Yek milyon û 20 hezar kes.

Pirsa 2) Tu wekî rêveberê Şanoya Kurdî li Bidlîsê, dikarî xwe ji xwendevanên rojnama Gel û govara Pêşeng ra bidî nasandin?

Bersiv:Min xwendina navînî li bajêrê Bidlîsê timam kir û xwendina zankoyê ji li kolîca ziman û edebyatê li Ermenistanê.Ez deh sala li wizareta Çandeyîyê li Ermenistanê xebitîme wekî mezinê pişkênerên(mufetişên) şanoyên Ermenistanê .Û li sala I974ê ez hatim Bidlîsê û ez jî hingîve wekî peyamnêrê rojnama Corcîya Sovêtî dixebitim.Ez endamim di nîqaba rojnamevanên Sovêtistanê da .Min gelek nivîsar liser kurdên sovêtistanê di pir rojnaman da nivîsandîne,li ser jiyana çandeyî û civakîya kurdan. Û ez endamim di Partîya Komunîsta Sovêtî da li Bidlîsê.

Pirsa 3) Jibilî şanoyê kurda çi mafên xweyên din wergirtîne?

Bersiv:Her heftîyê roja şembî me I5 deqîqe programê radyoyê heye bi zimanê kurdî li radyoya Corcîya û navê programî eve:Rêveberîya nivîsandina programên kurdî li radyoya Corcîya Sovêtî.Û navê berpirsê programan jî Kerem mê Enqosîye.Van programan li sala I979ê destpêkirîye,û hêvîdarîn bikaribîn programên zimanê Kurdî her heftîyê çend caran belav bikîn,û me ev daxwaze ya bi awayekî resmî ji cihên bilind xastî. Me tîpeka hunerî jî heye navê wê Tîpa Stran û Reqasên Kurdî ye,tîpa me ji keç



û kurên kurd pêk tê.Pir nemayişên hunerî li Ermenistanê Pêşkêş kirîne û herwisa di şahyanên damezrandina Komara Corcîya da pişkdarî kir.Tîpa me di pir şahyane û programên Têlevizyonî da pişkdarî kirîye.Ev tîpe berî 20 salan hatîye çêkirin .

Derheqa pêşxistin û baştirkirina durimên kurda li Bidlîs divê bê gotin ku Komîta Navînîya Partîya Komunîst li Corcîya ya Sovêtî gelek pûte pê dike.Ji sala I974ê ve Komîta Navînî sê biryarên di vî warî da standîn,û ev her sê biryare taybetin bi pêşxistina jiyana gelê Kurd di hemî waran da ,nemaze di warê ziman û edebyatê û wergirtina kurda li hemî Enstîtuyên bilind li Komara Corcîya û pêşkêş kirina harîkarî û rê xoşkirinê ji wan ra bêy merînê li numreyên xwendevanan.Û li gor van biryaran jî para Nivîskarên Kurd li cem Yekîtîya Nivîskarên komara Corcîya hate damezrandin.Her ji kurdên Tiblîsê bi tenê (5) Nivîskarên kurd endamin di Yekîtîya Nivîskarên Sovêtistanê da .

Jibilî vana me (6) hunermendên şareza jî hene ku navdartirên wan evin:Besê Cawrî,endama Yekîtîya Hunermendên Sovêtistanê,Endwî Cil Dirgoşî,Lofî Cindî û Enton Mîrza .Hejî gotine ku Besê pişkdarî kirîye di pir nemayişan da li Tiblîsê û nemayişgehên ser astê Yekîtîya Sovêtistanê û nemayişên cîhanî jî da.Û herwisa me hejmareka qenc ji rojnamevanan ji heye,û li sala I984 ê yekî ji wana " Keremê Mihemed Elî nîşana Hêjayîyê di rojnamevanîyê da stand li ser astê Corciya.

# JÎ RAPORTA POLÊTÎKÎ YA PARTÎ DEMOKRATÎ GELÎ KURDISTAN



## NÊRÎNA ME LI SER REWŞA CÎHANÊ

Her wekî bi sedan milyona ji mirovên pêşverû em jî bawerîn kû dibînîn ku cîhan ji sermayedarîyê ber bi sosyalîzmê tê guhartinê , û cîhana sosyalîstî berdewam fireh dibe û sîstemê sosyalîstî her berew pêş diçe li ser hewl û têkoşînên İmperyalîzmê ra,ewên ku têne kirin bi rêya şerên maytêkirinê û pîlangêran dinên eşkera û dorgirtina aborî û şêwandinên rageyandinê yên berdewam û heya gef lêkirinê bi şerên Noklerî. Û berebabê niha ji şerê cîhanîyê duwê ve nehêlana rijîma kolonyalîzmêya dagîrker û xuya bûna bi deyan dewletên serbixweyên nû li Asya û Efrîqa û Emrîka latînî dîtin,bi awayekî ku jimara dewletan di civata Neteweyên Yekgirtî da duhindî wê lêhatî di vî demî da.Û Tevgerên Rizgarîxwazên Neteweyî yên cîhanê pir serketinên ramyarî û leşkerî û aborî yên mezinên bi destve anîn.Li ser cihê bûna astê tevgerên rizgarîxwaz di kûrî û firehî û pêşketinê da jî lê ewan teva serketinên bi destve anîn li ser kolonyalîzm û İmperyalîzmê. Û pir destketinên jê standîn bi xebata sext a çekdarî yan bi xebata aştî li dijî koloyalîzm û İmperyalîzmê ku bi deyan şer kirîn li dijî gelên her sê kîşweran ,da ku nekarin rizgarî û serxwebûna xwe bistînin û ji bo mêjîna xwîna wan. Û xebata tevgerên rizgarîxwazên nîştimanî tim harîkarî û piştevanîya rista sosyalîst û di pêşîya wê da Yekîtîya Sovêtistanî ya bi xweve dîtîn.Û her wisa piştevanîya Tevgera Karkerî ya cîhanê jî, nemaze destekên pêşeng.

Ji alîyekî din Tevgera Karkerî ya cihenê bi taybetî li welatên sermayedarî hevrikîyeka rojane dikin bi çîna sermayedar ra ji bona mafên xwe yên jiyarê û yên nîqabî û yên demokratîk,û ji bona bidestve anîna destelatdarîya ramyarî û guherandina sîstemê civakî.Û ji şerê cîhanî yê duwê ve pir destketin û mafên xwe yên pêkanîn, li ser hindê ra ku İmperyalîzm şerekî aborî û ramyarî dike ji bo kurt kirina wan destketinan.

Vêca ev her sê cûye:Rista Sosyalîstî, bi pêşengîya Yekîtîya Sovêtistanê,û Tevgera Rizgarîxwazîya Nîştimanî a cîhanê û Tevgera Karkerî li welatên Sermayedarî ewin hêza şoreşa cîhanê û li alîyekî dimînin û dixebitin jibo aştîya cîhanî û derîvekirina dewletan û rizgarîya nîştimanî û pêşveçûna civakî û sosyalîzmê ,herçende bi awayên cihê cihê.

Nîşana bingehîna îro ewe ku demê nehêlana sîstemê kolonyalîzma cîhanêye û demê xebatêye li dijî hemî awayên kolonyalîyê û nejadperestîyê ye û serketina tevgerên rizgarîxwaz û şoreşên Sosyalîstîye.

İmperyalîzma cîhanê jî,bi serokatîya Emrîka,û rijîmên paşverû û noker û nijadperest jî pêra li hember şoreşa cîhanî radiweste Û her çî bikare heya çandina binkên leşkerî û şandina şoreşên çewaşe û pîlangêrandinê li ser serxwebûna gelan û lêdana tevgerên rizgarîxwazên nîştimanî û gelêrî,û berdewambûna li ser berberekanêya çekdar kirinê û heya gef lêkirinê bi vêxistina şerê Noklerî yê cîhanî,ji bona parastina û berfireh kirina kedxwarîyê li ser gelên xwe û gelên cîhanê sêyem bi revandina dewlemendîyên wan û veguhastina wan bo bazarên ku ew bi dilê xwe birêve bibe.

Vêca eve dijayetîya serekîye di cîhanê da. Li ser hewildanên İmperyalîzmê û têkoşînên wê jî jibo şêwandin û şêlîkirina wê da ku rûyekê din bide pêşîy ji bona xebata gelan li dijî xwe"İmperyalîmê" sist bike.

Çi tevgereka rizgarîxwaz nikare ji dervey kênca vê hevrikîyê be.Û dikeve ser milên serokatîyên tevgera rizgarîxwaza gelê me û nemaze ser milên me wekî hêzeka pêşeng a xuya ku ev mesele bi kûrî bê xwendin û bi qencî û timamî bê fêmkirin,û agedarbîn li ser rêçikên nû dinavda da ku cihê tevgera xweya rizgarîxwaz tê da destnîşan bikîn û rolê wê di kira şoreşgêrîyê da bidîn xuya kirin û pêçêbûnên mezinên hêzên rizgarîxwaz û pêşverû û sosyalîzmê bi kar bînîn ji bo berjewendîya tevgera xwe ku ew jî wê rolê xwe pêtir û ji dil û bi awayekî berçav têda gêrîne nemaze di dehsalîya heştîyê da.

# SILAV LI GORÊ YULMAZ GUNAY



Eger mirov li dîroka gelê me binêre dibîne ku gelek mêrxas û navdarên mezinên ji kurda peydabûyn ku rolekî mezin di civaka kurdîda gêrandîn û nav û dengên wan li nav gelên cîhanê belavbûye ,nemaze di warê şerkarîyêda li hember dagîrkerên Kurdistanê û serkêşî û rêkxistina serhildan û şoreşên kurdî li dijî rijîmên xwînmêj û şovênî.Lê pir mixabin navdarên me di warê hunerî da pir hindikin ,eve jî ji ber hindêye ku berî niha tevgera gelê me pûte bi rolê hunerê kurdî nekirîye ji bo huşyar kirina gel û nasandina doza gelê meyê bindest bi gelên cîhanêra .Herçende ku hunermendên me pirin û karîn û pêçêbûnên wan jî hene,û eger ev karîn û pêçêbûne bihêne perwerdekirin û di cihê xweda bihêne bikar anîn,jibilî rolê giringê ku li nav rêzên cemawerîda digêrin,wê rûyê tevgera me û doza me bi qencî li cîhanê jî bidine nasîn.Çunkî gelê kurd xwedî kelepûr û folklorekî pir zengîne,xwedî siruştekî xoş û dilvekere û li ser hemîyê ra jî doza wî dozeka rewaye.Vêca eger hunermendê kurd van amîra bi hevra girê bide û tevger jî piştevanîyê li hunermendî bike û harîkarîya jêra pêşkêş bike wê çi çêbibe?

Eger em li xebata gelên bindestên cîhanê binêrîn çi ewên rizgarbûyn û çi ewên hêşta bindest dibînîn ku çawa rahiştîne tivengê wisa jî rahiştîne pênivîsî,rahiştîne tenbûrê û rehiştîne wênegirê"Kamîrê" û bi her rê û awayekî û li her derê xebitîne çi ji bo bêhêz kirina dijminên xwe û yan ji bo nasandina doza xwe bi gelên din ra . Lê gelê me bitenê di vî warî da pir şûnda maye û her wekî me li jor gotî hunermendên me yên li cîhanê navdar pir hindikin,herçende ku bi vê hindikîya xweve jî serketinên mezinên bi destve anîn û xizmetên mezin ji tevgera gelê xwe ra pêşkêş kirîne.Ji lewra divê giringîyeka mezin bi vî warî bête danê,û hunermendên ku ntir bi vî warî bête danê... bi rolekî giring radibin ji bo nasandina doza gelê xwe bi gelên cîhanê ra rêz û şan jêra bêne girtin,û bên handan û dilgerm kirin. Divê her welatparêzekî kurd rolê xwe bigêre nemaze roşenbîrên kurd û hêz û partîyên pêşverûyên kurdistanê.Divê rojnamecanîya kurdî giringîyeka pir mezin bide vî warî.Xeleka dî jî heye ku divê li vir bê gotin ew jî ku ax û ofîna milletîye ji bo wefata nivîskarekî û ofîna milletîye ji bo wefata filan nivîskarî yan bêvan hunermendî.Nivîskarê mezin Hejarê Mukrîyanî dibêje ku nivîskarên kurd di kune reşan da "kunên tarîk da" bi birsîtî dijîn kesek pirsa wan nake lê piştî mirina wan xelk sed civînên bîrhatinê û mêvanîya , jêra didin,û mamosta Hejar rast dibêje wekî nimûna li ser herdu nivîskarên meyên mezin rehmetîyê Cigerxwîn û Elaedîn Sicadî dîne,û nimûne pirin.

Xwendevanê hêja:Xasteka me ji van gotina bîr anîna yeksalîya wefata hunermendê [illegible]here mezinê kurd :filmçêker Yulmaz Gunay ,yê ku par"I984" li welatê xerîbîyê wefat kirî.Yulmaz Gunay yê şerkar,nivîskar,artîst û filmçêker,yulmazê şoreşgêr,yê ku di zîndanên faşîstan da derdên gelê xwe nivîsandîn,û yê ku li koçe û kolanên biyanîyan doza milletê xwe û derdên karker û gundîyên xwe kirîne wêneyên zînde"biruh" û nîşanî xelkê cîhanê dayn , yê ku kelepûrê gelê xwe û sirûştê welatê xwe û doza xwe ya pîroz bi hostayî û hunermendî bi hevra girêdayn û Ewrupa pê hejandî, û xelata zêrîn li ser standî . Yulmaz Gunay yê ku heya wefat kirî rojekê jî bêkar û bêdeng rûniniştî ,tim û her tim xebitî çi di çêkirina filman da yan beşdarî di damezrandina dezgahên çandeyî,wekî Enstîtuya Kurdî li Parîs.

Yulmaz gehiştibû germe germa berhemdanê û navdarîyê demê stêrka wî rijîyay û wefat kirî.

Vêca divê ku Yulmaz Gunay ji me tevan ra bibe hander bo pûte bi du alîya xebata çandeyî kirinê,yanku xebata çandeyî di nav rêzên şoreşê da,û xebata çandeyî li dervey welatî ji bo nasandina doza gelê Kurd bi cîhanê. Û divê em ji vî hunermendê navdar ra wefadar bîn û herçende ku ew mir jî pêwîste evîna wî û bîra wî di dilê her kurdekî welatparêz da bimîne û qet neyê ji bîr kirin çawa ew bûye stêreka geş û ketîye esmanê hunerê kurdî da■

byata kurdên parçeyên kurdistanê yên din age dar dibin?

Bersiva6)Kurdên Sovêtistanê nasîna xwe di dine edebyata milletên dinê bi zimanê Rosî û Ermenî,bitaybetî rosî pir dewlemende.Bi kurdên parçên dinve,bidaxa dilve ezê bêjim,nasîna me kême,ne wekî em naxwazîn lê kêm çap dibin.Demekî li Kurdistana Îraqê pir kitêb çap dibûn lê linavbera xwendewarên me û wan kitêba da perdek hebû ewjî tîpên Erebî û lehceya Soranî bûn.

Pirsyara 7)Zimanê kurdî niha bi du core tîpan tê nivîsandin Erebî û Latînî ,û hûn jî li Sovêtistanê bi tîpên Kîrîlîkî dinvîsînin, Bi dîtina we ev yeka han nabe metirsîyek li ser zimanê kurdî û yekbûna wî?

Bersiva 7 ) Pirsyara we ne temam rast bû we got bi sê core tîpan tê nivîsandin,we zimanê me cuda kir,emjî bi kurdî dinvîsîn.Vêca zimanê kurdî bi sê core tîpan tê nivîsandin. Helbet eve girêyeka pir mezine di rêya zimanê me da ku zimanê meyê edebyatê bigîje hev û em bixwînîn bona yekbûna ziman.Û eve nesûçê meye ku bi sê core tîpan tê nivîsandin , li Sovêtistanê ne tenê em bi tîpên Kîrîlî dinvîsîn hemî milletên Sovêtistanê wan tîpan bikar tînîn ,her yek li gorey sewtên zimanê xwe.Ne tîpên Kîrîlî û neyên Erebî û neyên latînî tîpên mene.Helbet eger kurd bi yekcore tîpan binvîsin gelek tişt wê hêsan bibin.Lê bi texmîna min tîp tucarî nabin metirsî li ser zimanî.Ziman bi çi tîpan bê nivîsandin çêdibe ,tenê bê nivîsandin û bi zimanê xwe be.Lê li ser yekbûna edebyatê dewra wî heyê ;û ev çetnayîye namîne eger em xwe jêra hazir bikîn û hînî van tîpan bibîn. Em gereke xwe pêşkêşî wê yekê bikîn wekî hînbibîn û zêde nivîsarê van tîpan bigihînîne hev,da ku zêde ji hev dûr nekevin.

Pirsyara 8) Niha gelek xortên kurd bi civandina folklorî mijûl dibin,te wekî folklorîstekî pispor çi şîret û amojgarî ji van xortan ra hene? Û folklorîst çawa pêk tê?

Bersiva 8) Ezê ji dawîya pirsyara we destpêkem,folklorîst ji diya xwe çênabe,yê ku zimanê xwe baş dizane û yê ku zimanê xwe di parêze û ji milletê xwe hez dike û xwendaye xwe nehêwişîne hez dike berhev bike wê bibe folklorîst.Lê çend tişt hene gereke bizanibe wekî bizanibe çi cara gereke lehca xeberê lehcêy,cimlêt lehcey,gotinên lehcey neguhêzin,çawa hatîye gotin wisa jî binvîsin û nebijêre eve başe eve xirabe eve xweşî min tê eve xweşî min nayê,çi ku cim'et sêwirandîye qîmeta her tiştî jî heye gerek bê nivîsarê.Folklornivîs gerek her dem bigere bipirse û tu caran nekeve şaşîyê ku here cîkî bibhîse û paşî bihê mala xwe rûnihê û çî ku bihîstîye me'na wî bi gorey xwestina xwe binivîse.Xwestina mine ku xwendayê kurd biçin gunda û bi gundîyan ra rûnin û her çi dikeve destê wan berev bikin.Eger ew cewahirên wisa bên berev kirinê xezîna me wê tomar be û kubarîya mebe.

Pirsyara 9) Hinek serokatîyên kurda pûte bi çekî tenê yan poletîkê tenê didin , bêy pûte dan bi çandê.Bi dîtina we şoreşeka serketî bê çandeka fireh û bilind dibe?

Bersiva 9) Dîtina min ser Tevgera Rizgarî-xwaza Kurdî ewe ku şerkarîya me bona milletê meye bona xwe parastina milletê meye wekî winda nebe serbilindbe û aza be û mafê xweyê netewayetî bistîne,ev mafe jî zimane, çanda wîye mafê aborîye û serbixweyîye.Gava rêyên din ji bo standina wan nebin şerê çekyê ji bona pêşda birina çanda milletî karekî neraste,çimkî em dibînîn çanda milletê me tê winda kirin û eger bihêlîn heya bigehîn merema xwe emê çanda xwe winda kîn.Roşenbîrên kurd ku Farsî,Erebî û Tirkî dizanin dikarin nivîsarên siyasî bi wan zimanan bixwînin gereke wan nivîsara wergerînin ser zimanê kurdî Xwestina mine ku jibilî pirtûk û govar û rojnameyên siyasî pirtûk û govarên çandî û edebî û hunerî jî hebin.Eve deha bingehekê mezine ku millet çavê xwe veke û zêde doza xwe fêm bike.

Pirsyara IO) Tu rolê govara Pêşeng û rojnama Gel çawa dibînî?

Bersiva IO) Birastî hemî jimarên herdu çapan jî,hem Gel û hem Pêşeng jî,gehiştin destê min û min bi dûr û dirêjî lê nihêrî.Ez Erebî nizanim lê bi harîkarîya hinek hevalan min li Gel nihêrî û min dît ku rojnameke rêkûpêke û di dereca rojnamevanîyê daye li ser ew babetên ku dinvîse,mizanî rojnameka jêhatîye û pêşverûye gereke ji alîyê xwendevanave bê qebûl kirin.Pêşeng jî birastî pêşenge, dilê min şad dibe ku bi herdu lehceya jî çap dibe,çunkî milletê me bi herdu lehcan xeberdide û herdu jî malê mene û gereke biparêzîn.

Bo lapere( 44 )

nîngiradê da para Kurdî heye,hevalên me Qenatê Kurdo,Ordîxanê Celîl,Zera Osif,Jênya Vasîlîva û Zaklîna Mosaelyan ser tarîx û Edebyata Kurdî dixebitin.Û li Mosko jî Kurdnasên eyan dixebitin wekî Lazarêv,Hesretyan û jîkalîna.Û li ser me maye ku zêdetir ji bo xizmeta milletê xwe bixebitîn.Li Mosko zimanzanekî pir eyan dixebite navê wî Çerkes Bakayêve pênc şeş pirtûkên wî hene.Herwisa Dîrokzanekî kevin bi navê Farîzov û Zimanzaneka din bi navê Roswan Sabolo.

Pirsyara 3) Ji pûte pêkirinên te bi dîrok û folklorê kurdî çi ji bo te xuyakir?Aya pir jê hatîye winda kirin?

Bersiv 3) Em dizanîn ku milletê me bê maf bûye nava sedsala da û dewletên ku em têda bûne netenê rê nedane milletê me bi azahî çanda xwe pêşda bibe belkî em talan kirine û rê qut kirîne ku em nasîya xwe bidîn çanda xwe û dîroka xwe.Folklora kurdî jîna kurdaye ew tarîxa meye û felsefa bîrûbawerî,zanîn û me'rîfeta milletê me di xwe da civandîye û bi devê kal û bava gehiştîye me.Berê Ode hebûne,êvara berev dibûn şevbihêrka xwe derbaskirîne bi stran û çîroka gotinê,û berpîyê odê tim zarok bûne,wan xortanîya xwe ji van stranên tarîxîyê kevnar hildane.Û em dizanîn ku niha ew ode nemane,milletê me serê xwe daye dû oxira azadkirina Kurdistanê,û folklor bêjî di quncikêda maye ew qas guhnadînê, birastî şerê me bona wê folklorêye,Folklor tarîx û hebûn û jîna meye,eger folklor û zimanê me bên hildanê şerê me qîmeta xwe gelek distiwa hinda dike.Netenê olmdar,gereke em tevda tarîx û folklora xwe biparêzîn , da ku bibe rênîş ji bona sîlsîleta ku tê,çimkî her millet bi tarîxa xweya derbazbûyîve heye û ser wî esasî roja tê çêdike. folklor di vî warî da kanîya awazaye û dewlemendîya zimane û bona edebyatê çavkanîke pir mezine.

Raste gelek navmeçûne û me gelek tişt winda kirîne,lêbelê gerek em çi bikîn ku vaya mayî xilaskîn wekî diwa rojê nekîn axîn û ofîn.

Pirsyara 4) Îro dîroka Kurdistanê bidestê dîroknivîsên şovênîst tê guhartin û veşartin,vêca li hember vê yekê gereke çi bê kirin?

Bersiva 4)Raste dîroknivîsên welatên ku em li bindestên wan naxwazin navê milletê me û welatê me hebe û dixwazin di serê meda bidin rûniştandin ku em tunene,lê em hene û ew nikarin bi zorê berê rojê bigrin.Hewil didin çanda me û tarîxa me û zimanê me winda bikin lê gava millet heye û em ser erdê xwene ew çicara nikarin wê bînin serê me.Tarîx bi xwe bi roja û meha û salan tê çêkirin û em wekî hedada(asinkara) dîroka xwe çêdikîn.Û eger em îro çi dibe nenivîsîn bona diwarojê em nehêlîn tarîxa meya îroyîn bona subê namîne wê nizanibin salên berê me gelek mêrxas hebûne, tarîxa meya berçav li Rojhelata Navîn û Dûr da hebûye lê me bidestê xwe nenivîsandîye,em niha li nav nivîsarên rojhilatnasên milletên din li tarîxa xwe digerîn.Îro lazime roşenbîrên kurd ku zimanên firengî dizanin herçi li ser kurda hatîye nivîsandin li sedsalîyên navîn û sersalîya nozde da ji kitêb,rojname û govaran yeko yeko wergerînin zimanê kurdî û di kitêba da çap bikin,û pêra jî divê dekomêntên tarîxî ku li ser kurda hebûne.û mektobên kurdên navdar û rismên wan û jiyana wana û jîna kurdaya kevnar bên berevkirin û bikin erşîv..û kitêb da ku ê li pey me tên ewqas wextê xwe winda nekin bona berhevkirinê. Pir pêwîste ku kurd bixwe tarîxa xwe binvîsin çunkî her yek bi çavê xwe li dinyayê dinêre.

Pirsyara 5) Hûn edebyata kurdîya îro çawa dibînin?

Bersiva 5) Edebyata kurdî niha bi du lehceya pêşda diçe,Soranî û Kurmancî.Û herdu bi tevayî gava dinêrîn şayîr têda zêdene, gava di edebyatê da şî'r zêde hikum bike ew edebyat bi texmîna min hê negehiştîye dereca bilind.Gava ku nivîsarên vekirî wekî roman û tiştên din cem me bên nivîsandin hîngê wê bibe dereceka teze.Kêmanîke pir mezine ku em guhnadîn ser wergerandina nimonên edebyata milletên pêşketî wekî Inglizî,Rosî,Firensî û Elmanî,nivîskarên wanên eyan hene mîna Şikispîr,Hogo,Balzak û Dîkniz û yên din hene,milletên din bi zimanê xwe dixwînin tenê milletê kurd bê beşe,xwestina mine ku nivîsarên vana bi kurdî jî hebin.Eger zimanê edebyatê ewqas bilinde ku dikare van kilasîka û navdara bi zimanê xwe wergerînî dizanî zimanê te bilind bûye û gehiştîye dereca zimanê wan. Pêwîste diramatorîya jî û şanogerî jî cem me zêdebe. û edebyata zaroka jî li cem me pir hindike.

Pirsyara 6)Kurdên Sovêtistanê çawa ji ede

qîmet dikirin.Di korsa duyê da mijî ser kurda rêfîrat çêdikir û ez pêşda diçûm,rojnameya zankoyê hebû min gotar li ser kurda zêde têda dinivîsîn.Wexta min zanko xilas kirî êdî min zanî bû xastina min çiye û rîya emrê min wê ber bi kû here.Berî xilaskirinê salekê ekadîmîkê kurdnas Orbîlî ji Lênîngiradê hatibû Êrîvanê li zankoyê civînek çêkir,û ez çûm cem min nasîna xwe da,pêhesîya bû ku ez dinvîsim û hezkirina min heye berew kurdnasîyê,wî mira got tu xilaskî ezê te bibim cem xwe espîrantûra wê li ser tarîxa milletê xwe bixwînî.Sala I959ê ez li Lînîngiradê bûm espîrant li ser tarîxa şerkarîya kurda rizgarîxwazîyê sala I850 - I880 ,û para duwê min sala I963 ê li Mosko derbazkir dîfa'ê. Sala I964 ê ez bûme xebatçî li Ekadîmîya Ermenistanê. Hêşta em telebe bûn ez û birayê xwe Ordîxan diçûn gunda û me çîrokên biçûk û gotinên biçûk dicivandin,Ordîxan Fîlolog bû zêde pêşda diçû,sala I955ê pêlweşa(êzgehê)kurdî vebû û bavê min bû serokê wê û Ordîxan jî têda xeber dida.Vêca dengbêj,zurneçî û defçî li mala me dicivîn û pirova dikirin û min û Ordîxan jî têkstên wan ji pêlweşê ra dinivîsandin.Nêzîkbûn û hezkirina me ji folklorîrî ji vê yekê peydabûye.Em diçûn gunda û me tev destê xwe tiştên hûrik dinivîsandin û bere bere hezkirina me jî pêşda diçû û diha xemdarîya me zêde dibû û qîmetkirina folklorî da, diha zêde dibû,çimkî li Lînîngiradê me nasîya xwe da folklorê milletên dinê û me dît qîmeta wî çiqas bilinde xizmeta wî bona diwarojê çiqas mezine,û di wî warî da ji xeynî Hacî Cindî û hinekî Emînê Evdal kes mijûl nedibû .Folklor deryaye ne yek û ne sed û ne hezar kes gereke mijûl bibin,lewma mejî hêdî hêdî dest bi nivîsandinê kir û heya niha em di wî warî da dixebitîn.

Derheqa berhemên min jî, min li sala I966ê parçek ji disîrtasyona xwe ,a diktorîyê ku min nivîsîbû,li ser Obeydullahê Nihrî, rabûna wî li sala I880,min kire kitêb û bi rosî li Moskovayê çapkir,û gava ez vegeryaym Êrîvanê jî ez ser parçeka dinê xebitîm bi navê Kurdên Împeratorîya Osmanlî,sala I850ê bi rabûna Yezdanşêr li çaxê herba Qirim,ew jî bû kitêb û sala I972 ê kete çapê û derket .


Min û Ordîxan li Moskovayê kitêbek bi kurdî û rosî çap kir bi navê Metelok û Meselên Cimeta Kurda,hevalên Kurd li Ewrupa(li Viyenna) para kurdî ji wê kitêbê careka din çap kir . Hêdî hêdî min û Ordîxan destpêkir tevayî kitêb çêkirin ji wana Gulçin,Zargotina Kurda bona mektebvana,Gulançk Zêrîn.Min li sala I974ê kitêbek bi navê Çîrokên Cimeta Kurda Paşî min û Ordîxan kitêbek bi tîpên latînî û di du cildada çapkir binavê Zargotina Kurda cildê yekê sala I978ê û cildê duyê sala I982 ê li Êrîvanê çapbûn. Sala I982ê dema ez bi mêvanî hatîm Sûrîya ez li Çiyayê Kirmênc"Kurdaxê",Qamişloyê,Amodê,Hesekê,Dêrikê,Endîwerê û Tirbesipîyê gerîyam û min gelek nimûnên zargotinê nivîsandin û herwisajî min gelek beyt û qewlên Êzdîya nivîsandin. Min kitêbek jî parçe parçe bi rosî belav kir û niha hatîye wergerandin bi zimanê Erebî û bûye kitêbek binavê"Nehzet el-ekrad el-seqafîye"wel qewmîye" . Min kitêbeka din amadekirîye li ser Ola Êzdîya û Qewl û Beytên wana bi şêweyekî zanistî û ez ser wan tişta dinêrim çawa cewahir wekî ji sedsala I2 heta sedsala I4 ê hatîne sêwrandinê.Û niha min destpêkirîye li ser jîna Kurdaya aborî û civakî di sedsalîya I9 ê da bi resmî dixebitim.

Pirsyara 2) Dixwazîn li ser xebata çandeyî a kurdê Sovêtistanê bi giştî bipeyvî?

Bersiva2) Li Sovêtistanê nêzîkî 300 hezar kurd hene,û zêde zêde li cimhorîyeta Ermenistanê,Corcîya hene û li Azirbêcanê jî kurd hene û li cimhorîyetên Asya Navîn da jî,li Tirkumênya,Qazaxistanê hene.Dereca çanda kurdên Sovêtistanê berçave,pirtûkên kurdî li Sovêtistanê çap dibin,Pêlweşa Êrîvanê para kurdî heye rojê kajmêrek û nîvê"sietek û nîva"bi kurdî li ser edebyat û tarîx û çanda kurdî xeber didê

Rojnama meya kurdî heye Rya Teze li sala I930 ê damezrandîye organa Partîya Komunîsta Ermenistanê û Civata Bilinda Ermênîyaye,heftîyê du cara derdikeve.Li Ekadîmya Ermenistanê da li Enstîtuya Rojhilatnasîyê para Kurdî heye.Em deh mirov li wê derê dixebitîn heşt jê kurdin,dinav me da edebyatzan,zimanzan,folklorîs û êtnograf hene û em bi Rosî û Ermenî û Kurdî dinivîsîn û pirtûka çap dikîn,helbestvanê me pirin û tifaqa"Yekîtîya" wan heye .Dibistanên kurdî li gişt gundan hene.Tifaqa Cahilên Kurda"Yekîtîya Lawên Kurd" li Komsmolê heye .Hersal li Newrozê em şahyana dirust dikîn.Giropên stranvana û tembûrvana û zurneçîya hene.Li Enstîtuyên Mosko û Le

# DÎROKZAN Û FOLKLORÎSTÊ KURDÊ SOVÊTISTANÊ CELÎLÊ CELÎL JI PÊŞENGÊ RA DIPEYVE:



Jiyana min perçeke ji emrê Sovêtistanê.Û gereke jiyana min bi meşa jiyana Kurdên Sovêtistanêve bê girêdan,û ew meş destpêbûye bi şoreşa Oktoberê ,Çimkî jiyana her kesî girêdayî wî wez'îye ku li dora wî diqewime eger bi riya aborî yan civakî yan çandî be,ew gişt di jiyana mirovîda wek neynikê tên xuyanê. Kurdên Sovêtistanê bi esas mişextin(mihacirin).Berî Şoreşa Oktoberê qeza Qersê dikefte nava Rosya,li wê derê gelek Kurd hebûn û danûstandinên wan bi Kurdên Tirkiyayê ra hebûn.Piştî şerê cîhanîyê yekê Qers kete bin destê Romê(Tirkî),û gelek zor li Kurda kir, û dest bi kuştina wan kir,zêda kurdên Êzdî, çimkî di wê kuştinê da dewreka mezin dîn dilîst.Û sala I9I8ê leşkerê Romê gehişte ser erdê Ermenistanê û dora Elegezê û destbi kuştina Kurdan kir,pir ji wan berê ji qersê revîbûn û li wir hêwirîbûn.Diya min û bavê min jî ji Qizil Qule ne ji nehya Dîgorê li qeza Qersê,pir zulm û zor li ser kurda bû û gelek jê hatin kuştin û gelek ji birsa û sirrê mirin,tirsa romê di dilê kurda da bû.Bavê min bi emrê xweve nêzîkî IO salî bû,gilî dike û dibêje:Mê xwe di nava kortan da vedişart li çiya da ku rom me nebînin.Rom vekişîya û paşê çend cara ser Ermenistanê dîsa digirt,dihatin ji êtîmxana û sêwîxana zaroyên Kurdên Êzdî berev dikirin û Çîman(Şemendefir)tijî dikirin û dibirin,û dibêjin ew dikuştin,wexta dora bavê min tê bavê min ji çîmanê xwe davêje û direve,ermenî wî vedişêrin di êtîmxanekê da.û navê wî diguherin.Heta Sovêt di Ermenistanê da hatî çêkirin,Zaroyên êtîm û sêwî ra Sovêt êtîmxane çê dike û zaroya gişka hiltîne û dide xwendinê.Diya min jî,ku li sala I9I3 ê ji diya xwe bûye, di êtîmxanê da bûye.Û diya min û bavê min xwendina xweya ewil di êtîmxanê da standîye.

Li salên 30 ê da Têxnîkom çêbûn û li ser pêşdaçûna milletan pir xebat hatekirin, çimkî pir cim'et hebûn herfên wan tunebûn û kulturê wan nizim bû.Kurd jî mişextbûn xudanên tiştekî nebûn,ji refên xwe qetîyabûn,bûna Kurda jî wisa difikirîn herfa çêkin û edebyatê saz kin.Sala I929 ê herfên Elîfbaya Kurdî hatin hîmdanîn,ew elîfba yekî Asorî xêrxwaze kî milletê me bi navê İshaq Maragulo saz kirin ewî kurdî rind zanî bû.Civîneka zimanzana hebû bona komeka hemî milletan û çêkirina tîpan bi latînî,tîpên kurdî jî bûne rismî û kitêbên dersê çêkirin bona mektebên kurdan paşê xortên kurda ku hinek ji xwendinê dizanîn berev bûn li Erîvanê destpêkirin kitêbên dersê çêkirinê.Sala I930 ê Riya Teze hate vekirin,sala I93I ê Tîxnîkoma Kurda li Erîvanê bona Kurdên Azirbêcanê,Corcîya û Ermenistanê vebû.Wî çaxî bavê min li leşkerîyê bû,li Bako,û xwendina wîya ewelî hebû yanî hîmdanîna edebyata kurdî bi wana destpêbûye û bi alîkarîya wana xortên kurda civandîne û kadroyên millî çêkirîne,çimkî edebyat û keltura çand û rewşenbîrî nava her milletîda eger kadroyê xwe tunebin pêşda naçe,bi alîkarîya wan heval û alîkarîya hikumetê kadrê kurda hatin peyda kirinê.Bavê min bû dîrêktorê Têxnîkoma kurda,û du sala li wir xebitî ,paşî çapxana kurdî vekirin û bavê min guhastin wê derê û heta sala I937ê li wê derê ma.Ez li meha Novamberê sala I936 ê hatîme dinê.Bîra min tê destpêka hêrişa Elemanîya nazî bo ser Sovêtistanê û bîra min tê çawa milletên Sovêtistanê hemî rabûbûn û xizmet dikirin ji bona welatparêzîyê.Dehsalî min xilaskir mektęba ermenîya ,li Êrîvanê mekteba Kurdî tunebû çimkî em li Êrîvanê pir hindik bûn û kurdî li malda bi destê bavê xwe hîn bûn.Min da Faklulêta Tarîxê û ez qebûl bûm,li cem me giropên xwendevanan hene ku ber bi ilm û zanîn dixwazin herin û civînên wan hene û salê carekê konfirans çêdibûn û pirofîsorên mejî dicivîn

bawerîya xwe pê anîbû lê xelkî bawerî pêneanî.

Li astê Kurdistanê ,li Kurdistanê giriftarî tim duqatin.Ji her sê yan çar kurdan yekê jê mişext kirî,ji deverên sinorî û deverên pitrolê û deştê barkirîn.Çarêk milyon mirovên ji welatî derxistîn bi bihana ku ev kese di eslê xweda iranîne.Jibilî hemî şêweyên terorê yên duqat li ser xelkê Kurdistanê,çunkî Kurdistan xeleka lawaze di Iraqêda û senahîtire ji bo çewsandin û qirkirinê.

Eve çarêka sedsalaye tim hêrişeka şovênî û nijadperestî li ser Kurdistanê berdewame, nêrişe li ser terr û hişka,nêrişeka leşkerî û aborî û ramyarî û rageyandinîye.Û şerê Iranê û Iraqê jî karesatên xwe li ser Kurdistana Iraqê û ya Iranê dibarîne.Lê ya ku bi rastî cihê daxêye û her wisa jî şayanî heneкaye gelek caran hêzên Kurd jî şerê hev dikin her wekî ew şerên me li jor gotîn hêşta kêmin.

Destelatdarîya faşîst û nijadperest hunerên nû anîne jibo dijayetîyê li gel Tevgera Rizgarîxwaza Kurdî ya ku qet nayê jinavbirin,firehtir ji berê dest bi girtina xudîyên şoreşgera kir û dorgirtina aborî li ser gund û deverên rizgar kirî mikumtir kir daku xelkî naçar bike biçine wan ordîgahên ku rijîmê bi zorî ji kurda ra avakirin.Û herwisa zorê li xelkî dikin da biçin nav agirê "Qadisîye"ya Seddam yan çekhelgirtinê li dijî birayên xweyên kurd,û navê "Leşkerê Selaheddîn" li ser wan rakirîye û niha jêra dibêjin"Efwac Xefîfe:Betalyonên Sivik" lê navê ku tim li ser wan dimîne her Caş e yanku xwefiroş.Biherhal jimara wan kesên ku destelatdarîyê karî bi van şêweyên Seddamîyên bi çepûçûr bixapîne çend carî zêtire ji jimara wan caşên berê,herçende bûne caşîya wan ne ji bawerîyêye û kênca wan ya şerkarîyê li dijî xebata çekdarî jî hindike,ev xebata milletê me ji bo parastina hebûna xwe û ji bo bidestanîna mafên xwe dike.

Kêm fermanrewayên Iraqê xudî rezamendîya gelêrî bûn,lê mirov dikare bêje ev kerb û kîna li dijî Seddam û rijîm û partî û damûdezgahên wî di dilê Iraqîyan da li dijî hemî rijîmên berê tevan peyda nebûyne.


Û ji bo Imperyalîzm û Zayonîzmê û Kevneperestan ev şere neyî şête lê gelekî aqilaneye û tekbîra hemîyê bi hûrî hatîye kirinê û gelek armancên wan pêk anîne û gelekên dî jî wê pêk bihên,her du welatên şerker şirr û mandîbûne û gencîneyên welatên pîşesaz te jî sermaye bûn ji firoştina çek û pêwîstîyên şerî ,û hebûneka leşkerîya xwecih ji Emrîka û Ingiltera û Firensa ra çêbû li dewrûberên gola Farsî da "Xelîcê Farsî".

Hêşta renge şer berfirehtir jî bibe û hinek welatên din yên golavî"Xelîcî" bide pêşîya xwe û heya deravê Hurmiz bête daxistin,û hinek dewletên dinên wekî Emrîka mayê xwe tê bikin ku tim vê çendê xuya dikin.

Lê milletê Iraqê û hêzên wî yên niştimanparêz wê çawa hemberîyê kin bi şerê Seddam ra û berhemên wê yên wêranker û terora faşistî û xwînrêj û şerê nijadperestî û şovênî li dijî gelê Kurd?

Bi nêrîna me,û piranî jî wisa dibînin , destpêka karî yekîtîya xebatkaraneye ji hêzên niştimanparêz û demokratîkên Iraqî tevan ra(bi Kurd û Ereb ve) û yên netewayetî û Islamî jî.

Em di Partîya Demokratîka Gelê Kurdistanê da dibînîn ku xebat ji bona helweşandina rijîma faşîst û nijadperest û xwînrêj girêdaye bi xebatê ra ji bona rawestandina şerî bi şêweyekî timam û çarenûsî.Bi rastî em bi rawestandina şerî rayne li ser bingehê aştîyane û demokratîk û dadmend bêy biservekirin û bêy dûvenan û mafê gelê Iraqê jibo helbijartina wê rijîmê yaku wî divê .Lê em bi bawerîn ku ev tişte pêk nayê bêy helweşandina faşîstîya Seddamî .Ji lewra xebat ji bona rawestandina şerî bihevra li gel xebatê ji bona helweşandina rijîmê birêve diçe û ji bona pêkanîna rijîmeka niştimanî ku demokrasîyê ji bo Iraqê û mafên netewayetîyên rewa ji gelê Kurd ra.



Siudîye û Kiwêt hew ji pêş Îraqê ve difroşin Û OPK di civîna xweya dawîyê da biryar daye ku para hîç welatekî zêde neketin ,û bazara cîhanî jî ya pire ji pitrolê .Birastî renge şandina pitrola Îraqê hindek zêdetir bibe , lê çareser kirina darayî û aborîyê li Îraqê yekemîn tişt ya bi rawestandina şerîve girê dayîye.Û li ser hindê ra çi ji çaresêrkirinê niha diyar nîneveca eger li destpêka IO salên I990 ê da .

Li astê netewayetî,bêhna rijîmê bi hindê nehat ku Îraq bi hêzên xweyên mezinve ji pergala hemberîya dijminê zayonî û piştevanên wêyên Împeryalîstî,ku Îraq ji wan welataye yên ku kar dikine ser terazîya . hêzan li devera me da belê hêzên Îranî jî dûr xistin,ku piştî şoreşa Îranî amadeyî û dilgermîya xwe xuya kirî li dijî zayonîzmê û Împeryalîzma Emrîkî.

Û serokên rijîmê dest bi devxoşîyan kirin jibo Îsrayîl daku Emrîka ji xwe razî bikin,Seddam jî xuya kir ku divê hêmnayîya Îsrayîl bihête peydakirin,û yekî jî got Îraq dewleteka hemberîyê nîne yanku Îraqa Seddam li hember Îsrayîl ranaweste.Bere bere harîkarîyên rijîmê û welatên Împeryalîstî pêtir dibin û di hemî waran da heya digehîte harîkarîya parastina rijîmê bi parastina Împeryalîzmê ra,û rijîm rolekî taybetî digêre di dijminahîyê li gel hêzên tevgera rizgarîxwaza nîştimanîya Erebî ji hukmetan û partîyan û her wisa li gel tevgerên rizgarîxwazên cîhanî jî bi çek û pare û rageyandin,û çêkirina rêkxistinên parçebûyî yên paşveru.Û rijîm tim hewil dide kiryarên xwe bi perdeyeka stûr ji piropagenda dîmagokî û mîkafîlî veşêrîtin,û di vî karî da jî ya şarezaye.

Herçend şer dirêjtir bibe pêwîstîya rijîmê bi

Herçend şer dirêjtir bibe pêwîstîyên rijîmê yên cengî ji Împeryalîzm û kevneperestan pêtir lêtên,û serçemandin li hember wan û zayonîsmê zêdetir lêdihên .

Nabe çi cara mirov vê rijîma faşîs û partîya wê ya Efleqî ji teror û qirkirinê dûr û cuda bike di çi deman da.Nazim Gizar ji Ehmed Hesen Bekir ra got"Min 2006 welatparêzên kuştîn da ku hûn hikum bikin".Lê teror duqat pêtir lêhat bi şerî ra û bêhîvîbûnê ji serketinê tîrbarankirin li gîxa şerî û tabûtên ku li ser nivîsandîn "Tirsinok" yên bûyne karekî asayî ,û jehirdana dijmina û mirovên navdarên wekî Xêdan û Emmaş û Kemalî û yên din ya bûye tiştekî eşkera.Û şiken ceya dijwar yaku bi serê geleka hatî li sê daredan liçav wê karekî demokratîk, û karê din yê kevin û yê nû girtina xudîyên şoreşgêra yaku li dijî her şoreşgêrekî û li dijî her kesê ku ji agirê dozexa Qadisîya Seddam revî tê kirin,dibe jimara xudîya yek ya sed ya hezar jî bin,em hemî karesata malbata Hekîm dizanîn,û heşt hezar kurd berî sê salaye hatîne girtin û çihê sersurmanêye(Ecîbe) ku heya niha kesê nezanîye li kîderêne û heya hinek sazumanên cîhanî jî,çawa heşt hezar mirov li nav welatekî wekî Îraqê biçûk da winda dibin.... Ma gelo rijîma Pînoşê li çav rijîma seddam komareka Eflatonî nîne?

Heya çend salên berî niha bawerîyek hebû digot faşîzm li welatên berew geşbûnê da tuneye û neve destelatdarîya olîgarişîya darayîye li hinek welatên sermayedarîyên pêşketî wekî rijîma Hêtler û Mosolînî û Firanko û yên din ,lê jiber mişebûna diyardeyên faşistî û awayên wan yên qirkirinê yên ku di van salên dawîyê da pêtirbûyn û Împeryalîzm piştevanîyê lê dike wekî rijîmên Sedam û Evrin û Pînoşê.Lew peydabûna faşîzmê li welatên cîhana sêyem jî bû tiştekî asayî herçende ku rewiştên xweyên taybetî hene , û giringtirîn rewiştê wana ewe ku faşîzmeka paşvemayî û dûvike.

Mirov dikare bêje rijîma Seddam ya ku di faşîstîyê da niqom bûyî di warê kuştin û teror û jihev perçekirinê da rewşeka dirust kirî ku çi cara bi serê Îraqê nehatîye,Kurd wê rijîmê wekî rijîmeka Şovênîst û nijadperest dinasin,Şî'e wekî destelatdarîyeka tayifegerîya rastîn lê dinêrin,Sinî jî dibînin ku rijîmeka deverkîye ji Tikrît,Xudê harîkarê kêmayetîyên netewayetî û ayinî be.Heya li Tikrît jî çi malbatên navdar ji destê wê rizgar nebûne,ka Herdan û Bekir û kurê wî û zavayê wî û kanê yên din?? Helbet jimara wan rêberên ku ji partîya xwe bi xwe kuştîn pêtirin ji ew kesên ji partîyên din tevan kuştîn,jiber ku ewan rêberên partîya wî

# ŞERÊ ÎRANÊ Û ÎRAQÊ KETE SALA XWE YA 6Ê

Li roja 22/9/I985 ê şerê Iranê û Iraqê kete sala pêncê.Ev şerê şêtane û dijminkarî yê ku Seddam destpêkirî heya niha dirêjtire ji şerê cîhanîyê yekem û ji şerê Elmanîya nazî û Yekîtîya Sovêtistanê di şerê cîhanîyê duwê.

Her wekî xuyaye rijîma faşîstîya Seddam di alozîyeka kûr da dijît ji alîyên nîştimanî û gelêrî û netewayetîve,ew alozî be destpêka şerî kûrtir lêhatin
stpêkirina şerî kûrtir lêhatin,û pêra giriftarîyên gelê Iraqê jî bi Kurd û Ereb û kêmayetîyên netewayetîve pêtir lêhatin.

Li rast axa welatî,çi caran wekî îro axa İraqê toşî metirsîya û destdirêjîya nebûye,sinorên Iraqê-Siudîyê û Iraqê-Erdenê bi dilxaza şahên wan hatine rastvekirin.Û ser ji bo Tirkî hate çemandin di daxwaza wê da ji bo rastvekirina sinoran,bi wê bihanê ku sinor bi hûrî nehatîne nîşan kirin,lê em dizanîn ku ew sinor zor bi hûrî hatîne nîşankirinçunkî em pir caran li ser wan sinoran birêve çûyne,û ji layekî din ve jî alîyekî sinorî li jêr destê hêzên Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk daye,vêca eve daxwazeka dine ji bo dijminkarîyeka din li hember hêzên Bereyê Nîştimanîyê Demokratîk yên ku sinorî diparêzin,û ji bo veqetandina parçeka axa İraqê ye.Û heya şer hebe metirsî jî li ser axa İraqê wê her hebin,û herwisa gefên Tirkî û temaîyên wê yên berfirehkirinê herê bimînin.

Li rast ziyanên şerî ,raportên hûrik jimara qurbanîyên herdu gelên cîran 700 hezar kuştî texmîn dikin,yanku pêtir ji kuştîyên Ingiltera û Emrîka di şerê cîhanîyê duwê teve da ,û eve bi tenê têra dike ku mirov mezinîya karesata vî şerî nîşan bike,û eger girtî û birîndara jî bijmêrîn jimara qurbanîya ji yek milyon mirovan pêtir dibe.Û yek milyon İraqî jî niha di hêzên çekdardane bi Supayê nemillî(Ceyşê laşe'bî)ve û Betalyonên Sivik(Efwac xefîfe) ku niha bûye rnavekî nû ji caşa ra.Û li gorey rojnamevanîya rijîmê bixwè jimara karkerên biyanî li İraqê ji I/5 milyona pêtire,û xuyaye ev rewşe çi fîşarên civakî û çandeyî û şaristanî bi xwera tîne,û rijîm naçar bûye yasayên taybetî danê ji bo parastina biyanîyan.Û ji encamên şerî peydabûna perçebûna civakî û belavbûna malovanan(Malbatan)û pêtir bûna hêtîm û bêwejina.

Herçend rijîmê li destpêka şerî hewil da vî şerî wekî seyranekê xuya bike bi ne înandina fîşara aborî bo ser xelkî û pirkirina bazarê ji tiştên firengî,lê ew roj bi bayê şerî ra çûn çunkî tengavîyeka aborîya rastîn qirka xelkîya girtî,giranî ya ji duqatîyê pêtir lêhatî di van sê salên borî da li goreyî serjimêrîyên resmî bêy zêdebûna destmizd(Kirîya karî) û ratiba,li gel zêdebûna xwîka(Zerîbe)şerî û pare jêstandinê bi zorî.Û nemana pêwîstîyên jiyanê di bazarê da û peydabûna bazara reş yêt bûyne tiştekî asayî .

Li rast rewşa darayî, şerî hemî paşkeftên İraqê (darayîya ku ji xwera civandî) daqirçandinku berî şerî gehiştîne 35 milyard dolara jibilî bayê yek yan du milyard dolara ji darayîyên ku nayên veguhaztin.

Li gorey serçaveyên agedar qerên biyanîya li ser İraqê gehiştine 55 milyard dolaran û hinek digehînine 80 milyard dolara jî , û xuyaye ku ev qere wê berdewambin û her salê bi kêmî 5 milyard dolar wê bêne ser qeran, û ser ew sûdê ku têtê ser qerên kevin ra. Vêca eger mirov vana û wan wêranîyên ku bi şerê dezgahên aborî hatîn û daxwaza berdîla(Te'wîzata) şerî bîne pêşçavên xwe wê xuya bibe ku netenê li halê hazir belkî paşeroja aborîya İraqê jî di metirsîyê daye jiber "Qadisîye " ya Seddam ya şûm.

Li barey ew piropakendeyên rijîmê û dezgahên rageyandin yên İmperyalîstî û kevneperestî belavkirîn li ser borîya pitrolê ya ku digehîte ser îstgehên pitrola Siudîyê û çaresekirina alozîyên aborîya İraqê,eve ji gure gureka rageyandinî pêve tiştek nebû çunkî Siudîyê û Kiwêt rojê 370 hezar bermîlên pitrolê pêş İraqêve difiroştin li ser hisaba para İraqê ya ku OPK jêra danay yanku ewa İraqê difiroşt û ya ku ji pêş wêve dihate firoştin hemî bi qasî hindê bû ku OPK jêra danandî, û herdem pitrola İraqê di wê borîyê da çû êdî

# SERHIDANA GEL LI BAJÊRÊN KURDISTANÊ

Piştî ku xelkê qaremanê gund û bajêrên kurdistanê,li nîva duyê ji meha Çirya Pêşîn a borî da, li hember ramyarîyên şovênî û terorîstîyên hikometê,û şerê wêyê wêranker sekinî rijîma faşîst û dîktator hêrişên xweyên xwînrêjîyê tundtir lêkirin li ser xelkê Kurdistanê.Li pey kuştina du firokevanan li nav bajêrê Suleymanîyê da faşîstan dest bi hêrişeka terorîstî kir li hember xelkê bajêrî,ew hêriş bûye eger hindê ku xelkî mangirtina giştî diyarkir û dest bi xwepêşandanan kir, û hêzên rijîmê gulle bikar anîn ji bo jihev belavkirina xelkî. Demê rijîmê nekarî serûbera kontirol biketin hatûçûn li nav bajêrî qedexekir,û rêya Süleymanîyê-Kerkokê girt,da ku deng û bas dernekevine bajêrên din.Lê xelk derkete ser şeqamên bajêrî û hawar kirin li dijî hikometê û kiryarên wêyên dirindane û daxwaza waz anînê kirin ji girtin û rahêlana kesûkarên pêşmergeha û ew kesên li dijî şerî. Ü qîrandin :Bijî Pêşmerge,bimre destelatdarîya dîktator û faşîst,û daxwaza rawestandina şerî kirin.Di van xwepêşandanan da kirêgirtî yek hate kuştin û çendên din jî birîndar bûn û şeş ji xwepêşandera şehîdbûn û jimareka mezin jî birîndar bûn.

Li roja 23/I0/I985 ê hêrişa dijminî tundtir lêhat û 20 hezar leşker û polîs û parastin ji Kerkok anîn û dest bi pişkinîna malan kirin,û li şoreşgera gerîyan ,her xanîyekî ku yek têda dîtî û yan gumanlêkirî ku yekê xudî kirî ew xanî bi bildozeran xirab kirin heya I20 xanî xirabkirîn.Herwisa welatî deste deste dane ber gulla,sêzde xort bi hevra li taxa Eshabe-Spî û dehên din jî li germava Nalî şehîd kirin.Ü carekê jî faşîstan 8 welatî bi saxî xistine nav goristana bajêrî.

Piştî çend roja karkerên kargeha Cigara û karkerên kargehên din jî piştevanîya xelkê bajêrî kirin û dest bi mangirtinê kirin.

Jimara girtîyan ji xelkê Suleymanîyê di vê raperînê da gehişte çendîn hezar kesa , û faşîstan bi deyan ji wan li sêdarê dan,ku bi vê yekê jimara şehîdên raperînê li bajêrê Suleymanîyê bi tenê ji 200 kesa pêtir lêhat,ji bilî jimareka mezin ji birîndaran.Ü kerb û kîna xwînrêjan gehişte radeyekî ku dest bi kuştina girtîyên ramyarî kirin û tenê li zındana Mosil 69 xebatkar û pêşmergehên hêzên niştimanparêz,û yên dijî şerî,li sêdarê dan, Ü her di wî demî da jî berdewambûn li ser derxistina û dûrxistina malên pêşmergeha. ji bajêrê Suleymanîyê bi tenê II2 mal derxistin û malê wan jî dagîr kir.

Li bajêrê Hewlêr hêzên rijîmê dora çendîn taxa girt da ku nehêlin xelk bicivin û piştevanîya xelkê Suleymanîyê bikin.Lê xelkî xwe li kelha bajêrî da asê kir,û ji bo cara yekê hinek ji caşa jî piştevanîya xelkî kirin. Li wir jî faşîstan firokên hilîkopter bikaranîn ji bo jihev belavkirina xelkî,lê xweragirtina xelkî li hember dijminî bû egera hindî ku nekarin ew tiştên bi serê Suleymanîyê anîn bi serê wan bînin.

Herwisa xelkê bajêrên Dihok,Mosil,Zaxo,Amêdîyê û Kerkokê jî di mangirtin û xwepêşandanên gelêrî pişkdar bûn û li her cîyekî bi awayekî. Raperîna gelê me li bajêrên Kurdistanêvê carê jî têt li dijî berdewamîya deselatdarîya dîktatorî li ser hukmî û berdewamîya şerê wêrankerê dijî berjewendîyên gelê Îraqê,û li dijî tunr bûna terorê li ser hemî welatîyan,û bi taybetî li Kurdistanê, çunkî li Kurdistanê roj bi roj xebata gelê me xurttir dibe ji bo roxandina rijîmê û bidestve anîna demokrasîyê ji bo Îraqê û mafên netewayetîyên rewa ji bo gelê Kurd,û ji bo rawestandina kuştargeha qadisîyê.Çunkî ji destpêka îsal ve rijîmê deverên rizgarkirî ji Kurdistanê yên xistîne bin dorgirtineka aborîya mikum,û rênade pêwîstîyên jiyanê bigehine van deveran ku bihezaran welatî û pêşmergeh têda dijîn,û şandina berhem û derametên cotkaran bo bajêra qedexe kirîye. Ü her li ser rêçika xweya şovênî desteka dîktator berdewame li ser bombebaran kirin û wêrankirina gelek gundên Kurdistanê jibo çolkirina wan û lawaz kirina xebata hêzên niştimanparêz.Herwisa ji meha Ilûla borî ve jimareka mezin ji dibisana hatine daxistin ji wana 208 dibistan li parêzgeha Dihok û 200 dibistan li parêzgeha

Bo lapere (44 )

# PÊŞENG

JİMARE -IO- SALA:4 ÇİRYA PAŞİN I985

**GOVAREKA RAMYARÎ Û ÇANDEYÎ YE RAGEYANDİNA NAVÎNÎYA PARTÎ DÎMOKRATÎ GELÎ KURDISTAN DERDİXE**



SERHIDANA GEL LI BAJÊRÊN KURDISTANÊ